

LÊKOLÎN

Li ser Melayê Cîzîrî

هه‌واینامه‌ی کتیب

Weşanên



Înstîtûta Kurdî li Elmanya

ji bo Lêkolîn û Zanist

Lêkolîn

Kovara Înstîtûta Kurdî ji bo lêkolîn û zanist-Hêjmara 13. Payîz 2008

Berpirsiyarê giştî
Fehmî Balayî

Sernivîsar
Fevzi Özmên

Desteya bireveber
Cemal Ballıkaya
Yeko Ardil
Alî Huseyîn
Rukiye Özmen

Berg: هه‌واینامهی کتیب

Vogelsangerstr 10
50823 Köln

Tel.: 00 49-0221.16 89 62 17

institutakurdi@yahoo.de

www.institutakurdi.com

Înstîtûta Kurdî
ISBN: 3-930943- 59 - X

NAVEROK

I

Pêşgotina Înstîtûtê

7

II

Jan Dost

Pêşgotin

11

III

Celalettin Yöyler

Hevpeyvîn

21

هه‌واینامه‌ی کتیب

IV

Jan Dost

Hevpeyvîn

52

V

Seîd Dêreşî

Hevpeyvîn

109

VI

Celalettin Yöyler

Li ser jidayikbûna Melayê Cizîrî çend dîtin

137

هه‌وآنامه‌ی کتیب

هه‌واینامه‌ی کتیب

I

هه‌وآنامه‌ی کتیب

Pêşgotin

Lêkolîner û xwendevanên hêja,

wek tê zanîn Înstîtuta Kurdî ji bo lêkolîn û zanist, demekê ji ber hin sedeman navber dabû weşana xwe ya Kovara Lêkolîn. Di dawiya sala 2007an de ji nûve dest bi weşana xwe kir û bernameya xwe ya ku dabû ber xwe anî cih. Di dawiya vê salê de hejmara 11. derket. Me di sala 2008an de jî, du hejmar kiribûn bernama xwe. Hejmarke me tam di dema xwe de hat weşandin, lê hejmara me ya duyem pişkekê bi derengî ket. Ji ber vê çendê em ji we hêjayan lêborînê dixwazin.

Me di programa xwe ya demdirêj de, ji bo her navdarekî/e Kurd ên ku mora xwe li çand, wêje, huner û dîroka Kurd û Kurdistanê xistine, hejmareke Lêkolînê veqetandiye. Me bi hejmara 12. ku jiyar, huner, xebat û felsefa **Ehmedê Xanî** tê de cih girtibû, dest bi vê rêzehejmarên xwe kir û emê wiha bidomînin.

Di vê hêjmara xwe ya 13. de, ku di dest we de ye, emê li ser jiyar, huner û felsefa **Melayê Cizîrî** rawestin. Di vê hêjmarê de hûn bi sê lêkolînerên heja yê wêje û dîroka Kurd re, bi hev re ne. Lêkolînerên hêja birêz; **Celalettin Yöyler**, **Jan Dost** û **Seîd Dêreşî** di hevpeyvînên xwe yê hêja de, dê we bibin ba **Cizîrî** û di her aliyê de wî bi we bidin nasîn.

Hewce nîne ku em ji we lêkolîner û xwendevanên hêja re gotinên gotarvanan şîrove bikin. Em dixwazin vê çêjê ji we

hejayan re bihêlin. Hûn bixwînîn, bi vê çêja bêdawî bimijin û da ku tama wê bikeve rahên giyana we.

Em dixwazin vê bibêjin: Me heman pirs ji hersê lêkolînerên hêja pisîne. Bersîvên wan curebicur in. Dema ku mirov bala xwe dide bersîvên hêjayan, dibîne ku bersîvên wan yên di derbarê jîyan, huner, felsefe û hostatiya Cîzîrî de gelekî nêzîkî hevdu ne. Cudatiyên wan kêma in.

Dîsa mirov di encama gotarên hersê hêjayan de xwe digihêjîne vê baweriyê ku hêj pêwîstî bi lêkolînerên kûrtir û berfirehtir ji bo zelalkirina jîyan û xebatên navdarên Kurd ên ku mora xwe li çand, wêje, dîrok û hunera Kurd xistine, heye. Em bawer dikin lêkolînerên me yên hêja jî, di encama lêkolînerên xwe de gihîstine vê baweriyê.

Em dikarin vê jî bibêjin: Mafê her weşanxane, rojname, kovar û malperekê heye ku nivîsên nivîskarên xwe re dekte û bi rêkûpêk bikin. Me jî bêyî ku em hevoksazî û peyvan biguherînin, di warê rîzimanî, nuqteşanî û îşaretan de, di nivîsên birêz **Yöyler** û **Dost** de hin sererastî pêk anîn. Lê, ji ber ku birêz **Dêreşî** bi îsrar nexwest em dest bidin nivîsa wî, me jî ew neşand û dest neda nivîsa birêz **Dêreşî**. Ji ber vê hindê çî kêmasî û şaşî di warên rîzimanî, rastnivîs û nuqteşaniyê de hebin, yên birêz **Dêreşî** ne, ne yên redaksiyona me ne.

Em ji bo ked û xebatên hersê lêkolînerên xwe yên hêja, **Celalettin Yöyler, Jan Dost û Seîd Dêreşî** pir spas dikin. Her bijî pênûs û mêjûyên wan.

Hetanî hejmareke din bimînîn di xweşiyê de.

Redaksiyona Lêkolîne

هه‌واینامه‌ی کتیب

II

هه‌وآنامه‌ی کتیب

Pêşgotina Jan Dost

**Wêjeya Kurmancî ji serdema Îslamê heta qonaxa Cizîrî
Rawestandinek kurt û mêjûyî**

Herifîna mezin:

هه‌و‌النامه‌ی کتیب

Di sedsala heftan de Îslam wek dînekî nû li Erebistanê derket û belav bû. Zimanê vî dîne nû jî erebî bû. Bi saya kitêba pîroz ya Îslamê(ango Quran) zimanekî erebî standard hate meydanê û erebên ku bi sedan eşîr û êlên dijhev bûn, bûne milletekî yekdîn û yekziman û yekhêz. Bi gotineke din aliyekî netewî yê Îslamê jî hebû ku neteweya ereb ji nûve ava kir û berê dîrokê guherand. Piştî serkeftinên Îslamê di Erebistanê de êdî çavên erebên misilman li derve jî bû. Wan him dixwest qada imperatoriya xwe ferehtir bikin hem jî dixwestin dîne xwe yê nû û „peyva Xwedê“ (li gor ku eqîdeya Îslamê digot) bigihînin millet û neteweyên din. Di sala 636 an de di dema xelîfetiya Umer Ibnul Xettab de artêşa Îslamê berê xwe da rojhilat û di şerê dîrokî Elqadisiyye de artêşa Iranê şikesteke mezin xwar. Piştî wî şerî temamê imperatoriya sasaniyan kete bin destê erebên misilman. Rûyê Îranê hate guhertin. Him dînekî nû him jî çand û wêje û zimanekî nû wek lehiyekê ew imperatorî da ber xwe.

Bê guman Kurd jî yek ji neteweyên ku di bin siya ala imperatoriya Sasanî de dijîn. Şikestina ku sasaniyan xwar, bûbû barek li ser milên Kurdan jî. Kurdan li ber xwe da, zû bi zû dînê nû qebûl nekirin. Heta sed salekê jî liberxwe didan. Nimêjgehên êgir hatin vemirandin û kitêbên dînê wek Zendevista (ku bi nerîna ola Îslamê kufrî bûn û divabû tenê Qurana Erebi hebe) ji holê hatin rakirin. Bi gotineke din zimanê wê kitêbê jî xwe da paş û rê ji zimanê erebî re bi darê zorê û devê şûr vebû. Eger em bala xwe bidinê di wan guhertinên dîrokî de zimanekê wek yê pehlewî û farisiya kevn nikaribû xwe li ber erebî bigirta, îcar zimanên ku bêxwedî bûn yan jî ne zimanê dewletê bûn (wek Kurdî) ziyaneke mezintir dîtin. Kurd bi zorê û ji bêgavî Îslam wek dîn pejirandin. Erê berxwedanek mezin jî hebû û bi dehê salan dirêj kir, lê li ber pêlên erebên misilman nikaribûn xwe bigirtana.

Piştî herifîna Împeratoriya Sasanî dused sal ji bêdengiyê (bêdengiya wêjeyê) derbas bûn. Ango nema tiştek bi farisî hate nivîsandin. Welatê îranê him zimanê xwe derda, him jî dewlet.

Firdewsîyê mezin (935-1020) wan salên tarî tîne bîra xwe û di Şahnameyê de weha dibêje:

Zi mûş û melex xorden û sosimar

Ereb ra bi cayî resîd est kar

Ki tacî Keyan ra kuned arizû

Tifû bad ber çerxê gerdûn tifû

**

piştî xwarina gumgumok û mişk û kuliyan

Desthilatdarî kete destê ereban

Wan taca Keyanî kirin armanca xwe

Wey tif li te be ey çerxa gerdûnê!!

Naskirina Kurdan:

Kurd jî wek parçeyekê ji wê imperatoriyê, ku navê wan di

wêjeya erebî de û di kitêbên tarîxî û cografîk yên erebî de bûbû (E`rab faris) *koçerên Farisan*, ji alî xwe de bédeng mabûn (dîsa bédengiyêke wêjeyî). Em nizanin ka gelo wêjeyeke Kurdî berî Îslamê hebû yan na. Kurdan çî berhem beriya Îslamê nivîsîbûn ev yek ne diyar e, lê ya ku mirov jê piştrast e, wêjeyeke Kurdî wê demê nebû. Piştî wan dused salên bédengiyê hişê milletên herêmê li serê wan vegeheriya û li zimanên xwe zîvirîn. Êdî erebî bûbû zimanekî hakim. Tesîreke mezin li farisî kiribû û ew zimanê kevn nema dihate bikaranîn. Zimanekî nû ku têkelî gelek peyvên erebî bûbû,

derkete meydanê û elifbêya xwe ya pehlewî jî winda kiribû û bi ya erebî re guherî bû. Wêjeya farisî bi rengêkî nû dest pê kir.

Mêjûnûsên ereb ên misilman, erdnigarîzanên wan ji aliyê xwe de dest pê kirin û lêkolînên mezin li ser neteweyên imperatoriya Îslamî ya nû li darxistin. Ev encama sermayedariya erebî ya ku nû hatibû holê bû. Divabû serjimarî li temamê imperatoriya erebî biba û bac û xûkî bi rêkûpêkî bihatana stendin. Loma jî lêkolînên ku niha ji bo me gelekî sûdwer in hatin nivîsandin. Herçendî mebest jê bidestxistina bac û xûkiyan bû, lê sûdeke wan ji bo nijadnasan û etnologan jî hebû.

Di kitêbên kevin de navê Kurdan derbas dibe lê Ethnologên erebî bêtir berê xwe didan nifûs û jimara neteweyan, qebîleyên wan û belavbûna wan li herêman û naskirina cih û warên wan û hijmara pez û dewar û hesp û hatina zeviyên jî. Etnologan gelekî guhdabûn tradisyon û çûn û hatinan û adetên wan. Ev yek jî weke me niha nivîsî wezîfeyeke bacstendîne bû. Loma jî ziman û wêje gelekî bala wan nedikişand yan jî wan bi qesdî perde diavêtin ser vê mijarê. Ji bo stendina bacê zimanê qebîleyekê ne girîng bû, lê jimara pez û nifûsa xelkê di ser her tiştî re bû. Di hin kitêbên nijadnasiya kevn de behsa Kurdan û qebîleyên wan tê kirin û bi lez di ser (zimanên) her qebîleyekê re derbas dibin. Di eslê Kurdan de jî nakokiyên gelekî seyr li ba wan nijadnasan hene, hinan Kurd ji farisan dihesibandin û hinan jî ji cinan û

hinan jî ji ereban! Li ser vê iddiayê hate gotin ku (Zimanê Kurdan erebî bû, lê dema li çol û çiyayên bi demeke dirêj man zimanê xwe ji bîr kirin û tîkelî zimanên cîranan kirin û ev zimanê Kurdî derkete meydanê! Binêre berhemên El Mes`ûdî. El Istexerî. Ibn Hewqel. Ibn Xurdazebe û yên din). Tiştê balkêş di wan berhemên de ew e ku hemî nijadnas û cografîzanên misilman dibêjin Kurd milletekî koçer e. Ev bi xwe rastiyeke ku divê lêkolîn bêtir li ser çêbibin. Bi dîtina min eger em vê rastiyeke wek rastiyeke dîrokî qebûl bikin, emê karibin gelek pirsên nezelal di dîroka xwe de fêhm bikin û karibin niha jî gelek pirsan bibersivînin. Bingeha koçerî ya me Kurdan ji xwe ji sebebên ku hiştibû ew nivîskar bibêjin Kurd bi eslê xwe ereb in. Wan jiyana civakî ya ereban û Kurdan dabû ber hev û dîtibûn ku herdu millet di jiyana koçertîyê de nêzîkî hev in (helbet em nakokiyên qebîleyên erebî ji bîr nakin. Her qebîleyekê neteweyek ji xwe dihesibandin.).

Koçerbûna Kurdan rastiya dûriya wan ji wêjeyê nivîskî jî tîne ziman. Ango di nav koçeran de pirtûk û nivîsnadin û wêje nenas in. Heta roja îroj jî di nava koçerên Kurdan de ev yek diyar e. Lê divê em vê yekê jî zanibin ku di civaka koçerî de urf û adetên Kurdan hatin parastin. Kilam û stran hebûn ku wêjeyê devkî ya Kurdan bû. Dîroka cengan jî bi xêra dengbêjên di bin konan de û yên gerok heta roja îro ma.

Ji konan ber bi kolanan ve:

Li gor xwendina min a dîrokê, di serdema Îslamî de êdî Kurd hêdî hêdî daketin bajarên. Di bajarên de jî wêje rû dide. Ango wêjeya nivîskî encama bajarvaniyê ye.

Em hinekî vegerin dîroka farisan. Me got zimanekî farisî yê nû piştî Îslamê hate meydanê. Zimanê ku dikira bi derbên giran yên zimanê (pîroz) ê erebî re bimira, careke din hate vejandin û li ser lingan sekinî, lê bi rûyekî nû. (Firdewsî dibêje: Ecem zinde kerdem bedîn parisî: yanî min Ecem bi vê farisiyê vejandin!). Li ser destê Samaniyan û Geznewiyan wêjeyê farisîziman dest pê bû. Wê demê Kurd hîn jî li

(kenaran) bûn. Ango bi piraniya xwe mabûn koçer. Di çiyayên Zagros û Metîn û Hekarî û Cûdî û xeyrî wan de êlên mezin yên Kurdan hebûn. (Di kitêbên pêşî de navê Kurdistanê Iqlîm El Cebel yan El Cibal bû, yanî Herêma Çiyan!). Di kitêba (Suwer Eleqalîm = Wêneyên Herêman, ku Ibn Hewqel ew berî hezar salî bêtir nivîsandiye de) behsa penêrê Kurdan weha dibe: Penêrê wan heta her welatên dût diçe! Yaqût El Hemwî di kitêba (Mu`cem El Buldan = Ferhenag Bajaran- 1240 zayînî) de dibêje ku li hêla welatê farisan pêncsed hezar konên reş(ji mûyê bizinan) yên Kurdan hene! Tiştê balkêş jî ew e ku di kitêbên destpêkê de behsa koçeriya Kurdan pir tê kirin, lê her ku em bi vir de tên û kitêbên nûtir dixwînin, êdî em behsa kelayên Kurdan jî dibînin. Ev guhertin ya ji (Kon) ber bi (Kelayê)de dide xuyakirin ku êdî Kurd jî rengê civaka xwe diguherin û nema tenê ew koçerên kon û zozan û germiyanan e. gelekî balkêş e ku di berhemên pêşîn de tenê behsa konan û zomeyan li ba Kurdan tê kirin, paşê êdî behsa kelayên Bejnewî û Buhtiyan û êlên mezin yên din jî tê kirin(yek ji kitêbên dîrokî yên kevn ku winda ye kitêba El Qilaa wel Ekrad yanî Kurd û Kela yan jî kelayên Kurdan). Em êdî navên bajarên ku Kurdî ne jî dixwînin. Ev îşareteke mezin e ji guhertinên di civaka kurdî de qewimîbûn piştî serdema Îslamê.

Yanî em dikarin guhertinan wisa bînin ziman:

Di kitêbên ewwil de: Kurd koçer in, xwedî pez û zome û penêr û berhemên pez in.

Di kitêbên rêza duyem de(sedsalên 11an û vir de): Kurd xwedî kela ne, mîrên wan hene. Zanayên wan hene ku di ilmê erebî de û Îslamiyat û ilahiyatan de jêhatî ne.

Ev herdu rûyên Kurdan bêguman daketina Kurdan ya ji çiyê ber bi deştê ve û avakirina bajarên dide xuyakirin.

Piştî têkçûna mezin di şerê El Qadisiyye de Faris dîsa li ser nigan sekinîn. Dewletên xwe avakirin û wêjeya wan bi rûyekî nû dest pê kir. Di salên pêşî de Farisan (qiral û mîren wan) alîkariyeke mezin bi wêjevan û şairan re dikirin. Mal û pere bi ser wan de rijandin. Lê qet guh li erebî nekirin. Heta

dibêjin şairekî faris hatibû seraya mîrekî Samaniyan û di pesnê wî de helbesteke erebî xwendibû. Lê mîr guh nedabûyê û gotibû: bi farisî dijûnan ji min re bibêjin, çêtir e ku hûn pesnê min bi erebî bikin!!

Li aliyê Kurdan, Kurdên ku êdî daketin bajaran û ji bo xwe bajarên mîna Amedê, Hewlêr, Dînewer, Bedlîs, Şhrezûr, ji nû ve ava kirin, di sedsalên dehan û yazdan û diwazdan de dewletin ava kirin(Şedadî, Enazî, Hesnewî, Merwanî = Dostikî). Berevajî dewletên Samanî û Geznawî em bala xwe didinê ku mesela ziman ne ew meseleya stratejîk bû li ba mîr û qiralên van dewletên Kurdî. Heta em di rûpelên mêjuya dewleta Merwanî de dixwînin ku şairê Kurd mîr Husên kurê Dawudê Bejnewî yê Finikî, helbesta xwe di şîna mîr Bad kurê Dostik de bi erebî nivîsandîye(sala 990 î). Bi qasî ku ew dewlet mezin bû jî û bi dehê salan dom jî kir lê nikaribû wêjeyeke Kurdî bianiya meydanê.

Wêjeya Kurdî ji mizgeftê derket:

Dixwazim li vir tiştêkî din bibêjim. Ew jî ev e ku em fêr bûne bê bingeh û bêyî ku xwe bisipêrin tu dîarekî zanistî pêbawer ku bibêjin kitêbên me hebûn lê bi hatina Îslamê re hatin şewitandin! Erê em nikarin erebên misilman ji şewitandina kitêban bêsiûc bikin. Wan kitêb(bi sebebekî olî) şewitandin û nimêjgehên êgir jî vemirandin. Lê kanîn ew kitêbên serdema Îslamî? Kanîn wêjeyên Kurdîziman yên Bejnewî, Merwanî, Hesnewî, Şedadî! Bo çi hema çend heb ji wan neman! Bersiv ew e ku wêje nebû, yan jî hebû lê ziman ne Kurdî bû. Helbet kitêb windabûne, di şeran de û di şewatan de û di dirêjiya dîrokê de jî, lê eger tevegêra wêjeyî mezin bûya dê ji sedî hema deh bûya ji me re mabûya!

Me got gelek ji Kurdan êdî xwe berda bajaran. Li bajaran mizgeft hebûn û di mizgeftan de jî medrese hebûn. Destpêkê zimanê dersdayînê erebî bû, lê xuyaye ku paşê hewldanên mezin hebûn ku zimanê dersdayînan bibe Kurdî, ew hewldan jî heta radeyekê biserketibûn. (Mînak: Xanî ku kitêbên zarokan û feqiyan bi Kurdî amade kirin, Eliyê Teremaxî û

rêziman erebî bi Kurdî). Em dikarin bibêjin ku wêjeya Kurdî ji mizgeftan derket û li ser destê mela û feqîyan bi pêş de çû. (Em tekstên Êzdiyan ji bîr nakin, tekstên herî kevn in lê ew hem olî hem jî devkî bûn û neketibûn qalibê wêjeyeke nivîskî. Yek ji bextreşiyên mezin yên Kurdan ew bû ku Êzdayetiyê xwendin û ilim haram kiribû, yan na me yê niha wêjeyeke rengîn û zengîn ya êzdayetiyê dîtibûya!).

Da ku em bi insaf bin divê em ne tenê şeweyê jiyana civakî bikin sebebê nebûna wêjeyeke Kurdîziman. Divê em ji bîr nekin ku zimanên ku kurdî (dorpêç) kiribûn zimanin gelekî xurt bûn. Erebi ku zimanê pîroz bû û tesîra xwe li her zimanî kiribû, farisî bi mîrasê hezaran sal efsane û çîrok û imperatoriyên mezin, û tirkîya ku ji sedsala 14 an de bû zimanê imperatoriyê berfireh. Kurdî di nav van zimanan de dê nikaribû tiştekî mezin û ji nişkê ve li dar bixista. Mûcizyek divabû ku kurdî biba zimanê wêjeyê. Padişahêkî bi pîvanên Ehmedê Xanî jî divabû ku ew mûcize were pêkanîn.

Wek me got li bajarên Kurdan êdî mizgeft û medrese ava bûn. Êdî têkilî bi zanî û wêjeyên cîranan re çêbû. Bi insiatîva zanayên Kurd û rewşenbîrên wan deman ku mela û feqî û şêx bûn (li leqebên van pêşengan binêre: Şêx Ehmedê xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Tyeran, Şêxê Exlatî yan Qutbê Exlatî) wêjeyeke Kurdîziman hate meydanê. Ne ku stratejiyêke mîrekên Kurdan hebû. Li ba farisan ne wisa bû, li ba ereban jî ne wisa bû. Ango ji jorde ji desthilatdariyê bi xwe de alîkarî û piştgirîya wêjeyê hatibû kirin. Plan ji bo pêşxistina ziman û berhemên wêjeyî û zanistî hebû. (Kitêbeke ku werdigeriya zimanê erebî, bi giraniya xwe zêr bû ji werger re. Ev di dema xelîfeyê Eeb Al Mamûn de bû). Li ba Kurdan ji mizgeftê dest pê bû û her di mizgeftê de ma. Loma rengê wêjeya Kurdî ya klasîk olî ye jî. (Mîm metle`a Şemsa ehed ayînesifet kir, helbesteke Cizîrî ye. Ellah çi zatek ehsen e.....zêde letîf û qadirî. ya Feqiyê Teyran e û mijarên herdu helbestan jî dînî ne).

Di bajaran de serwet û sermiyandarî tê serhev. Kom dibe û

dibe neynika civakeke bajarî. Herweha dibe alîkarê pêşdebirina civakê jî. Bi avabûna bajaran re sermaye mezin dibe, têkiliyên bazirganî xurt dibin û bajar li ser hemû alîyan vedibe. Pencereyên têkiliyan dihêle civakek ji qaqilê xwe derkeve û bi wêje û civakên din re rû bi rû bibe. Li civaka bajarî jî wêje dikare zûtir û ciwantir pêş bikeve. Kaxet berhemek bajarvanî ye, ku ew jî matiryala herî girîng e ji bo wêjeya nivîskî. Di civaka koçeriyê de şop ji kaxetê re nîn e. (di kitêbeke zêde kevn ya Ereban de dibêjin ku koçerên Kurd qet li kaxetan ewle nabin!!). Em hemû dizanin ku Quran berhema civaka bajarîya bazirganiya Mekkeyê ye. Helbestên erebî yên beriya Îslamê di civakên bajarî de bûn. Herçendî di nav koçerên Ereba de jî ala helbestê bilind bû lê nebûbû ew diyardeya ku karibe bibe hilgira fikr û bîr û baweriyên civakê. Ew tenê hestên şairan bûn û serpêhatiyên eşîrê bûn.

Li ba me Kurdan jî tiştêkî wisa bû. Di serdema Cîzîrî de ku mîrnuşîniyeke xurt û heta radeyekê azad û serbixwe hebû (mîrnuşîniya Azîzan li Cîzîra Botanê) têkilî bi derdorê re xurt bûbû. Ji xwe faris bi artêşên xwe heta ber sûrên kela Cîzîrê hatibûn. Tevgera bazirganiyê jî rê ji çûn û hatina heta bi Mûsilê, Bexdayê, Tebrîzê re vekiribû. Di wê tevgerê de kitêb jî mîna malekî dikete bazarê. Helbet Cîzîrî neçûbû Şîrazê, lê wî dîwana Hafîzê Şîrazî xwendibû. Farisî zimanekî naskiribû. Êdî dem hatibû ku wêjeyeke Kurdî jî saz bibe. Dem hatibû ku zimanê Kurdî jî di bin tesîra wêjeya farisî de ekolek taybet ava bike.

Mixabin em li dîwanên beriya serdema Cîzîrî rast nehatine heta niha. Em dizanin ku hebûn, Şerefxan behsa mîr û şairekî Kurd dike (Yaqûb beg) û dibêje dîwaneke wî heye bi Kurdî! Kanî ew dîwan? Kanî dîwanên din? Tu bersiv ku xwe bisipêre rastiyên dîrokî û bingeheên lêkolînî niha li ba me nînin.

Jan Dost

Almanya 07-11-2008

هه‌وآنامه‌ی کتیب

III

هه‌وآنامه‌ی کتیب

هه‌وێزنامه‌ی کتێب Hevpeyvîna bi Celalettin Yoyler re

Pirs:

1 Li gora hinek idîa, hinek dîtîna û nirxandinan, ji % 70- 80 ê şair û nivîskarên Kurd di bin bandêra Melayê Cizîrî de mane. Ev çendî rast e, nisbeta wê çend e? Ku wuha be çine faktor û kerametên li pey vê angaşê? Ev hêz, hêza ewqas sedsal e, kêr û têhna xwe diparêze, cîhana nivîskar û helbestvanên me rapêçaye, kiriye bendewar û dilovanê xwe ji ku tê, ji ku av vedixwe ?

Bersiv:

1. Belê bi rastî em nikarin bêjin ji sedî çend şair û nivîskarên Kurd di bin bandora Melayê Cizîrî de mane. Ev hêza heta îro di cîhana nivîskar û helbestvanên Kurd de, rapêça wê heye û ji rêbaza helbest hûnana Melê av vedixwe.

Pirs:

2. Dibêjin ku Mîr Şerefxanê navdar, nirx û rûmeteke

bêpayan daye Cizîrî, ewçendî ku di goristana malbata xwe de ew kiriye şîrîkê xwe, yeke ji malê, tê gotin ku ew kesê bi tenê ye di goristana desthelatdarên Cizîrê de ku ne ji malbatê ye, ev hinekî rûtbe û nîşandayîna lordîtiya li Ingilîstanê tîne bîra mirov yan na? Di vê derbarê de çi delîl, gotin hene?

Bersiv:

2. Gotina derbarê ku Mîr Şerefxanê navdar nirx û rûmete payan daye Cizîrî û di goristana malbata xwe de ew kirîye şîrîkê xwe rast e. Bi rastî min goristana Cizîrî û Mîrên Cizîrê zîyaret kir û dît ku, Mela wek kesek ji wê malbatê di wê goristanê de, hatîye definkirin û tirba wî bilindkirî li hewa ye. Lê yên çend Mîran li rexê wî ne bilindkirî û li rû zemîn in.

Ev reng dide dîyarkirinê ku Mîrê Cizîrê gelek paye û rûmet daye Melê. Çawa ku bihev re di gotinên xwe de, Mîr dibêje: *Ji husnê rewneqek dayê ku Şêx Ehmed me ustad e.*

Pirs:

3. *Her kes kêr ya zêde, bi ferq û cihêyî be jî ber û berhemê şert û mercên welat, kultur, dîrok û serdem û qonaxa xwe ye. Heger mirov ji vê awurê, ji pencereyê wuha sosyodîrokî, xwe bi nav salên dema Cizîrî li jîyanê ye berde, hinekî noqî nav sedsala wî bibe, gelo wê encam çi bin?*

Bersiv:

3. Belê bi rastî gava ku mirov di pencereya sosyodîrokîya di dema Melê de, xwe noqê nav sedsaleya wî bike, mirov dibîne ku Mela; di warê zanista çand, dîrok, astronomî û felsefeya jîyana birûmet de, di radeyê gelek bilind de ye.

Pirs:

4. *Mezinahiya Cizîrî bê gotin e, mohr û şeqla qebûla giştî, şareza û xwedî gotinên pispor ji zû de hildigre. Dema gotin tê ser mezinahiyê, ser wezin û giraniya wêjeyî, hunerî, hostefî û hêza peyvê, tecrûbe çi dibêje, çi ne, pîvan û kirûterên giştî?*

Bersiv:

4. Bi rastî gava mirov li rewşa peyv û hevokên ku di helbestên Melê de, hatine rêzkirin, dinhêre; mirov dibîne ku Mela helbestên xwe bi çî rengî bi çî navî rêz kiribe, bê armanc û ramanên felsefî û zanistî nînin. Digel van nirxandinan, gava Mela ji tesewufa pesindayîna Yezdan dipeyîve jî bi armancên xwenaskirin û Xuda naskirinê dipeyîve. Ango rût ji vê ramanê wek sofîkî reben bi Xweda va nabîne. Girêdana wî ya bi naskirina Xweda ve, dizvire bal jîyana birûmeta mirovahî.

Pirs:

5. Mamoste Celalettin Yoyler di lêkolîna xwe ya bi navê “Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî” de / Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Avrêl 2006/ girêdayê salên jidayikbûn û mirina Melayê Cizîrî de wuha dibêje:” Mijara herî girîng a ku heta niha ji hêla tu dîrokzan û lêkolîneran ve nehatiye zanîn, dîroka jidayikbûna Mela ye. Di vê mijarê de em dibêjin me bi lêkolîneke berfireh rastiya jidayikbûna Mela, ji bo raya giştî û xwendevanên pirtûka xwe ya şîroveyî derxiste holê”. Ev jî salên 1589-1664 e. Hayê te ji vê lêkolînê çend e, çine dîtînen te li ser van herdû salan, di vê derbarê de çu nezelalî, nexwiyayîtî, heft û heşt hê mane?

Bersiv:

5. Dîtina me ya di derbarê destpêka ji dayîkbûna Melê de, bi hesabên ebcedî di dawîya pencekên wî yên di beşa bi navê:"Mela me li gerdena dîlber" de, di rûpel 563'ê şîroveya me de, bi erebî di rêza dawî ya helbestê de, bi nivîsa "tilke enbaun" de hatîye nivîsandinê. Bi hejmarên ebcedî dîroka destpêka nivîsandina Mela ya dîwana wî, hatîye dîtînenê. Hejmarên ebcedî di wir de, bi koçî 1027'e. 30 sal berîya nivîsê temenê wî hebûye. Liser hev gava em hejmarên koçî ku 1027'e werdigerînin mîladî dîroka ji dayîkbûna Melê derdikeve holê.**Derbarê vê mijarî de,mijarek me yê bi nirxandinek dirêj heye û emê ewî di dawîya bersivan de dîyarê we bikin û hûn binirxînin.**

Lê bi rastî di şîroveya me ya Enstîtuyê de, me salên Melê derxistîye 1589-1664.Mixabin jiber şaşîyek teknîkî me salekî kêm hejmartîye. Di sererastkirina şîroveyê de, ji bo çapa duyem, me ew şaşî dîyarkir û got:1590-1665. Dîroka koça wî, bi gorê

dîtina rêzdar Eladîn Secadî ye.

Pirs:

6. *Çi gava gotin bê ser jiyane; jiyana navdar û hêjayekî me, kesayetî, xwedî prestîj û hezkiriyekî me, giriftek, serêş û dudiliyek derdikeve pêşberî me, dikeve pêxêr û pêsêra me. Ew jî ev mesala salên jidayikbûn û mirinê ne. Navdarekî wek Melayê Cizîrî ku di rêza navdar û xwedîbandêran de bi Ehmedê Xanî re tê miqayesekirin, ne ecêb e ku piştî çend qirnan hê jî em ji agehdarî û pêzanînên xwe ne piştrast in? Kî berpirsiyar e, dîroknaş, biyografînas, siyasetmedar yan rewşenbîr, bi giştî? Gelên din ne wuha ne, mirov vê çawa şîrove bike?*

Bersiv:

6. Dem û heyamên ku zanayên wek Melayê Cizîrî û bi sedan nivîskarên Kurdên bi sedsalan berîya me jîyane, me di derbarê wan de, tu xemxwarîyekî jibo rastîya dîroka wan nexwarîye û lê nepirsîye. Rewşenbîr û nivîskarên me yên îro û demek berîya îro ji nedîtîna û nezanîna dîroka van xweşmêran berpirsiyar in.

Mînaka here girîng ewe ku di medreseyan Kurdistanê de, her feqî û melakî dîwana Mela ya ku dagirtîyê, bi felsefa jîyana mirovahî û gelê Kurd, her bi dîtina muzîkwarîyê lênihêrîne û bi dengên xweş ji civakan re xwendine.

Lê mixabin qet negotîne ev berhema pir bi nirx û hêja ji çi diaxive û xwedîyê berhemê di çi demê de, hebûye û jîye.?

Lê me bi qelsîya xwe ya ku mirov nikare xwe bigehîne watedarîya vê berhemê, xwest ku xwe bigehînin xalek ji naveroka wê. Ger kêmasîyên me hebin, çawa hene jî, me hêvîye ku zana û nivîskarên me ên vê demê, bibîne alîkarê sererastkirinê û pêşkêşê gelê xwe bikin.

Pirs:

7. *Xwendin û dersdariya Melayê Cizîrî?*

Bersiv:

7. Bi gor dîtîna û şîroveya me ya liser dîwana Melayê Cizîrî; me zanî ku pirên dîrokzanên berîya dema me, wek Eladîn Secadî û

Seyda Mele Ehmedê Zivingî, Hejar û hwd Gotine: Mela destpêka xwendina xwe li bal bavê xwe Şêx Muhemmed destpêkirîye. Di dûre li curbe cur deverên Kurdistanê: wek Hekarî, Başûrê Mezin û devera Amedê domandîye. Li bal Melayên dersbêjên Medreseyan xwendina xwe pêşve birîye û di dawî de, libal "Mele Taha" yê Amedî, destûrnameya xwe ya ilmî standîye.

Li gundek Amedê bi navê "Sirba" Meletî kiriye. Ji wir zivirîye bajarê Heskîfê û li bal Mîr Melîk Kamil dersbêjîya Medresa wî kirîye. Piştê demek ku evîndarîya wî ya jibo "SELMA" ya keça Mîr eşkere bû, derbasê bajarê Cizîrê bûye û bûye dersbêjê Medreseya Sor û li wir çûye ser dilovanîya Yezdan.

Pirs:

8. Gelo Cizîrî Dîwana xwe kengî û di kîjan temenî de nivîsandîye, nivîsandinê çiqas dem girtiye, wê demê berhem li ku çawa çap dibûn, çi agehdarî hene li ba te?

Bersiv:

8. Bi dîtin û lêkolînên me yên di derbarê dîwana Melê de, me zanî ku Mela piştê 30 sal temenê xwe nivîsandîye. Bi gor nirxandina me ya destpêka nivîsandina Melê de û gotina "Feqîyê Teyran " ku dibêje: min û Melê dema helbest bihevre digot, sal "1031" bû, tê zanîn: ku nivîsandina Melê ya dîwanê bi hindikî şeş sal e. Lewra gotina Feqî ya ku dibêje: dema min û Mela bihevre helbest digot, sal "1031" bû û destpêka helbest nivîsandina Mela ya bigor dîtina me ya hejmarên ebcedî 1027 te û di navbera vê hejmarê de û hejmara 1031an de 4 sal dem heye. Ji dema helbestgotina wana bi hev re û qedandina Dîwanê de, du sal nevebir tê gumankirî, 6 sal nêzîkê hiş e. Lê agahîya min ji bo çapkirina berhemana di wê demê de tune ye .

Pirs:

9. Dema Cizîrî serê xwe datîne, diçe rehetê, li gora texmînan Ehmedê Xanî 13-14 salî ye. Îmkan heye ku Xanî Cizîrî dîtibe, yan di zaroktiya xwe de, hê dema Cizîrî saxbû, dîwana wî xwendibe, yan jî bi riya malbata xwe bav û xizmên xwe li ser vê dîwanê hinek zanebûna wî çêbûbe?

Bersiv:

9. Dema em lêkolîn û nirxandina xweya derbarê destpêka salên ji dayîkbûna Melê de dîyardikin; em dibêjin:1590. Gava ev hejmar ji hejmarên temenê Xanî ku "1651"e derkeve (61) sal dimîne. Yanî Xanî 61 sal pişt Melê re hatîye dinê. Lê gava Mela hêj neçûye koça dawîn, temenê Xanî 14 bûye. Kesayetek wek Xanî ku di nav salên ciwanîya xwe de, li Medreseyan welêt bigere û Melayê Cîzîrî bibîne jî mumkin e. Lê ez rastê tu berhemek nehatime. Xanî berhema Mela ya bi navê "Dîwana Mela" her xwendîye. Lê di temenê xweyê çarde de an di dû re me xwe negîhandîye tu berhemekê.

Mamostayê mezin Xanî di Mem û Zîna xwe de, ji Mela, Feqî û Elîyê Herîrî dipeyîve û dibêje: min dê e'lema kalamê mewzûn alî bikira li banê gerdûn, bînavê reha Melayê Cîzîrî pê hey bikira, Elî Herîrî kêfek we bida Feqîhê Teyran heta bi ebed bi mayê heyran.

Pirs:

10. Heger em di nav Cîzîrî û Xanî de muqayese û berhevkirinekê bixwazin, çi mimkun e bê gotin? Mesele muqayeseyek ji awura têkiliya bi cîhanê û der û dora xwe re, têkiliya bi mîr û desthelatdarên Kurd re, ji awura naveroka berhemên wan, zimanê wan û Hwd.

Bersiv:

10. Em Cîzîrî û Xanî bi berhemên wan û têkilîya wana bi Mîrên welêt re û derdorên wan ra û di cîhanê re bidne destê xwe û binirxînin emê bibînin ku herdû zanayên Kurd ji bo xemxwarî û pirsgirêka netewa xwe têkildarîyek wanê xurt bi van beşên civakê re çêbûye û xwestine ku mîr û begên Kurdan di netewa xwe da desthilatdar bin, nekevîne bin destê dagirker û mêtînkêrên bîyanî. Lê cudatîya di navbera herdûyan de, bi tenê rewşa bangezarîya wan e, ji bo serbilindîya netewa wan. Em di berhema Xanî da dibînin, ku bi zimanê welatparêzî û netewî hezî ji bo yekbûnê û avakirina welatekî serbest û azad ji bo yekîtîyê bang li mir û began kirîye. Lê di bangezarî û hewara xwe da, bi ser neketîye. Ji ber vê rewşa xerab dest bi nivîsa berhema xwe ya bi navê Mem û Zîn kirîye û berhema xwe bi

dîmenên pir dilêş bidawî kirîye. Dawî anîna berhema xwe bi rewşekî şanogerîya netewî anîye ziman û Mem wek cengawerê rizgarîya netewî, Zîn jî wek bedewîya welatê xwe di serê xwe ra derbas kirîye. Mîr û Beko bi hev re wek sedema windakirina welêt nirxandîye. Lê Melayê Cizîrî wek Xanî bi helbestên xwe yê felsefî û ramanî mebesta xwe ya ji bo serbestî û rizgarîya gelê xwe û hemû bindestên di cîhanê da bi awakî humanîstî derxistîye meydanê û nirxandîye. Ji ber ku di helbestên Melê de, bi rengê felsefî û derûnî hatine rêzkerinê, kesek jê fêm nekirîye, hetanî van deman rûmetekî wêjenasîya wî dîyar nekirine. Em dikarin bêjin, herdu Mamostayên mezin jî xemxwarîya wan tim ji bo serbestî û rizgarîyê bûye û bi wî rengî bi helbestvanîya xwe dîyar kirine.

Pirs:

11. Qonaxên afirîneriya Cizîrî, hejmara zimanên Cizîrî zanîbûn û têkiliya di nav wî û wêjeya farisî, erebî û Osmanî de.

Bersiv:

11. Cizîrî bi helbestvanîya xweya bê hempa di rêzên helbestên xwe de, zimanê erebî, farisî, hindik bi tirkî û piranî bi kurmancî helbestên xwe rêz kirîye û neqîşandîye.

Pirs:

12. Gelo ji dîwana xwe pê ve tu berhemên wî yê din çêbûne? Wek nimûne, Xanî fireh û çendalî xwedî mijûlahî ye, navçeya enterese û pêdaketinên wî fireh e, dest avêtiye gelek tiştan. Ji vî milî mirov li wextdagirtin û dembuhurandina Cizîrî binere, rewş çawa ye, ev bi çi nisbetê xwe di helbestên wî de dide dest?

Bersiv:

12. Bi gor lêkolînên me yê di derbarê "Dîwana Melê" de ji bil berhema wî ya dîwana Melayê Cizîrî em rastê tu berhemek wî yê din nehatin.

Lê Cizîrî di nav helbestên xwe de, ji birekî mijarên zanistî, evîndarî, astronomî û heyîna afiranderên Yezdan bi awakî pir alî

û zanistî hildaye qelemê û ji bo xwendevanên helbesta xwe pêşkêşê civakê kirîye. Gava mirov dikeve nav van gotubêjên Cîzîrî ên di derbarê van zanistan de, mirov mit û mat dimîne. Bi vî rengî rewşa pir alîya zanistan di helbesta xwe da dîyar dike.

Pirs:

13. Wek tê gotin û hate gotin hejmara zimanên biyanî ku Cîzîrî zane û serdestê wan bû, ne kêm in. Wî jî wek Xanî, lê pirr berî Xanî bi Kurdî nivîsand. Xanî ne mimkûn e, dema biryara xwe ji bo nivîsandina bi Kurdî kiriye jîyan û pratîkê, ji Melayê Cîzîrî hêz negirtibe, ew bibîraneanîbe, ji bo xwe nekiribe nimûne, belê Cîzîrî kî ji bo xwe kiriye nimûne, wî şopa kê domandiye, gihandiye cih û nişên piştî xwe ?

Besiv:

13. wek çawa hatîye gotin rast e. Mela ji bil zimanê Kurdî gelek zimanên biyanî jî zanîbûye, berê Xanî bi zimanê Kurdî nivîsiye. Dema Xanî dest bi nivîsa kurdî kirîye wek rêbazên nivîskarên her demê, ewî jî ji Cîzîrî û yên wek Cîzîrî sûd girtîye. Lê Cîzîrî jî wek Xanî ji nivîskarên bi zimanê kurdî yên berîya xwe û ji çanda gelê Kurd a li Botanê û kanîya destpêka zimanê kurdî sûd girtîye.

Pirs:

14. Kesê ku Cîzîrî, dîwana wî, şîroveyan li ser jîyan û berhema wî dixwîne, ne mikun e, bi pirseke wuha re veneciniqe: em giş payeya nivîsandina bi kurdî didin Xanî. Ewçendî em vê dubare û bi dengê bilind dikin, mîna ku destpêkerê tiradisyona nivîsandina bi zimanê kurdî di berhemên wuha biserûber, li ser hev û mezin ne Cîzîrî, belê Xanî be. Ev ne neheqiyek li Cîzîrî ye?

Bersiv:

14. Bi rastî ez wek şîrovekerê "Dîwana Melê" û lêkolîna liser destpêka jîyana wî ji rewşenbîr û zanayên Kurdên ku di derbarê Cîzîrî da, heta van demên nêzîk ku tu rûmet û mezinahîyeke pir mezin nedane berhema Cîzîrî û naveroka helbesta wî, diêşem.

Em Seydayê Xanî zana û helbesvanekî Kurd ê pir birêz û rûmet dibînîn û serê xwe liber helwest û mebesta wî ya netewî ditewînin. Lê bi rastî gava em li berhema Melê dinhêrin em wê berhemê di kategoriya wêjezanên qada bilind û yekem da, dibînîn. Lê mixabin heta îro ev berhem li gor watedarî û girîngîya xwe, li bal nivîskarên me cîh negirtîye. Min gelek cara di panelên der barê felsefa jîyana birûmet a Melê de, ev rewş anîye ziman û gotîye: hevalno Mela bi zimanê felsefê helbesta xweya netewî nivîsîye û gotîye: *(Kes bi dada me nepirsit gilehû dadî çi kit- te nebit dadî resek beyhûde firyadî çi kit)* ev rêze helbest wek hewara Xanî ya jibo netewa wî ku dibêje "*Ger dê hebûya me padîshahek*" rewşa gelê Kurd dîyardike lê mixabin jiber ku me ji zimanê Cizîrî fêhm nekirîye, me tim helbestên wî yê watedar wek muzîkek evîndarî tenê nirxandîye û wek niheqî li Cizîrî tê kirinê.

Pirs:

15. Di mesela pesin û şabaşên ji bo mîrek û deşelatdarên Kurdan ne ji bo Şah û Sultanên netewên serdest jî ji heman riwângê mikune mirov binirxîne. Cizîrî jî xwe ji pesnê serdestên neteweyên biyanî û ne Kurd vedaye. Ev paye jî ji Xanî zêdetir ne ya Cizîrî be ?

Bersiv:

15. Belê, Cizîrî pesnê tu desthilatderekî bîyanî nedaye lê bi serbilindî û kêfxweşî pesnê desthilatdarên netewa xwe daye û gotîye: *(Ney tenê tebrêz û Kurdistan liber hukmê te bin-sed wekî şahê xuresanê di ferwarê te bit-Ger çi ger eqlîmê rabi'e hatî textê seltenet padîshahê heftê eqlîman selamkarê te bî)*

*Êdi emrê tey mukerrem serkêşê kit şubhê sem'e
Ber serê tîxê te û meqtûlê mûkarê te bî*

*şahê pir heybet di dêrit lê bi sehmê zêdeyî
saeta xeflet xuyabî kuz di bin barê te bî*

*Her kesê ne ji can dua goy û senaxwanî te bit
girtîyê qeyda te û amancê nûbarê te bî*

*Qest û daxwaza Melê daîm ji can û dil eve
Her di benda xizmetê pêş destê dîdarê te bî*

*ji asîtanê dewletê xaib nebî carek Mela
da ji fermanê mukerrem dem b idem me'emurî bî*

eve rastîya welatparêzî û hezkirina Mela ji bo desthilatdarên netewa wî.

Pirs:

16. Bikaranîna navê Kurdistan û hezkirina ji Kurdistanê, ax û ava welat û ne bikamilî, sitewyayî û bi dereceya ku li ba Xanî piştî çêdibe, ne siyasînebûyî be jî, bendewariya Cizîrî jî ne piştqewîniya esasî be ji bo Xanî ku di vî alî de zelaltir, bicesaretir û vekirîtir bibêje, binîvisîne û xweformûle bike ?

Bersiv:

16. Bi rastî her nivîskarek ji nivîskarê berya xwe gelek tiştan hîn dibe û dinivîsên xwe yên cur be cur de, xweştir zelaltir tîne ziman û formîle dike. Gava em bêjin Mamostayê mezin Xanî ji nivîskarê berya xwe Cizîrî gelek tişt hîn bûye û bi zelalî û eşkeretî anîye ziman ne kêmasîyeke ji bo Xanî. Em nirxandina berhemên herduyan dikin. Berhema rêzdar Xanî bi eşkeretî û zelalî bi zimanekî ku baş tê fêmkirinê ji netewa xwe mijûlbûye. Cizîrî Berya Xanî ji rewşa welat û xemxarîya ji bo welat bi zimanekî felsefî û derûnî anîye ziman û rêzkerîye. Lê Xanî ji felsefe û ramanên Mela ên derûnî zanîye û pişkivandîye. Em di vir da dixwazin bêjin: Mela berîya wî van rewşên netewî û welatparêzî di helbestên xwe da anîye ziman û gotîye.

Pirs:

17. Evîndariya Melayê Cizîrî jî ji xalên binîqaş e. behsa dostayetiya Cizîrî û Mîr şerefxanê duhem dibe ku di nav wan de evîneke niştîmanperane hebû, ji bo vê evîna çendşîroveyî ku behsa wê dibe tu çi dibêjî, ev evîn çendî konkîret û beşerî û çendî jî Xwedayî û esmaniye?

Bersiv:

17. Evîndariya Melayê Cizîrî dinav curbecur beşên civakê da cuda cuda tîne nirxandinê. Bi dîtîna û lêkolînên me yên liser

şiroveya dîwana Melê; me jê zanî ku evîndarîya Melayê Cizîrî evîndarîyek ramanî û derûnî ye. Evîndarîya wî ya ramanî jî xudayî, humanîstî, mirovhezî û welathezî ye. Mela di destpêka evîna xwe da; evîndarê keça Melîk Kamil ê Heskîfê ya bi navê Selma ye. Lê ev evîn li gor daneyên ku mev di nav helbestên Melê da dîtin û nirxandin evînek derûnî û xudayî ye. Mela wê evîna xwe di beşê helbesta bi navê *"mey nenoşî Şeyxê Sen'anî xeşet"*

"ew neçû nîv ermenistanê xelet" -mislê mûsa wî tecella ya te dî ê tu dî kanê xeta kanê xelet"-wek (Nîşanî) Neqşû nîşanek te dî ê ku nîşanek te dî kanê xelet" Mela divê helbestê de û di hinek helbestên din da evîndarîya xwe ya derûnî û xudayî tîne ziman û dîyar dike. Ango Mela evîndarek rastî ye ne mecazî ye. Evîndarîya wî û Mîr jî evînek netewî ye.

Pirs:

18. Ji jiyana Cizîrî û Xanî mirov dibîne ku desthelatdarên zemanê xwe, em bêjin qirnê navên Kurd qîmetekî têra xwe mezin dane şair, alim û zanayên Kurd. Ji vê awurê heger mirov rewşa wê rojê û ya îro berhev bike, ev tiradisyon di nav desthelatdarên Kurd de çendî hatiye parastin û çendî li gora dem û qonaxê ye?

Bersiv:

18. Belê bi rastî di heyamê Cizîrî û Xanî de, desthilatdarên welatê wan rûmetek mezin dane helbestvanên wek Cizîrî û Xanî. Lê gava em werin ser dîmen û rewşa vê demê her çiqas gelek însanên zana û xwenas rûmetê didin helbestvan û hozanên xwe, lê dîsa ne wek dema Xanî û Cizîrî ye. Em dikarin bêjin: bi taybetî hozan û helbestvanên Mîr û di rêya netewa xwe de, tevdigerin, dîsa jî birêz û rûmet in.

Pirs:

19. Fikreke wuha heye ku di zimanê Cizîrî de zêdetir erebî û di yê Xanî de jî bandora farisî bi nisbet erebî serdestir e. Egerên vê çi ne, gelo ji ber ku Cizîrî zêdetir di bin giraniya hestên melatîyê de nivîsiye û bervaja jî Xanî di bin bandêra felsefê, siyaset û

niştîmanperweriyê de nivîsandiyê. Rêje û jisediya zimanên farisî û erebî di berhemên herduwan de?

Bersiv:

19. Bi rastî dema mirov li helbestvaniya Melê dinhêre, mirov dibîne ku di nav helbestên wî de, giraniya zimanê erebî tê dîtînê. Lê ev giraniya bandora zimanê erebî di helbestên Melê de, ji bandora medreseyan Kurdistanê tî. Lewra bi giranî di medreseyan Kurdistanê de, dersên curbe cur zanistan bi erebî ye. Lê Xanî ji ber ku di deverêkê nêzîkê welatê faris de, jîye û berhemên wan pir xebitandîye, di wêjeyên wî de, giraniya farisî heye. Dîsa berhemên herduyan jî bi giranî bi zimanê Kurdî ne.

Pirs:

20. Malbata Cîzîrî, dê û bavên wî jî bi niqaş in. Gotin heye ku navê bavê wî Şêx Mihemed e. Belê kîjan Mihemed, Ev Mihemed ji binecîhên Cîzîrê ye, ji dereke din hatiye, ku wuha be ev der ku ye, baş û zelal naye zanîn. Li gora dîtinekê bavê Cîzîrî ji Xoşaba Wanê ye. Em van rewşên di nav heftûheştîyê, wihayî û newihayîyê de karin hê jî zêde bikin. Wek nimûne ku Cîzîrî berî serê xwe deyne û here ser dilovaniya xwe ji Cîzîrê çûye, çûbe, çûye ku û Hwd. Tu çi dibêjî?

Bersiv.

20. Di derbarê malbata Cîzîrî de, dîrokzanên di derbarê wî de axivîne, hemû bi yek dengî dibêjin navê bavê wî Şêx Muhemmed e û ji binecîhên Cîzîrê û ji eşîra Bextîya ku di Cîzîrê û derdorê Cîzîrê da belavbin. Cîzîrî berya koça xwe ya dawî bi feqîtî û melatî derketîye dervayê Cîzîrê û şûn ve vegeyîyaye ser warê bav û kalê û li wir çûye ser heqîya Yezdan. Ji bilî vê em rastê tu dîtineke dervayî vê dîtînê nehatine.

Pirs:

21. Bi rastî dîtînan corecore û hevnegir di derbara Cîzîrî de, ferq û cihêyîyên wuha mezin di nav van dîtînan de mirov dide fikirandin, hêrs dike û ne kêr

caran jî, çend tiştan tîne bîra mirov: Rewşa lêkolîneriya me tirajîk e. Rewşenbîr û lêkolînerên me bêxem, tembel, tirale û zêde ne bimesûliyet in. Heger ne wuha bûya wê çawa bi salan qîma xwe bi tevlihevî û kaoseke wuha bianîna, yan na, tu dibê em neheq in?

Bersiv:

21. Mamostayê hêja Mîrhem Yiğit, tu bi ramana xwe ya xelal di derbarê van dîtinên cur be cur ên hevnegirtî de, di derbarê Melê de pir binav heqîyê de yî.

Bi rastî gava mirov li rewşa lêkolînerên derbarê jîyana Melê de, dinhêre mirov şaş û matmayî dimîne û nizane di derbarê wan de çi bêje?. Di lêkolînên me yên di derbarê Melê de, em rastê pir dîtinên nehevgirtî yên dîrokî hatin. Di navbera dîtinên wan lêkolîneran de, bi sedan û pêncîyan sal cudatî xwe dide nîşan, hinek dibêjin; Mela hevdemê Mewlana Camî ye, hinek dibêjin hevdemê Şah Îsmailê Sefewî û Umadedînê Zengî ye. Lê tu rastî di gotinên wan de nayên dîtinê. Pir ecêb e ku Mela di dîwana xwe da, ji van kesayetên axivîye wê axiftinê pîvana hevdemîyê dibînin. Nivîskarek gava dinvîsîne ji kesayetên 500 sal berîya dema xwe diaxive. Ev nabe rastîya ku ew nivîskar hevdemê wî ye.

Pirs:

22. *Di derbara jiyana Melayê Cizîrî de Ferhad Şakelî sê kategoriyan destnîşan dike:*

1. *beşê ewil ew kes in ku bi bahweriya wan Melayê Cizîrî li dora salên 1200 jiyaye. Ji bo vê jî îspat bikin hewil didin û dixwazin kesekî bi navê Îmadedîn pêde bikin û bêjin ku Melayê Cizîrî hewzeman û hewtemenê wî bû. Ne şert e ev rast be.*
2. *beşek jî ku Elaedîn Secadî li serê wan tê dibêjin ku Melayê Cizîrî di zemanê şairê mezin yê Faris Evdirehmanê Camî de jiyaye. Ji ber ku Camî di kitêbeke xwe de behsa sefereke xwe dike ku ji Iran ber bi Hîcazê di ser Kurdistanê, di ser Cizîrê re bûye. Di beyteke helbesta xwe de behsa*

kalemêrekî bi navê Elcezîre dike. Yanî kalemêrekî xelkê Cîzîrê. Li gora Elaedîn Secadî ev kalemêrê behsa wî tê kirin Melayê Cîzîrî ye. Û ji ber vê û di vê çarçewê de jî divê Melayê Cîzîrî li dora salên 1400 î jiyabe. Dibe ku ev kalemêr hebe, ji bo ku hebe jî sebeb hene. Lê ev xwiyaye dibêje Şakelî ku ev kes ne ew Cîzîrî ye ku em nas dikin û dîwana wî di destên me de ye. Dibe ku berî Cîzîriyê navdar bi heman navî şairên din jî hebûbin ku ji bo ku hebin jî sebeb zehf in û ev jî maqûl e ku bi navê bajêr têne nas kirin. Tiradsiyona xwe bi navê bajarê xwe, herêm û navçeya xwe, ya jî gundê xwe binaskirin û ji xwe re wek paşnav bikaranîn adetek bû û di vê derbarê de jî bi dehan nimûne hene di destên me de. Mesele Seîdê Nûrsî, Şêx Evdirehmanê Axtepî. Mele Evdilahê Tîmoqî..

3. *Beşê sisyan Zivîngî û Mekenzî û kesên din in ku jiyaña Cîzîrî nivîsandine dibêjin: “ ez jî bi vê dîtîne re me “ dibêje Ferhad Şakelî. Li gora vê dîtîne ne mikun e ku Cîzîrî berî Hafîz û Berî Camî hatibe, Cîzîrî gelekî piştî wan e. Em karin bêjin teqrîben 1570-1640*

Bersiv:

22. Ditina rêzdar Ferhad Şakelî ku di sê kategorîyan de nîşandike û di beşa yekem da dibêje: hinek dibêjin Melayê Cîzîrî li dora salên 1200 jîyaye. Jibo ku bidine ispatkirinê ku Mela hevdemê Umadedîn e. Ev nayê pejirandin û ne rast e.

Beşa duyem: ku ji gotinê Elaedîn Seccadî dertê meydanê û dibêjin ku Melayê Cîzîrî di dema şairê mezin yê farisî Ebdurehmanê Camî de jîyaye, ew raman jî, ji ber ku dibêjin Camî di pirtûkek xwe de, qala sefera xwe ya ji Îranê ber bi Hîcazê liser Kurdistanê û bajarê Cîzîrê re borîye. Delîla xwe jî di beytek de besa kalemêrekî bi navê el Cezîre dike û dibêjin ew

kalemêr Melayê Cizîrî bûye. Ew jî dîsa bi dîtina Elaedîn Secadî ye û divê ku Mela li dor 1400 î jîyabe, dibe ku ev kalemêr hebe, lê ne Melayê Cizîrî ye. El Cezîreyê mûcid e. Tirba wî niha jî li Cizîra Botan e. Ew Mûcid jî 1136 -1651-î de, jîn û mirina wî ye. Mamosta Şakelî rast nirxandîye û Melayê Cizîrî nîne. Lê Mamosta Şakelî gotîye: dibe ku berya Cizîrîyê navdar bi heman navî Şairên din jî hebin. Qebûl e ku bi navê bajêr gelekî Mûcid û Şair hebûne.

Beşê sisîyan: Zivingî, Mekenzî û kesên din ên ku jîyana Cizîrî nivîsandine, dibêjin: ez jî bi vê dîtîne re me. Dîtina ku Melayê Cizîrî berîya hafîz û Camîra be û gelek piştê wan e û di 1570-1640 de jîyana Melê ne li gor dîtina mine. Ez dibêjim, 1590-1665.

Pirs:

23. Di nav xelkê de li ser Cizîrî gelek çîrok û efsane çêbûne. Ev jî li gora nêzîkayî û dûraya ji erd û axa Cizîrî û coğrafya rabûn û rûniştina wî, cihê manewerya wî têne guhertin. Hun dikarin behsa hinekan ji wan bikin?

Bersiv:

23. Çîrok û efsaneyên di derbarê cîh guhertina Melê de, rast in. Lewra Melê gava ku ji Cizîrê derketîye li curbe cur deverên welêt û di Medreseyên Kurdistanê de, xwendina xwe domandîye. Piştê qedandina xwendinê li bal Mele Taha yê Amedê destûrname (Îcaze) standîye û bûye Melayê gundê Sirba li devera Amedê. Di piştê zivirîye bajarê Heskîfê û dersbêja medreseya Melîk Kamil kirîye û li wir evîndarîya wî ya bi qîza Melîk Kamil Selma re dîyarbûye. Di pişt van qewmînan re, çûye bajarê Cizîrê û li wir di Medreseya Sor da bûye dersbêjê medreseya Mîr û li wir koça dawî kirîye.

Pirs:

24. Tê gotin ku di helbestên Melê de muzîkeke wuha heye ku xelk kare zû ji ber bike. Belê ji bo Xanî û helbestên wî mirov nikare heman tiştî bêje.

Bersiv:

24. Gotina di derbarê hêsan jiberkirina muzîka helbesta Cizîrî

de rast e. Her çiqas ez ne hunermendim lê helbesta Melê pir bi weznên xweş û dengên muzîkî hatine rêzkerinê. Lê helbestên Mamosta Xanî wekî yên Melê ji bo jiberkirina muzîkvan re û dengzîzîyê re, ne wek yê Melê ne.

Pirs:

25. Ji awura naverok û tesewufê em helbestên Cîzîrî û Xanî bidin ber hev, ferq çawa ye? Em hinekî ji awura huner, ziman û metafor, dîmen û tabloyan wî û Xanî nîqaş bikin.

Bersiv.

25. Gava em bi awira naverok û tesawifê helbestên Cîzîrî û yê Xanî bidine ber hev herdu jî bi naverokên xwe yên tesawifî dagirtîne. Lê di awira huner û ziman de, dimen û tabloyên wî û Xanî nîqaş bikin, em dikarin bêjin di warê ziman de, pir jihev cuda nînin. Lê di warê hunera helbestvanîyê de, Mela gelek li pêş e. Çawa ku di qonferansek edebîyatê de profesorek wêjezan gava ji wêjeya wêjezanên Kurdî axivîye, Mela pir bilind kirîye û gotîye: ez ji wêjezanîyê diaxivim û Mela di kategorîya here bilind de ye.

Pirs:

26. Ferhad Şakelî tê zanîn ku bi kêmanî 14-15 salan li ser Cîzîrî xebitiye û bi awayekî kategorîk û bê virde û wêde “Hiç şika min nîne ku Cîzîrî di serdema Mîr Şerefxan de jiyaye ku desthelatdarê Cîzîrê ye û Cîzîrî helbestên pesindar ji bo wî nivîsandîye.

Bersiv:

26. Ditin û ramana rêzdar Ferhat Şakelî û lêkolîna wî ya di derbarê Melê de rast e. Ango, Mela di dema Mîrê Cîzîrê Mîr Şerefxan de jiyaye û helbestên xwe yên pesindarîyê wek: **ey şehînşahê muezzem û xanê xanan** di pesindayîna Şerefxan de hûnandîye.

Pirs:

27. Her nivîs û berhem bi aliyekî xwe jî şahidekî

zeman û qonaxa xwe ye. Dema mirov dixwîne li ser heyam û serdema tê de ji dayik bûye, mirov digihe hinek encaman. Ev jî bi kêrî dîroknasan, biyografînasan ji faktorên alîkar hesêb dibin. Ji vê eniyê dema mirov li Cizîrî û xebata wî bikole, bûyerek, navek, destnîşankirinek bibe mûmek di reşayê de heye?

Bersiv:

27. Bi rastî çawa we gotî her nivîs û berhemek şahidê zeman û qonaxa xwe ye. Gava mirov van berheman dixwîne jibo heyam û serdema xwedîyê xwe, ku ji dayikbûye mirov digehîne hinek encaman. Çawa we got ew jî bi kêrê dîroknasan biyografîvîsan ji faktorên alîkar hesêb dibin. Di wî warê de, gava mirov berhema Melê dixwîne û dinirxîne mirov dibîne ku dinav tarîtiya dîrokê de, tîrêja dem û jîyana wî derkete holê. Çawa ku me jî bi lêkolîna liser berhema wî dem û jîyana wî bi hejmarên ebcedî dît û got rast e. Mela di 1590-1665 de, jîye û mirîye. Divî warî da gotina Feqîyê Teyran ku dibêje: dema me bihev ra helbest digot: sal 1031 bû alîkarîyek bê hempa ye jibo lêkolîna me.

هه‌و‌انامه‌ی کتیب

Pirs:

28. Cizîrî sofî ye. Dîtineke wuha heye ku sofîyên mezin li cîh û derekê zêde nedisekinîn, digeriyan. Em zanin ku sofîyên navdar di nav Xoresan, Iraq, Kurdistan, Şam û Konyayê de, di nav paytextên rojhilata Navîn de çûne û hatine. Nûmeyên Mewlana, Şemsê Tebrîzî û Hwd tene zanîn. Carna seferên wan bi rojan û bi mehan dewam dikir. Hin cîh hebûn ji wan re “Rikin” yan jî mîna îro jî li Kurdistanê ji wan re “Xaneqa” tê gotin, hebûn. Ev cîh cihên sekna mêvanan û şiklek otêlên îro bûn. Mirov li gerên wuha rast tê, di jiyana Cizîrî de?

Bersiv:

28. Çi dema mirov ji sofîtiya Cizîrî biaxeve û bêje: belê Cizîrî Sofî bûye, mirov nikare di katagorî ya Sofîyên lidû Şêxên Terîqetan de bibîne û binirxîne. Lewra Sofîyên ku nav çarçoveya vê Kategoriyê tene dîtin, bi gelemperî kor in û jîbil

Şêxên xwe heyîna serdest (Xuda) nabînin. Mela Xudanas e. Xudanasî jî xwe bi xwenasîneve digire. Yanî Mela berê Xwenas e, Paşê Xudanas e. Mela wek Şemsê Tebrêzî û Mewlana negeryaye û Murîd û Sofikên reben nedaye dûxwe. Mela tim ders daye û Felsefa evîna humanîstî, mirov hezî, Xudanasî û welathezî dîyarkirîye. Dikarim bêjim:di lêkolîn û xebata me ya liser şîroveya Dîwana Melê de, me rewşek Mela ya bireng û rewşa sofîyên we gotî nedît.

Pirs:

29. Ji gotinên tene gotin yeke din jî ev e ku Cizîrî şîrên Hafîz ji bo xwe kirine bingeh û helbestên xwe avakirine. Helbestên Sadî jî wuha kirine. Cizîrî vê vekirî û heşkere dike û venaşêre. Girêdayê vî aliyê Cizîrî jî behsa “Texmîsê” dibe. Ev texmîs çi ye?

Bersiv.

29. Gotina ku dibêjin:Mela helbestên xwe li ser bingeha helbestgotina Hafîzê Şîrazî û See'dî hûnandîye, hem rast e, hem jî nerast e.Yanî rastî ewe ku bi gelemperî helbestvanên helbesta kîlasîk li ser rêbaza erûzê helbest hûnandine. Mela jî wisa. Lê her çiqas Mela dinav helbesta xwe de, çend rêze helbestên wan nivîsîbe jî, helbesta Mela Xwedanê taybetmendîyek bi serê xwe ye, cudayê ji helbesta wan e. Texmîs û Tesdîs, navê pêncek û şeşekên rêze helbestane. Lê pir caran ji bo rêze pêncê ku ji hêla helbesvanek ve li helbesta hevalê xwe zêde dike re têgotinê.

Pirs.

30. Belê carên ku wuha jî dibêje hene: Dev ji Hafîz û Sadî berdin werin min bixwînin. Em li vê çawa binerin, hem tu di bin bandêra kesekî, çend kesan de mabî, di avûbayeke wuha de pênuşa xwe bikar anîbî û di ber re jî tu bêjî werin dev ji wan berdin, ez nêzîktir im, serketîtir im. Ya ku van rêzan bi Cizîrî dide gotin çi ye? Bahweriya bi xwe ye, yan jî biçûk be jî tov û meyleke neteweyî ye?

Bersiv:

30. Gotina Mela ya ku dibêje.(Wer Şîrên Melê bîn te bi Şîrazî

çiha-cet) rastîya mezintî ya Melê ya di helbestê de dide nîşan û dide zanîn ku Mela bi serê xwe deryakî ji zanista helbest zanîne ye û neketîye bin bandora tu helbestvanekiî. Dîsa em dikarin bêjin: Mela di warê bawerîya bixwe û rêzkirina felsefeya jîna birûmet de û bi taybetî ji bo serbilindiya gelê xwe helbestên ramanî û derûnî rêz kirîye û serbilind e.

Pirs:

31. Ez ewqas sal in li ser Cizîrî kar dikim, ez heta niha neghiştîme qeneetekê ku Cizîrî helbestek ji bo kesekî, ferdekî yan ji ji bo jinekê gotibe. Li cîhekî bi tenê tiştek heye ku hinekî îmkan dide ku mirov bêje ew dildarî, fizîkî ye, eşqeke ji bo însên e. Bi bahweriya min giş evîna Cizîrî Xwedayî ye û pêwendiya wê bi eşqa fizîkî û însanî re tune ye.” dibêje Şakelî, tiştekî tu lê zde û kêmbikî heye, yan jî tu jî bi heman rengî difikirî?

Bersiv:

31. Dîtina rêzdar Şakelî ji bo ku Mela ne evîndarê fizîkek beşerî ye, pir rast e. Evîna wî ya ji bo Keçika bi navêvbi (Selma) evînek ne mecazî û Xudayî ye. Mela vê rastîyê di helbesta xwe ya derbarê Şêxê Sen'anî de, bi zelalî anîye ziman û gotîye: Wek (Nîşanî) neqşû nîşanek te dî-ê tu dî kanê xeta kanê xelet. Dibêje Xuda Şêxê Sen'anê jî wek min (Nîşanî) neqşû nîşana te, di rûyê keçika Ermenistanê de dît lewku çû wir.

Pirs:

32. Di axaftinên li der û dora jiyana Cizîrî, yan jî em bêjin hinek tiştên ku di nav feqîyan û gel de digerin, navê xanimekê bi navê Selma derbas dibe. Hinek dibêjin Selma xwîşka mîr yan jî keça wî ye. Li gora hinan jî Selma şewesemboleke tesewîfiyane ye. Li gora hizrekê jî ji xwe navekî wuha qet tune, ev jî bi tenê yek jî wan çîrokên bêsil e ku hina ji xwe re li hev aniye, navekî xeyalî ye. Çi rast e û çî na, rastî ji ba te çawa dixwiye?

Bersiv:

32. Bî kurtayî em dikarin bêjin: ku Selma ne qîza Mîrê Cizîrê ye ne jî xwîşka wî ye. Selma Keçika Melîk Kamil Mîrê Heskîfê ye.

Evîna Mela ya ji bo Selma bi gor dîtina rêzdar Hejar(Ebdûrehman Şeref-kendî rast e û wek evîna Şêxê Sen'ane û ne fizîkî û beşerî ye. Evînek Xudayî û derûnî ye. Di berhema Melê de navê Selma di çend cîyan re derbas dibe û Mela ji Bayê Seherê re dibêje:Belix salamî lî Selma ya berîd. Ev nav bi berheme û xudanê Çîrokek dirêje û ne xiyalî ye. Lê evîna Mela bi dîtina wê dest pê dibe û dibe evînek Xudayî .

Pirs:

33-Em hinekî din li ser vî navî bisekinin. Ev jî heye ku hinek şairên din jî heman nav, ango navê Selma bikaranîne. Kî ne ev şair gelo, mikune tu ji me re nimûneyekê dudwan bidî?

Bersiv.

33. Bersiv tune.

Pirs:

34. Xwendina Cizîrî jî bideng e, tê naskirin û têra xwe belabûye. Dibêjin dikete silûkê, dikete xewlê. Mesela "xewil" û "silûkê" îro jî heye. Li mizgeftên mezin mirov dikare lê rast bê. Pirsên me wuha ne: yek ev xewl û silûk çi ye, ya duhem hinek agehdarî li ser vî aliyê Cizîrî tu bide me wê bikêr be, ji ber ku têkiliya xewlê û hilbijartina murşidekî ji xwe re heye yan na?

Bersiv:

34. Bi gor ku me ji rewşa bawermendî û Xweda nasîya Cizîrî fêm kirîye û diber çavan re, derbas kirîye, ketina "Silûk û Xilwetxaneyan" jibo Seydayê mezin Cizîrî re hebûye. Lewra di hucrikên dersxaneyên Mizgefta Sor de, ew cîhên bivan rengan niha jî hene û têne dîtinê. Lê tu dem û gavan mirov nikare bibêje: Seydayê mezin sofitî an murîdîtî ji bo murşidekî, şêxekî kirîye û ketîye silûkê, nabîne. Lewra seyda jivan helwestên sofiyan, murşid û şêxên di her demî de,ji wan dûr e û neketîye nav wan helwestan. Bi tenê ketina wî ya xilwetxaneyan ji bo fikrandina di derbarê raman û felsefeya mirovahîyê û Xweda nasîyê bûye.

Pirs:

34. *Em dê carcaran Xanî û Cizîrî bi hev re bipirsin. Xanî bi siyasetê xurt û kûr daketiye. Tiştêkî ku ji bo pêdaketina Cizîrî bi siyasetê, em bêjin, dewlet, rêveberî, desthelatdarî û Hwd.bibe pêjneke tê hiskirin?*

Bersiv.

35. Dema ku em Xanî û Cizîrî bi hestên netewhezî û desthilatdarî binirxînin, em dibînin ku Xanî bi hestên xwe yê welatparêzî û desthilatdarî, bi eşkere û bê rengê derûnî xwe dîyar kirîye û nîşan daye. Lê Cizîrî bi awayek felsefî derûnî û ne eşkere qala welatparêzî û hezkirina desthilatdarîya welatê xwe, di helbestên xwe da, pir caran anîye ziman û nirxandîye. Ji ber ku ev helwest û ramanên wî yê di vî warî de, ne bi zimanekî eşkere ye, pir kesan ne pişkaftiye û jê fêhm nekirîye. Cizîrî di derbarê desthilatdariya welatê xwe de, weha dibêje: *Şahê pir heybet didêrit lê bi sehmê zêdeyî-saeta xeflet xuyabî kuz dibin barê te bî. -Her kesê ne ji can duagoy û senaxwanî tebit girtîyê qeyda te û amancê nûbarê te bî. -Qest û daxwaza Melê daim ji can û dil eve her di benda xizmetê pêş destê dîdarê te bî.* Van gotinan û bi dehan yê wek van di helbestên Melê de hene.

Pirs:

36. *Cizîrînas dibêjin ku Mela li du yan jî sê cîhan behsa navê Kurdistan bikaraniye. Duaya Cizîrî navdar e ku dixwaze ne bi tenê Cizîr belê Tebrîz û gelek cîhên din jî têkevin bin destên Mîr. Vê Fikrê jî mîna gelek fikrên din, mîna ku Xanî ji Cizîrî girtibe û ew li gora zeman û qonaxê derxistibe asta hewcedariya bi yekîtiyê û tifaqê. Li vir jî bêhn û pêjneke neteweyî, em neteweyî nebêjin jî, etnîsîteyî tune gelo? Ev ne hestekî zelal û vekiriye ji bo niştîmanperweriyê. Dixwaze Mîrê Kurdistan bibe şahê çar îklîman. Gelo Xanî gotina “wê tirk û eceman gişan ji me re bikirana xulamî “hêza xwe ne ji vir girtibe, ne berê vî tovî be ku Cizîrî avêtiye erda welatparêziyê?*

Bersiv:

36. Cizîrî di çend helbestên dîwana xwe de, navê Kurdistanê û

pesnê desthilatdarîya wê anîye ziman. Ji ber ku Seydayê Xanî di pişt wî re helbestên xwe, bi zimanekî eşkere û netewhezî rêz kirîye, em dikarin bêjin, her nivîskar û helbestvan ji yên berya xwe, sûd girtibin û bi wî rengî nivîsîbin. Ev jî tu kêmasîyek nîne ji bo xatirê nivîskaran re. Mela pir caran di helbestên xwe de, rengên netewhezî bi heyînî û ramanî anîye ziman. Bê nebê ev rewş etnîsîteyê derdixe holê. Etnîsîteya ku Cîzîrî anîye ziman jî, ne nijadperestî welathezî ye.

Pirs:

37. Di nav helbestên Cîzîrî de du helbest hene ku ji wan re “mukaleme” tê gotin, yanî bi hev re qisekirin, hevpeyvîn. Carekê bi Mîr Îmadedîn re û carekê jî bi Feqiyê Teyran re qise kiriye. Bi Ingilîzî dibêjin korespondens. Ev ne destpêka pexşanê be?

Bersiv.

37. Hevpeyvîna Cîzîrî û bihev ra gotina wî ya helbestî bi Umadedin û Feqî re, destpêka vekirina pexşanê ye.

Pirs:

38 . Em hinekî li ser cîhê Cîzîrî bisekinin. Cîzîra kevn û kesk. Cîzîra Botan kevnêbajarekî Kurdistanê ye, paytextekî siyasî ye. Li dora 400-500 salan navenda rewşenbîrî û alimiya Kurdistan e. Medresên navdar li vir in. Şagirtên jîr û bikêrhatî berê xwe didan vir û alimên navdar pîrri tiştan qerzdarê Cîzîra Botan in. Ev xweserî û taybetmendiya Cîzîrê di aliyê dîrokî de çawa çêbû gelo?

Bersiv:

38. Bajarê Cîzîra Botan kevnwarekî welate û paytextekî siyasî ye. Di demên dora 400-500 sal berê de, çawa rewşenbîrî û zanayên Kurdistanê li wir hebûne, wisa jî desthilatdarîya Mîrên welêt pirtir liwîr derketîye holê. Ev taybetmendiya vî bajarê ji ber ku ji bo gelê Kurd bi hezaran sal e, navendî kirîye. Em dikarin bêjin gelên cîhanê bi giştî ji nav malbata Mezrobotan belavê cîhanê bûne. Lewra Ademê duyem Nûh Pêximber silava Xuda li ser be, ew dever pîrozkerîye û dinav axa wî da hatîye

veşartinê. Van bûyerên dîrokî bi giştî taybetmendîyên vê deverê ne.

Pirs:

39. Em bi çend gotinan jî şairên hevdemên Cizîrî ne, binav bikin. Evdirehman Mizûrî du navan dide yek Feqîyê Teyran, duhem jî Şemsedînê Exlatî, kesekî din heye, têkiliyên Cizîrî bi hemdemên xwe re?

Bersiv.

39. Hevdemên Melayê Cizîrî ji şairên navdar di rêza yekem de Feqîyê Teyran e. Di navenda Cizîrê û dev dorên wê de, helbestvanên di wê demê da, pir hebûne. Em bi tenê Feqîyê Teyran bi hevalbendîya Cizîrî dinasin.

Pirs:

40. Rewşa helbestê di serdema Cizîrî de, Mizûrê bi van gotinan dîtînin xwe dibêje: “ Di vê serdemê de helbesta Kurdî li ser destê Cizîrî germ û gurr e. Vê sedsalê li ser destê M. Cizîrî hêzeke nû, vejîneke nû daye helbesta Kurdî” dibêje.

Bersiv:

40. Mamosta Muzûrî dîtina xwe ya di derbarê helbesta Melê da, bi zimanekî baş dîyar kirîye. Bi rastî jî helbesta Melê pir hûr û kûr e û hêzeke nû ye û vejînekî nû daye helbesta kurdî. Gava em dikevin nav watedarîya helbesta Melê, em nikarin bi zelalî û bêkêmayî bînin ziman.

Pirs:

41. Li gora Ferhad şakelî li ba Kurdan hinek qalib çêbûne ku çî dema gotin tê ser xwendin û tehsîla navdarekî Kurd, gotineke ku pîrr dubare dibe û ewqas jî ne ilmî ye, berçav dibe. Ew jî ew e ku “ dersên ewil li ba bavê xwe xwendine”. Ev çima wuha ye, ji ber çî ev hesangirî?

Bersiv:

41. Dîtina rêzdar Ferhat Şakelî derbarê xwendina Mela ya li bal bavê wî, ku pir dubare dibe, pêdaketinekî beyhûde ye. Dersên xwe yên ewil ku li ba bavê xwe xwendîye, destpêka xwendina

wî ye û nabe kêmasî û bêhêzîyek ji bo perwerdeya Melê ya li curbe cur deverên welêt û li ba seydayên bi hêz. Ez jî dîtina Ferhat Şakelî di cih da dibînim.

Pirs.

42. Felsefeya Wehdetul wucûd di helbestên Cîzîrî de, çi ye ev felsefe, çend nimûne ji otorîteyên wê?

Bersiv.

42. Belê felsefeya Wehdetul wucûdê di helbest û ramanên Melê de dîyare. Ango Mela bi lêkolînên xwe yên di derbarê heyîna Xweda û mexlûqan de, pir bi hêz e. Felsefa wî ya Wehdetul wucûdê, zanista yekbûyîna Xaliq û mexlûq e. Yanî mexlûq beşek ji heyîna mezin a Xuda ye. Piştî koça dawî bi wê heyînê re dibe yek.

Pirs:

43. Em dê carcaran li pirsê “evînê jî vegerin. Evdirehman Durre ku yek ji kesên xwedî gotin e, li ser kilasîkên Kurdî, girêdayê “evînê” piştî bi xwe dipirse: „Evîn çi ye?”, bersiva pirsê xwe jî wuha dide: “ Evîn ew e ku meriv ji tiştê hez bike, hemû tiştên xwe bide wî tiştî. Doza meriv, bahweriya meriv, dîn û îmanê xwe û heta ruh û bedena xwe jê re feda bike”. Ev jî hinekî nîqaşê, lêhûrbûn û lêkolînê naxwaze?

Bersiv:

43. Dîtina Mamosta Ebdurehman Durre di derbarê evînê de, rast e. Mamosta ji evîna rastîya mirovahî û Xudayî dipeyîve. Gava em bêjin evîna Xudayî cudayê ji evîna mirovahî nîne. Lê evîn bixwe di çend beşan da tê mulahazekirinê. Evîna mirovekî ji bo hestek wî yê beşerî re jî, evîn e. Carna evîndar ji bo wê evînê jî xwe gorî dike. Ew evin jî evîneke rastî ye. Mînak: ku bi sedan mirov keç û xort xwe ji bo evîna serok dişewitînin. Ev evîn jî çiqas beşerî be ewqas jî ramanî ye.

Pirs.

44. Çend tesbût ji Evdirehman Durre: “Ol li ba Cîzîrî

exlaq e. Dîwana Cizîrî gerdeneke manewî û neteweyî ya edebî ye, ji bo Kurdan”.

Bersiv.

44. Gotina Mamosta Ebdurrehman Durre ku dibêje; ol li bal Cizîrî exlaq e û dîwana Cizîrî gerdeneke manewî û neteweyî ya edebî ye ji bo Kurdan, rast e. Lewra Cizîrî bi hişdarî û zanistî Oldar e. Kesên ku bi rastî Oldar bin, ne bê exlaq in û Xudanas in.

Pirs.

45. Hûnandina edebî xwurt e, berz e, li pêş e. Ev jî dîtina serdest e, ji bo berhemên Cizîrî. Em vê hinekî vekin, ji hev veçirin, hinekî li ser kûr bibin, bi hinek nimûneyan biserûbertir, îknakiranetir bikin. Hûnandina xwurt, berzayî û lipêşbûn, yanî çi?

Bersiv.

45. Hûnandina helbesta Melê bi felsefe û derûnî gelek xurt e. Dema em dikevin nav watedarîya helbestên Melê, em dibînin ku bi ramanên pir alî dinav xwe de, felsefeyê diafirîne. Mînak di helbestek xwe da, dibêje: *Min di baxê gulfiroşan dî eceb resmek xerîb-xarî teban gul di destin, gulperestan xarî bes.*

Dîsa dibêje: *Cewrê hindî dê keşînit herkesê tawis divêt - gewherû durra yetîm bê terkê ser têtin teleb?*

Dema mirov li naveroka van herdû malikan dinhêre xurtî û hêza Melê xwe derdixe holê.

Pirs:

46. Jiyan û serpêhatiya Dîwana Melayê Cizîrî jî bi serê xwe hêjayê lêkolînekê ye. Ev dîwan çawa ghişte serdema me. Ji bo vê em qerzdarê kê û ne kê ne? Li vir pişk û rola Kurd û ne Kurdan çi ye û di vê navê de kurt be jî em di çend gotinan de li ser wergerên Dîwanê dîtînin we bigrin.

Bersiv:

46. Bi rastî ji bo jîyan û serpêhatîya Dîwana Melayê Cizîrî bi serê xwe hêjayê lêkolînekê ye. Ev dîwan bi alîkarîya zana û rewşenbirên Kurdên piştê Melê hate parastin û ji hêla hinek nivîskarên derveyên welêt wekî yên Rûsî û Elmanî û hwd hate

jîndarkirin û gehîşte me. Wergerên dîwana Melê hinek bi tîp guhêzîne hinek bi wergerên wateyî ne. Nimûne: wergera wateya wê ya bi erebî ji hêla Seyda Mele Ehmedê Zivingî ve û ji hêla Mamosta Hejar (Ebdurehman Şerefkendî) ve bi devoka soranî û wergera bi navê şiroveya dîwana Melayê Cizîrî bi tîpên latînî yên kurdî ji hêla me Celalettin Yöyler ve hatîye amadekirin. Lê bi rastî wergera Mamosta Mele Ehmedê Zivingî her çiqas neketîye kûyrahîya raman û felsefeyê jî bi tenê li dor rewşa tesewufî vegehrîya ye dîsa jî hêja ye. Ji bil van hersê wergerên wateyî min hêj wergerên dîwanê nedîtine.

Pirs:

47. Di lêkolîna Hejmar 12 de li ser Ehmedê xanî li ser xebatên biyografiyên Xanî agehdariyeke fireh heye. Heger em ji we çend navan bixwazin ku li ser Melayê Cizîrî xebatên fireh û biserûber kirine, navên ku ewil bîn bîra we, wê kê bin?

Bersiv:

47. Bi dîtina, me kesên ku di derbarê Xanî de, lêkolînên fireh û bi ser û ber kiribin, li ba min ne dîyar in. Tiştê ku ez dizanim, kesên ku liser dîrok û jîna Melê lêkolîn kirine, pirên wan xwe negîhandine tu qonaxekî zelal û mirov têr nake. Her bi tenê Mele Ehmedê Zivingî di derbarê dîroka Mela û jîyana wî de, di pêşeka şiroveya xwe ya erebî de, nêzîkê rastîyê bûye û dîsa kêmbîstîye. Di derbarê dîroka ji dayîkbûna Melê û koça wî de rêzdar Zeynel Abidîn Zinar bi hejmarên ebcedî dibêje: min xwe gîhandîye rastîya dîroka Jidayîkbûna Melê û ew jî 1570 ye. Lê gava wan hejmarên ku ewî nirxandîye, ez dinirxînin, li gor hejmarên wî çewtîyek hejmarî heye û ne 1570 ye, hejmar; 1575 e. Gava lêkolînavanekî di derbarê bûyîna Melê de, ewqas şaşî bike, wê çiqas bo me bibe bawerî.

Pirs:

48. Pesnê helbestên Cizîrî, hûnandin û tevna wan û bi taybetî muzîka di wan de tê zanîn. Belê hin kesên ku helbestên Cizîrî rexne kirine jî hene. Mînak Zivingî ji ber ku sist in, hinek helbestên Melayê Cizîrî

rexne kirine. Çi ye ev sistiya ku Zivingî behs dike, di kîjan helbestan de ye û ev aliyê ku wek sistî binav dike, çi ye?

Bersiv:

48. Bê bersiv.

Pirs:

49. Me behsa Dîwanê ki, r sala temambûna wê çend e, fikrek we heye, li ser vê salê ?

Bersiv:

49. Destpêka nivîsandina Mela ya Dîwanê di temenê Melayê 30 salî da destpêdike. Mela di derbarê vî temenî de, di helbestek xwe de, dibêje: *Sih sale ji derdû ji belayê te hilakin-hetta bi felek her diritin ahû ehê min.* Disa di rêze helbestek dinê de dibêje: *Ernekî rihmê tu Mîro, dê çi bit halê me îro-Ger nebê carek esîro girtîyê sî saleye.* Mela bi eşkere û zelalî dide zanîn ku temenê wî di berîya helbestgotinê de 30 sal e. Yanî lêkolîn û dîtina me ya bi hesabê ebcedî dîroka destpêka wêjenasîya wî ye. Gava em 30 sal temenê wî yê berya wêjeyê ji wê dîrokê dertînin, rastîya dîroka wî ya ji dayîkbûnê bê guman derdikeve meydanê. Feqîyê Teyran jî dibêje: Dema min û Mela helbest bihevra digot: sal 1031 bû, hejmara meya ebcedî sal 1027 di navbera dîtina me û gotina Melê de çar sal heye. Ango Mela piştê 4 sal destpêka nivîsa xwe bi Feqî re helbest gotîye. Gava ku gotîye dîwana wî ji sê beşan 2 bêşên wî hatîye nivîsadinê. Bi vê nirxandinê em dibêjin: bi hindikî 6 sal Mela dîwan xilaskirîye. Dîtina me jî di derbarê vê mijarê de biguman e.

Pirs:

50. Mesela zewaca Mele jî di nav xalên meraqê de ye. Ew jî û Xanî jî tê gotin ku nezewicîne. Ev balkêş e. Du mezinên me herdû jî nezewicîne, çi ye sir û kerameta di vê de?

Bersiv.

50. Mijara nezewicandina Xanî û Cizîrî mijarek pir balkêş e. Gava mirov li rewşa herdû Seydayên mezin dinhêre, mirov dibîne, kesên wek wanên ku tim li mijarên zanistî û ramanî ve

girêdayî ne, tu gizekî wan bi zewacû têkilîya bi jinan re namîne. Lewra herdû jî di nav xebatên xwe yên pir pîroz û birûmet de, bûne wek fena û gorîkerên di tekoşîna ramanî û netewî de. Bi dîtina me kesên divan qonaxan *de, bimeşin, hewceya wan bi zewacê namîne.*

Pirs:

51. Di bernameyên televizyon û medya Kurdî de, behsa helbesteke şînê dibe ku Feqiyê Teyran ji bo Melayê Cîzîrî nivîsandiye. Hayê te ji vê helbestê heye?

Bersiv:

51. Ev helbesta şînî ya ku dibêjin Feqî piştî mirina Melê bi awakî şînî ji bo Mela gotîye: min ew helbest carek li bal hevlekî momosteyê zanîngehê hilda û dît. Ew helbest roja koça Melê ya ji dinê dianî ziman, xembarîya xwe dîyar dikir. Lê dema min nivîsa wî nirxand da ber dîroka koça Melê min pir bawerîya xwe pê neanî û derbarê koça Melê de, min nepejirand. Ji ber ku min guman kir ku ew helbest ne ya feqî ye û hatîye çêkirinê.

Pirs:

52. Kesên dîwana Cîzîrî şîrove kirine, ne kê in. Di nav wan de Hejar û Seydayê Mele Ehmedê Zivingî jî heye. Yeke sêhem jî ya birêz Celalettin Yoyler e. Di nav van şîrovegeran de hun kê dipesînînin?

Bersiv:

52. Kesên ku dîwana Melê şîrovekirine çawa we anîye ziman divê demê de, sê kes in. Di nav van hersê şîrovekeran da, ez nikarim xwe bipesnînim. Lewra pesindayîna ji bo şîroveya min re, çewtî û şaşî û quretîyê diafirîne. Lê bi rastî Mele Ehmedê Zivingî kedek pir hêja daye şîroveya dîwanê û tê pesinandinê. Her çiqas bi dîtina min Seydayê Zivingî xwe bernedaye deryayê felsefe û ramana Melê ya ku herkes bi hêsanî nikare xwe noqê wî deryayê bike jî, lê dîsa şîroveya wî hêja ye.

Pirs:

53. Xaleke din ku zelaliyê dixwaze û li bendeyî

serastkirinê ye. mesela helbesteka ku Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî bi hev re xwendine. Navê vê helbestê û sala xwendina bi hev re û sebaba xwendina bi hev re? Ev adetek bû, di zemanê Cizîrî de adetên wuha hebûn, di nav şaîr û aliman de ku bi hev re helbestan bixwînin?

Bersiv:

53. Xala ku zelalî dixwaze mijara helbestgotina Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran bi hev re helbest xwendine. Navê vê helbestê dane berheva Mela û Feqî ye. Lê guftenê Feqî û Mela jî di hinek nusxeyan de hatine nivîsandinê. Sala xwendina wana bihev ra dîyar e. Lewra Feqî dibêje: dema me helbest bihev ra digot: sal 1031 bû. Helbesta ku Feqî gotîye ev e:

*Birîndarê eşqê me dûrim ji sîha bîhan
Zanim meddahê kê me di hezar û yek û sîhan
Senaxwanê Melê me hemû erdû cîhan*

Helbestgotina Mela û feqî ji adet û bihevra gotinên ji medreseyan Kurdistanê tî. Lewra di medreseyan de pir caran Feqîyan bihev re helbest digotin. Her wisa helbestgotina Mela û Feqî bi hev re, hezkirina wan a ji hev re û diyarkirina helbestvanîya wan e.

Pirs:

54. Li gora Abdullah Varli jî “ mela di dema Mîr Şerefexan û Şah Ismeilê Sefewî de hebûye û li ser navê herdukan gelek helbest jî gotine. Li gora Celalettin Yoyler ev neras te. Lewra berê Cizîrî ji diya xwe bibe Şah Ismeil miriye. Sala vê mirinê jî wek 1524 dide. Ev jî tê wateya ku bi kêmanî Cizîrî piştî Şah Ismeil bi 65 salan hatiye cîhanê. Dîtina te?

Bersiv:

54. Dema Melayê Cizîrî û Mîr Şerefexan û Şah Ismaîlê Sefewî ji hev cuda ne. Mîr Şerefexan di hezar û pîncê koçî de jîye. Di 1027an de Mela dest bi nivîsa helbestê kirîye. Dema Mela helbest nivîseye 30 salî bûye û di dema Şerefexan de jîye. Lê çawa me di pêşeka şiroveya xwe de jî daye xuyakirinê, sala

mirina Şah Ismaîlê Sefewî 1524 ê mîladî ye. Mela jî di 1590 ê mîladî de hatîye dinê. Faris dibêjin an kuca în kuca, 'ev li ku ew li ku'. Dîtina min a di derbarê van dîrokan de ji bil dîtina min a di pêşgotina şiroveyê de, nivîsek min ê taybet heye, ezê pêşkêşê wekim.

Pirs:

55. “Dema ku di sala 1997 an de, me dest bi şîroveya Dîwana Mela kir, me tim di domandina xebata xwe de, rastiya dîroka Mela di serê xwe ra derbas dikir û dixwest ku rojekê ji rojan em rastî gotineke mela ya derbarê jidayikbûna wî de werin”. Dibêje birêz Yoyler. Piştî dibêje ku bi dilxweşî û dilşadiyeke bêpayan jidayikbûna mela di nav rêzên helbestên wî de keşfkiriye. Ev kîjan rêz in?

Bersiv:

55. Mijara ku hûn ji 1997 an diaxivin û qala destpêka şiroveya me dikin, me di wê demê de, bi hesabê ebcedî di pênçkek erebî de, destpêka nivîsandina Mela ya dîwanê nirxand û dît. Rêzên ku em jê diaxivin û dibêjin me têde bi hesabên ebcedî destpêka nivîsa Melê dîtîye û temenê Mela ê ji dayîkbûnê dîyarkirîye ev e.

Navê beşa helbestê (**min di ber qalû belê**) ye. Ev beşa bi vê sernivîsê jî pênç pênçek beşan pêk tên. Di dawîya her beşek de, rêza pênca tim bi erebî gotîye. Ya ku me tê de temenê Mela yê destpêka nivîsê nirxandîye ev e. (**Tilke enbaun yeqûlû ennasû minna beede hinin**) ev rêze helbest bi gişt tîpên xwe bi hesabê ebcedî destpêka helbest nivîsandina Melê derdixin holê. Dema em sî sal temenê mela ku di berya nivîsê da ye, jê dertînin, temen dibe 1590-1665

Nîşe: Emê ji bil pirsên te nivîsek di derbarê nirxandina xwe ya salên Melê de, û tev dîtînen hinekên ku dibêjin me jî temenê Melê dîtîye bişînin. (1)

Me dem nedît ku em zûtir bersiv bidin. Dema me bersiv qedand, me sererast nekir. Kêmasîyên teknîkî hebin jî bibaxşîne.

هه‌واینامه‌ی کتیب
IV

هه‌وآنامه‌ی کتیب

Hevpeyvîna bi Jan Dost re

Pirs:

1. Li gora hinek idîa, hinek dîtin û nirxandinan, ji % 70- 80 ê şair û nivîskarên Kurd di bin bandêra Melayê Cizîrî de mane. Ev çendî rast e, nisbeta wê çend e? Ku wuha be çine faktor û kerametên li pey vê angaşte? Ev hêz, hêza ewqas sedsal e, kê û têhna xwe diparêze, cîhana nivîskar û helbestvanên me rapêçaye, kiriye bendewar û dilovanê xwe ji ku tê, ji ku av vedixwe?

Bersîv:

1. Bi ya min dibe ku rêjeya kesên ketine bin bandora Melayê Cizîrî û helbestvaniya wî, bêtir be ji ya ku di pirsê we de hatiye. Hema ji seydayê Kurdayetiyê yê mezin Ehmedê Xanî de bigir û heta Cegerxwîn. Kî neçûye ser kaniya Cizîrî û ava zelal venexwariye? Kê teswîrên wî ji bo xwe nekirine nimûne û di helbestên xwe de nedaye ser şopa wî ya pîroz? Cegerxwîn digot: Cizîrî bendera şairan e, her kesekî dawa xwe daye ber û têra xwe jê biriye.

Ji roja roj de û hîn seydayê Cizîrî li jiyanê bû, rola wî û bandora wî ya mezin li ser her kesê bi wêjeyê re têkildar, hebû. Helbesteke wî bi xwe heye, rexneyên tûj li melayekî ji Finikê dike ku helbesta Cizîrî li ser navê xwe di civatan de xwendiyê, ango qesîdeyên Cizîrî dizîne û birine li civatan gotine ev yên min in. Cizîrî li ser vî melayê ku navê wî ji

panzde tîpan e, dibêje:

*Qewî meşhûr e mela namê te ye xemse eşer
Tu bi şîira ne te gotî, xwe dikî qend û şeker*

Ev yek dide xuyakirin ku heta kîjan radeyê helbesta Cîzîrî xurt û bi hêz bû. Heta di jiyana wî de jê dihate dizîn û xelkê bi tevna wî helbestên xwe diristin. Cîzîrî Xwedan hêzeke mezin e ku mirov dikare bibêje ewî bingeha ekola helbesta Irfanî(teswwufî û evîna Xwedayî) di nava Kurdan de damezirand.

Ev hêz jî di baweriya min de ji kûraniya fikra Cîzîrî tê. Ew ne hema şairekî gotinên xweşik û ciwan li hev anîne. Wisa jî bêyî fikr û felsefe dikaribû bibûya şairekî navdar ê Kurdan. Lê taybetiya wî di baweriya min de ew e ku di zanînên dema xwe de yekî mûqelêş û bêhempa û serkeftî bû. Yanî derbarê felsefeya Grîkî de ku piştî belavbûna Îslamê û bi bizava wergerandinê re, li rojhilatê belav bû, gelek agahiyên wî yên kûr hene. Ew di her qesîdeya xwe de fikreke felsefîk dide ber guhên me. Bi me dide naskirin û felsefeya ewqase zor di cumleyên gelekî rihet de bi cih dike. Eger dem hebe emê mînakinan ji helbestên wî bidin. Emê bibêjin ka tayê kîjan felsefeyê di wan de dibiriqîne. Ya din ku hêzeke mezin daye Cîzîrî û helbesta Cîzîrî tesewwufa Îslamî ye.

Li gor dabeşkirina hin lêkolîneran tesewwuf sê beşên mezin in, yek jê **Tesewwufa irfanî ye**, ku girêdayî cîhana lahût û Xwedê ye ku nûnerê wê **Ibnu Erebî ye**. Ya din **tesewwufa wijdanî** yan jî evînbazî, ew jî girêdayî evîneke giran ku dawî dibe evîneke Xwedayî ye ku nûnerê wê di wêjeya tesewwufî erebî de **Ibnul Fariz e**. Cûreyê sêyem **tesewwufa insanî** yan civakî ye ku ew jî girêdayî xelkê ye û tesewwufê li dijî zulma desthilatdariyê ye ku nûnerê wê yê berbiçav **Mensûrê Hellac e**. Cîzîrî bi xwe bêtir di ekola tesewwufa wijdanî de ders wergirtin û paşê bûye mamosteyekî mezin tê de. Ji bilî tesewwuf û felsefeyê, Cîzîrî zanayekî dînî bû, zanayekî ku haya wî ji astronomiyê jî gelekî hebû, ji zimanê Erebî ku ew tê de gelekî serdest bû, hebû. Ji zanistên quranê û tefsîra wan ne

bêpar bû, her wisa ew diyar dike ku wî çavek li kitêbên bijîşkiyê jî xistiye û navê çend kitêbên Ibn Sînayê navdar di helbestên wî de derbas dibin. Ew ne tenê şair bû lê alimekî mezin bû û ronakbîrekî dema xwe bû. Ji bilî vê, cesareta wî gihişt radeyekê ku bibêje: ez ji Hafîzê Şîrazî jî şairtir im. Û ji wir her bang li gelê xwe dikir ku herin helbestên wî bixwînin. Wî bi xwe zanîbû ku ew gewherekî nirxdar e, li welatekî ku qîmetê gewheran lê kême, wî dizanîbû ku ew mûm û şemal û çiraya Kurdistanê ye:

Gula baxê Iremê Bohtan im.

Şebçiraxê şebê Kurdistan im.

Lê mixabin qedrê wî gelekî nîn e, loma jî berê xwe dida piraniya xelkê û digot:

Xaliba ehlê zemanê me, Mela Ademîyin?

Venûmayin ji kerê mey reş û gayê te yê beş!

Ango: ey Mela, piraniya xelkên dema me ne ademîzad in, ferqa wan û kerê me yê reş û gayê te yê beş nîne.

Ew mirovekî heta tu bibêjî ji xwe û bi xwe bawer bû. Bi zanîna xwe û zimanê xwe yê kurmancî bawer bû, û di seranserî helbestên dîwanê de wî pesnê xwe û hêza xwe ya hunerî kiriye. Helbet xwepesindana wî ne ji valahiyekê tê, ew bi xwe jî xwe qenc nas dike û dizane ku hakimê peyv û hunera helbestê ye, ew bi xwe dibêje:

Di iqlîmê suxen mîr im, di şîirê de cîhangîr im.

Yanî li welatê peyvê mîr im, û di helbestan de jî min dunya daye ber xwe!!

Pirs:

2. Dibêjin ku Mîr Şerefîxanê navdar, nirx û rûmeteke bêpayan daye Cizîrî, ew çendî ku di goristana malbata xwe de ew kiriye şîrîkê xwe, yeke ji malê. Tê gotin ku ew kesê bi tenê ye, di goristana desthelatdarên Cizîrê de ku ne ji malbatê ye, ev hinekî rûtbe û nîşandayîna lordîtiyê li Ingilîstanê tîne bîra mirov, yan na? Di vê derbarê de çi delîl, gotin, hene?

Bersîv:

2. Ez bi xwe nizanim ka ev yek rast e yan na. Lê helbet qedrekî wî yê mezin li ba mîrên Cîzîrê hebû. Ez dikarim bibêjim ew şairê bargahê bû. Şairê mîran bû. Şairê desthiladariya Kurdî bû. Îcar ku mîna paye yeke bilind dabinê û ew di goristana mîranî de veşartibin, ne dûr e. Ew jî mîrek bû, lê wek min berî niha ji helbesteke wî mînak anî, mîrê peyvê bû, mîrê qesîdeyan û şîirê bû. Ne bes weha, wî digot: Ez di helbestê de sultan im!

Ez bawer dikim, dê wî mîna her wêjevanekî piştî mirina xwe bêtir guhdan dîtibe. Yanî di jiyana xwe de ne gelekî bi kêf xuya dike. Em di helbestên wî de vê yekê bêhn dîkin. Ew gelekî gazinan ji dem û xelkên demê dike, wan bi ker û ga dişibihîne û bi darên ji agirekî re rêzkerî bin, jî dişibihîne. Dibêje ku ez bê mal û milk im, spasiya Xwedê dike ku agirê evînê û iksîra wê kiriye para wî ne mal û milk. Di gel ku wî bi du helbestên giran û têrwate pesnê mîran jî daye, ez dibêjim ku qedrê wî dîsa baş nehatibû naskirin. Îca li pey mirinê wek ku dibêjin(gurrî gulîsor dibin) mîr xwestiye qedrekî zêde bide wî! Mumkin e. Dîsa jî li gor agahiyên min ew di zêzemîneke Medresa Sor de defîn bûye. Yanî tirba wî li wir ziyaretgeh e û belkî hinekan ji mîrên Botanê xwestibin li kêleka wî werin veşartin.

Pirs:

3. Her kes kê m ya zêde, bi ferq û cihêyî be j,î ber û berhemê şert û mercên welat, kultur, dîrok û serdem û qonaxa xwe ye. Heger mirov jî vê awurê, jî pencereyeke wuha sosyodîrokî, xwe bi nav salên dema Cîzîrî li jiyane ye berde, hinekî noqî nav sedsala wî bibe, gelo wê encam çi bin?

Bersîv:

3. Li vir em dikarin mîna ku lêkolînerê Kurd yê hêja Ebdurreqîb Yûsiv di kitêba xwe Dîwana Kurmancî de gotiye, dubarebikin û bibêjin ku Cîzîrî û helbesta Cîzîrî berhema aramiya piştî şerê Çaldêranê bû, aramiya ku li Kurdîstana

bakur konê xwe vegirt û li cizîra Botan jî bêguman. Cizîra Botan cihê nakokiyan bû, cihê tevliheviyê bû û Osmaniyan û Sefewiyan nehiştin ew herêm rihetiyê bibîne. Hêzên Sefewiyan hertim êrîş dianîn ser Cizîrê û leşkerên giran dişandin ser wê mîrnuşîniyê. Xelkên wê û mîrên wê li ber xwe didan, xwîn dirijiya, em hinek agahî ji Mem û zînê dizanin, Xanî behsa şerê Qizilbaşan yê li Cizîrê dike. Lê dawiyê û li ser destê Mîr Şeref, piştî ku wî birayê xwe kuşt, Cizîr aram bû û xelk êdî li zanînê, li xwendinê zîvirîn. Cizîr bû navenda hîlbûna wêjeyê Kurdî û zewijeyê berhemdar. Em dikarin navê wê serdemê bikin (serdema pêşengan), Cizîrî, Feqîyê Teyran, Xanî ên wê serdemê ne. Helbet ew ne wisa mîna dobelanan şîn hatin û ne li ser tu kok û bingehê bûn. Gelek sebeb hebûn ku hişt ev pêşengên han werin meydanê û bibin nûnerên ziman, çand û wêjeyê Kurdî ya nûzayî. Di serî de zeîfbûna hukumdariya Ssmanyian li wilayetên rojhilat û bidestxistina Kurdan ji cûreyek serxwebûna ku hişt wêjê jî nefesê bistîne. Li Behdînan Qutbê Exlatî derket. Li Botan Cizîrî, li Serhedan û Hekariyê jî Xanî. Her yek jî ji van di siya mîrnuşîniyê Kurdî de derketiye meydanê. Bêguman wan nikarîbû di bin siya Qereqoyunluyan, yan Aqquyunluyan yan jî di bin baskên Mîrmîranên Osmanî de zimanê kurdî bi pêşde bibirana.

Bi her halî em dikarin li ser Cizîrî jî bibêjin ku wî xwe sipartiye ekola wêjeyê ya farisî, mamostayên wî jî Hafîz û Saadîyê Şîrazî û Camî ne, Cizîrî di hemêza şîira farisî de mezin bûye, lê taybetiyeke wî heye ku karîbû zimanê kurdî bilind bike û bihêle ku ew jî poşê xwe li farisî bixîne. Wî zimanê kurdî anî li rastî zimanê Firdewsî û Hafîz danî ku bi sedê salan bû xizmet jê re hatibû kirin û bi sedan û belkî bi hezaran berhem pê hatibûn afirandin. Cizîrî bi zimanekî nivîsîye ku mirov dibêje qey bûye hezar sal ev zimanekî serdest e. Tişteki balkêş e ku serdestiya zimanê Kurdî di helbestên Cizîrî de kifş e!

Pirs:

4. Mezinahiya Cizîrî bê gotin e, mohr û şeqla qebûla giştî, şareza û xwedîgotinên pispor ji zû de hildigre.

Dema gotin tê ser mezinahiyê, ser wezin û giraniya wêjeyî, hunerî, hostetî û hêza peyvê, tecrûbe çi dibêje, çi ne pîvan û kirîterên giştî?

Bersîv:

4. Eger em têkevin hundurê helbesta Cîzîrî gelo di serî de em bala xwe didin çi? Em bala xwe didinê ku em li ber bejneke mezin ji bejnên helbestê yên rojhilatê ne. Bi mijarên xwe, bi evîndariya zelal ya ku diherike nav helbestan mîna coyêke şêrîn û safî. Ferhenga wî ya zengî û çarzimanî ku bi hostetî û hunermendiyeke bêpayan bi kar aniye. Her weha zimanê wî yê kurdî gelekî herî û nazik e. Zimanekî ku ez bawer dikim di dema wî de piraniya xelkê jê fêhm dikir. Qet peyvên hişk û kovî bi kar neanîne. Heta jê hatiye nerm nerm nivîsiye ku guhdarên xwe neêşîne. Lê helbet xurt in, kevirên ku pê helbesta xwe avakiriye. Ne hema çi gotin be aniye, na ew mirovekî gelekî haya wî ji hêza peyvên hebû. Yanî dizanîbû çi li ku datîne.

Pirs: هه‌واینامه‌ی کتیب

5. *Mamoste Celalettin Yoyler di lêkolîna xwe ya bi navê “ Şîroveya Dîwana Melayê Cîzîrî” de / Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Avrêl 2006/ girêdayê salên jidayikbûn û mirina Melayê Cîzîrî de wuha dibêje:” Mijara herî girîng a ku heta niha ji hêla tu dîrokzan û lêkolîneran ve nehatiye zanîn dîroka jidayikbûna Mela ye. Di vê mijarê de em dibêjin, me bi lêkolîneke berfireh rastiya jidayikbûna Mela, ji bo raya giştî û xwendevanên pirtûka xwe ya şîroveyî derxiste holê”. Ev jî salên 1589- 1664 e. Hayê te ji vê lêkolînê çend e, çine dîtînen te li ser van herdû salan, di vê derbarê de çu nezelalî, nexwiyayîytî, bi gotinên xelkê heft û heyşt hê mane ?*

Bersîv:

5. Celaledîn Yoyler li ser kîjan bingeheke zanistî ev bawerî avakiriye nizanîm. Lê ew jî dikeve rêza bîr û baweriyên li ser jiyana Seydayê Cîzîrî. Ku ferqeke mezin heye. Hin wî dibin

sedsala şeşan û hin jî wî heta sedsala 11an ya koçî tînin. Di baweriya min de dê Cizîrî ne dûrî wê tarîxa ku Yoyler aniye ziman be. Ji ber ku lêkolînerên din jî nêzîkî wê tarîxê ne . Mele Ehmedê Zivingî yê ku şiroveya erebî ya dîwanê li Qamişloyê sala 1959 an weşand jî tarîxeke nêzîkî wê tarîxê tîne.

Li gor lêkolîna ku Tehsîn Ibrahîm Doskî di pêşgotina şiroveya dîwana Cizîrî de belav kiriye(kitêb sala 2004 an li Duhokê çap bûye, yanî berî Yoyler bi du salan!!) Cizîrî di sala 1567/1568 zayînî de ji dayik bûye. Her weha li gorî şîna Cizîrî ya ku dibêjin Feqiyê Teyran di helbesteke xwe de beyan kiriye Cizîrî sala 1050 yê koçî, beranberî 1640/1641 zayînî çûye rehmetê.

Pirs:

6. Çi gava gotin bê ser jîyanê; jiyana navdar û hêjayekî me, kesayetî, xwedîprestîj û hezkiriyekî me, giriftek, serêş û dudilîyek derdikeve pêşberî me, dikeve pêxêr û pêşîra me. Ew jî ev mesala salên jidayikbûn û mirinê ne. Navdarekî wek Melayê Cizîrî ku di rêza navdar û xwedî bandêran de bi Ehmedê Xanî re tê miqayesekirin, ne ecêb e ku piştî çend qirnan hê jî em ji agehdarî û pêzanînên xwe ne piştrast in? Kî berpirsiyar e, dîroknaş, biyografînas, siyasetmedar yan rewşenbîr bi giştî? Gelên din ne wuha ne, mirov vê çawa şîrove bike?

Bersîbv:

6. Em tucarî nikarin gunehê vê yekê bixin stûyê kesekî, nifşekî an kategoriyeke bi tenê. Di vir de divê em ji bîr nekin ku civaka Kurdan bi zorê û bi kotekî xwe diparast. Bi sedan şer û cengên mezin li ser qada Kurdistanê diqewimîn. Sîstemeke pehn û dirêj bi serê xwe di vê pirsê de tawanbar e. Kurdan zêde guh nedane zanînê. Ev jî rastiyeke, divê em qebûl bikin. Lewra ew ji devê pêşengên me hatiye neqilkirin. Xanî û berî wî jî Şerefxanê Bedlîsî her diqêriyan û digotin ku bazara zanînê li ba Kurdan kesad e. Cizîrî jî weha digot:

Qedrê gulan çi zanin?

Kerbeş divêt kerê reş!

Me dîroka xwe nenivîsî. Ji xwe xelkê jî dîroka me ya rast nenivîsîye. Me kesayetiyên xwe ji bîra windabûnê dernexistin. Eger yek dewleta Kurdan hebûya û rûniştibûya dê piştî sed salekî bê guman rêya arşîfkirinê jî vebûya. Dê nifşek bihata meydanê ku tiştêkî veşartî di bin (ax û toza dîrokê) de nehiştiba. Li cem ereban tu çi cûre kitêb dixwazî heye. Çi tê bîra te? Ew kitêb heye û hatiye parastin. Tu kîjan helbestavnî dixwazî? Navê bavê wî, eşîra wî, li ku hatiye dinê, çûye ku, li ku geriyaye, çi xwendiyê, qelew yan zeîf bû û hwd her tişt li ser jiyana wî heye. Ê me Kurdan mixabin ku zanîn kete nav me, tenê me berê xwe da diyanetê, yanî hedîs û ayet û fiqh û şerîet bû. Xwedê kir ku çend nimûneyên qedirbilind ji nav me, ji nav wê rêza meleyan derketin û bîra kurmancî û nivîsîna bi kurmancî birin. Tiştên wisa, yanî dokumentkirin, arşîfkirin û nivîsandina bi rêk û pêk, saziyên dewletê yên mezin li pê wan in. Yanî ereban eger ne guhdana xelîfeyan bûya dê wan jî zêde nenivîsnadibûya. Tirkan jî wisa. Osmanîyan dixwestin xwe bigihînin paya farisên Sefewî. Pêşbaziyek hebû, konkurensêk hebû di navbera herdu Impertoriyan de, loma jî di baregahên sultanên wan de jî şair hebûn û kitêb bi guhdana wan hatin nivîsîn. Ez dikarim bibêjim ku ev hinekî girêdayî karakterê milletê Kurd e jî. Em bi koka xwe koçer in. Ku em hatin bajaran jî me koçerîya xwe ji bîr nekir. Di kitêbekê de ku ferhenga bajaran ya Yaqût Elhemwî ye, tê gotin ku Hewlêr bajarekî Kurdan e, lê ew bajar gundekî mezin were hesibandin rasttir e. Wisa dibêje Yaqût Elhemwî. Yanî bajar divê bi hemam û qeyseriye û sehafiye û camiyên mezin û medrse û xaneqah û hwd bin. Lê xuyaye bajarên Kurdan jî wê demê hîn ji koçerî(neketicibûn). Ne ku koçerî şermeke yan kêmanîyeke, lê jiyana koçeriyê dihêle hinekî kaos hebe, koçer pezê xwe, mast û penêrê xwe beranberî difroşin, yanî mal bi mal, ser bi ser! Nivîsandin û qeydkirina deynan û hesab, nîne. Di kitêbên erebî yên kevin de destnîşanî vî xusletê Kurdan dibe. Hişyarî û aqilmendiyeke mezin divê ku haya mirov ji arşîfkirin û

qeydkirinê hebe. Di erebî de gotinek hebû, rehmetiyê bavê min bi dehê caran û her ku pênuşeke nû bi dest dixist ew dinivîsî: Zanîn nêçîr e, nivîsandin xefka ku wê nêçîrê digre. Rastî jî wisa ye em pirr dûrî nivîsînê man, loma jî her rewş û tiştên me nezelal man.

Pirs

7. Xwendin û dersdariya Melayê Cizîrî?

Bersîv:

7. Li vir dîsa em dê xwe bisipêrin texmînan û xwe biavêjin bextê xeyalê xwe ku alî me bike. Ji jêderên dîrokî yên pêbawer tiştêk ji jiyana wî negihaye berdestê me. Lê li gor agahiyên ku Mihemed Elî Ewnî ji devê xelkê wergirtine, Cizîrî hêj zarok bû ketiye medreseyê. Bavê wî alimekî dînî bû û ders dane wî. Ew li pey ilim geriyaye û çûye Hekarî, Diyarbekir û Amîdiyê. Di 32 salîya xwe de icazeya ilmî(Icazename) ji destê Mele Taha li gundê Sitirbasê(?) wergirtiye. Pişt re li gundê Serba yê bi ser Diyarbekirê ve bûye mela û imam. Ji wir jî berê xwe daye Hesenkêfê û di medreseyên wê de bûye muderris(ku êdî wî bi xwe icazename dida meleyan). Ji wir ve geriyaye Cizîrê û meletî û imamtî di Medreseya Sor de kiriye heta di temenê heftê û pênc salî de miriye.

Eger ev agahî devkî hatibin jî, û eger yek rabe bibêje: Ev ne rast in û em pê ewle nabin. Em dikarin mîna rastiyekê qebûl bikin. Ji ber ku şeweyê xwendinê û dersdayinê wisa bû. Ev sîstema xwendina li Kurdistanê bû û heta niha jî wisaye.

Pirs:

8. Dema Cizîrî serê xwe datîne. Diçe rehmetê li gora texmînan Ehmedê Xanî 13-14 salî ye. Îmkan heye ku Xanî Cizîrî dîtibe, yan di zaroktiya xwe de, hê dema Cizîrî saxbû, dîwana wî xwendibe, yan jî bi riya malbata xwe bav û xizmên xwe li ser vê dîwanê hinek zanebûna wî çêbûbe?

Bersîv:

8. Ez vêya gelekî dûr dibînim. Li gor lêkolînan Cîzîrî berî ji dayikbûna Ehmedê Xanî çûye rehmetê. Yanî di derdora 1640 de wefat kiriye, Xanî di pey wefata wî bi 11 salan jidayik bûye. Eger ev tarîx ne rast bin jî, û Xanî wek di pîrsa te de hatiye 13 yan 14 salî bûye, mumkin e. Hevdîtina wan ne dûre lê em nikarin vê yekê piştrast bikin bêyî delîlekî zanistî.

Pirs:

9. Heger em di nav Cîzîrî û Xanî de muqayese û berhevkirinekê bixwazin, çi mimkun e bê gotin? Mesele muqayeseyek ji awura têkiliya bi cîhanê û der û dora xwe re, têkiliya bi mîr û desthealtdarên Kurd re, ji awura naveroka berhemên wan, zimanê wan û Hwd.

Bersîv.

9. Ev pîrseke mezin e, bersiva wê jî bawerim hin lêkolînan dixwaze. Em nikarin bi du sê rûpelan du pêşengên mezin yên wêjeya Kurdî mîna Xanî û Cîzîrî bidin ber hev. Lê di vê hevpeyvînê de mirov dikare destnîşanî hin xalên zêde girîng bike ku ew xal dê karakterên herdu pêşengan ji bo me bi gewde bikin û cudatiya herduyan bidin xuyakirin. Di serî de Xanî û Cîzîrî herdu jî kezebşewitiyê wêje û zimanê Kurdî ne. Wefadarê lorîkên dayikên xwe ne. Wan herduyan jî bi zanebûn dev ji zimanê Farisî û Erebi û Tirkî berdaye, yan jî hîç meraqa wan ji bo van zimanan nebû, lê berê xwe dane zimanê dayika xwe û berhemên gelekî giranbûha ji bo gelê xwe li şûna xwe hêlane. Ehmedê Xanî derdê milletê wî bêtir ew li nivîsandinê germ dikir. Wî nivîsandin mîna çekekî didît. Mîna zengilekî, mîna defa hewarê. Li ba Cîzîrî cuda ye, ew hinekî bi ser xwe ve dipûnîje, li dora zatê xwe û derûnê xwe dizîvire, xwe li xwe digêrîne û li dora xwe (tewafê) dike û çerx dibe. Xanî ne wisa ye, derdê wî tevaya milletê Kurd e. Evîndariyê nas dike, işqa rastîn zane, lê ew heta evîndariyê jî dixwe xizmeta gelê xwe. Em li vir ne ku qedrê Cîzîrî kêmtir dikin. Na, ew ne hedê me ye, ew dê her û her qedirbilind û mîrê şairên Kurd bimîne. Lê ev muqayesekirineke di navbera

herduyan de. Cizîrî ji cîhanê biskên yara xwe didît û digot:

*Te divê zêr û zeber kî me, du biskan bide ber ba
Te divê qenc-i qiyamet li me rabit, bi xwe rabe*

lê Xanî digot:

*Ez mame di hikmeta Xwedê da
Kurmanc-i di dewleta dinê da*

*Aya bi çi wec hî mane mehrûm
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm?*

Felsefeya Xanî felsefeyeke bi civakê ve girêdayî bû, felsefeyeke ku mekanê wê erd û civak bû. Ji bo aramî û serdestîya gelê xwe difikirî. Lê ya Cizîrî felsefeyeke gerdûnî bû, bêtir ji erdê dûr bû û xemxwariya civakê nedikir û derdên xelkê zêde nedixwar.

Em dikarin vê yekê veogerînin sebebeke bingehîn ew jî istiqrara ku li mîrnuşîniya Cizîra Botan peydabûbû. Li Bazîdê ne wisa bû, li Bazîdê şer û ceng gurmegurma pêlên herdu terefên şer(Osmanî û Sefewî) bû. Ji nav wê gurmegurmê helbet dê mejiyekî bi mêjûyê mijûl derkeve holê, helbet dê fikreke neteweyî derkeve. Lê li Cizîra Botan, ku rihetî hebû, aramî hebû, mîrîtiyeke ciwan li dar bû, helbet dê şairekî mîna Cizîrî were meydanê ku derdên wî ne mîna yên Xanî bin.

Li ser pirsê têkiliya bi mîr re jî min berê di hin nivîsan de ev mijar zelal kiribû. Niha jî dixwazim bibêjim ku Cizîrî ji ber ku mîrnuşînî serbixwe xuya dikir û destê Osmaniyan jê dûr bû, alîgirê Mîr bû. Xanî bi çavê serê xwe têkiliyên mîrekên Bazîdê û Osmaniyan didît, loma jî xwe ji wan bi dûr dixist û rexne jî li wan dikir. Berovajî wî, Cizîrî pesnê mîrên Botanê dida. Di navbera pesindan û rexnekirinê de geliyekî kûr ji rastiye heye. Rastiya mirovê rewşenbîr yê ku di navbera xwe û desthilatdariyê de mesafetekê dihêle û ji wê mesafetê desthilatdariyê kontrol dike. Eger îcab bike rexne dike û rêya rast dibêje. Cizîrî ev rol nelîst û ev barê giran neda ser milê xwe. Wî rexneyên mezin li xelkê kiriye, li amiyan û ew bi keran şibihandine. Helbet ev ji têkiliyên wî yên bi mîran re tê. Ew mirovekî gelekî bi nefis xuyaye. Bi qata Aristokrat re

pariyan difirîne, yara wî jî di qesr û qonaxan de ye, di birc û serayan de ye û ew jî tim koleyê wê ye!! Di her devera ku keys dîtiye de Cîzîrî pesnê xwe kiriye û dev avêtiye xelkê. Xanî ne wisa bû, dilê wî bi ser xelkê ve bû û xêra wan dixwaset, ji bo wan kitêb çêdikirin û rêya ilm û zanîne ji wan re vedikir.

Pirs:

10. Qonaxên afrêneriya Cîzîrî, hejmara zimanên Cîzîrî zanîbûn û têkiliya di nav wî û wêjeya farisî, erebî û Osmanî de.

Bersîv:

10. Guman nîne ku wî çar zimanên herêmê zanîbû. Erebi ji ber ku zimanê quranê ye û diyanet bêyî wî zimanî nabe. Farisî ji ber ku zimanê wêjeyê bû û her şairekî wan deman divabû farisî zanibe. Tirkiya kevn ku zimanê dewletê bû. Û kurdî zimanê dayikê.

Heta kîjan radeyê ew bi wêjeya osmanî re têkildar e, ez nizanim, ji ber ku ev yek lêkolînekê dixwaze û divê meriv li ser wêjeya Osmanî ya beriya Cîzîrî û ya di dema wî de hinekî çavnas be, haya wî ji şeweyên wêjeyê li welatê osmaniyan hebe. Lê têkiliya Cîzîrî bi wêjeya farisî re kifş e. Di helbestên wî de em dengvedana destanên farisî dibihîzin. Neynika Sikenderî û Cama Cemşîd, destanên mîna Yusif û Zuleyxa, Şêxê Senanî, Leyla û Mecnûn, Mehmûd û Eyaz. Navên şairên Faris mîna Camî, Seedî, Hafîz, Ferruxî di helbestên wî de derbas dibin. Ji şeweyê ristina wî ya helbestê jî mirov dizane ku ew gelekî di bin bandora farisî de maye, peyvên farisî jî têra xwe di qesîdeyên wî de hene. Em dikarin bibêjin, teşîya ku ew pê dirêse farisî ye, lê tayên wî Kurdî ne.

Pirs:

11. Gelo ji dîwana xwe pê ve tu berhemên wî yê din çêbûne? Wek nimûne, Xanî fireh, çendalî û xwedî mijûlahî ye, navçeya enterese û pêdaketinên wî fireh e, dest avêtiye gelek tiştan. Ji vî milî mirov li wextdagirtin û dembuhurandina Cîzîrî binere, rewş

çawa ye, ev bi çi nisbetê xwe di helbestên wî de dide dest?

Bersîv:

11. Ciyê mixabinîyê ye ku berhemên me yên wêjeyî nehatine parastin, yanî bi wî rengê akademîk nehatine parastin. Hema bi kêmanî navên berheman mabûya wê gelekî qenc bûya. Ji bo Cizîrî nizanîm ka gelo wî tu berhemîna din afirandibûn yan na. Ji bo kesekî mîna wî payebilind ew dîwana wî bes e. Ji xwe di zemanê berê de wisa bû. Ku yekî dîwanek derdixist digiha dawîya rê. Ne mîna niha bû ku rojê helbestek du helbest bihatana nivîsandin. Şairê mezin Nalî ku dîwana xwe qedand weha got:

*Faris û Tirk û Ereb hersê mî bidefter girtuwe
Xawenî sê mulk e emro, Nalî dîwanî heye!!*

Yanî Nalî bi wê dîwana xwe bûye xwediyê sê memleketan!. Dîwana Cizîrî bes e ku bîr û baweriyên wî ji me re neqil bike. Ew baxeguleke û bes e ku em derbasî hundurê wê bibin û guldestan jê biçinin. Wî ji beriya 400 salî de gotiye:

Wer şî`rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet?

Dîsa mirov nikare bibêje, ku ev dîwan tek û tenê ye! Lê te ew di vî alî de jî bi Xanî re muqayese kir, Xanî xwedî proje bû. Cizîrî ne wisa bû, loma jî Xanî pîralî bû û gelek kitêb nivîsîn, ji bo zarokan, ji bo ciwanên ku di medreseyan dînan de dixwînin û ji bo mîr û zanayan Kurdan jî Xanî berhem afirandine.

Pirs:

13. Wek tê gotin û hate gotin hejmara zimanên biyanî ku Cizîrî zane û serdestê wan bû, ne kê mî in. wî jî wek Xanî, lê pîrr berî Xanî bi Kurdî nivîsand. Xanî ne mikun e dema biryara xwe ji bo nivîsandina bi Kurdî kiriye jîyan û pratîkê ji Melayê Cizîrî hêz negirtibe, ew bibîraneanibe, ji bo xwe nekiribe nimûne. Belê Cizîrî kî ji bo xwe kiriye nimûne, wî şopa kê domandiye, gihandiye cîl û nîşên piştî xwe?

Bersîv:

13. Rast e. Xanî di nivîsîna bi Kurdî de bûye peyrewê Cizîrî. Ji xwe navê wî jî di şahesera xwe (Mem û Zîn) de aniye wek yekê ku divê êdî were vejandin û careke din bi ruh bibe. Xanî çawa dixwest Cizîrî bi ruh bike? Bi rêya piştgiriya desthilatdariya Kurdî, di rêya mîrê Kurd re û di nivîsandina berhemên bi Kurdî re. Îca ez werim ser pîrsa te û mijara dîwar û palpiştên ku Cizîrî di nivîsîna bi kurdî de xwe sipartiyê. Qet li ba min guman nîne ku Cizîrî ne yekem şairê ku bi kurmançî nivîsiye. Her di pêşiya wî de hebûn û her bi kurdî hatibû nivîsandin. Lê kî ne û li ku ne û çî nivîsîne? Mixabin tu bersiveke zanistî ku dilê mirovan lê rûne di destê min de nîne. Hema ez dikarim bibêjim ku di Şerefnameyê de îşaretin hene ku şairên Kurd beriya Cizîrî hebûn. Mesela Şerefîxan destnîşanî mîrekî Kurd bi navê Yaqûb beg dike û dibêje: Wî bi Kurdî gelek helbest rastine û dibe ku dîwaneke wî jî hebe!!! Ji vê yekê em dikarin bibêjin ku pêşengên berî Cizîrî rêya wêjeyê rast û durust kirine, lê mixabin navê wan ketiye ber pencên jibîrbûnê. Hema ew pêşengê me ji Cizîrî re ne wînda û nenas bûn. Bêguman Cizîrî helbestên wan xwendine û li ser bingehê ku wan daniye ava kiriye.

Pirs:

14. Kesê ku Cizîrî, dîwana wî, şîroveyên li ser jîyan û berhema wî dixwîne, ne mimkun e bi pîrseke wuha re veneciniqe: em giş payeya nivîsandina bi kurdî didin Xanî, ewçendî em vê dubare û bi dengê bilind dikin mîna ku destpêkerê tiradisyona nivîsandina bi zimanê kurdî di berhemên wuha biserûber, li ser hev û mezin ne Cizîrî, belê Xanî be. Ev ne neheqiyek li Cizîrî ye?

Bersîv:

14. Eger mebest **nivîsnadina bi kurdî** be, rast e, neheqî ye, li Cizîrî. Ne cihê şik û gumanê ye ku Cizîrî mamosteyê Xanî ye di nivîsandina bi kurdî de. Di hunera helbestê de di ser re ye, bêguman. Cizîrî beriya Xanî dest pê kir û bi ser ket. Zimanê kurdî di nav destê xeyalê Cizîrî de hevîrekî nerm bû û karîbû

jê her tiştên ciwan saz bikira. Belê giraniya ku niha em didin Xanî ne ji ber nivîsandina bi kurdî ye, ji ber fikrên wî û bîr û baweriyên wî ne. Ji ber damezrandina wî ya ji fikra netewî re ye. Nirxên Xanî ji wê yekê tê ku wî **nivîsîna bi kurdî** xiste xizmeta Kurdan, Cizîrî jî **nivîsandin** bi xwe xiste xizmeta Kurdan. Bala xwe bidê ferqa (nivîsandinê), û (nivîsandina bi kurdî) gelekî heye! Yanî bi gotineke din, Cizîrî kurdî kir zimanê nivîsandinê yan jî nivîsandina bi kurdî gihande qonaxeke nû, lê Xanî hat û ew nivîsandina bi kurdî rûyekî din jê re peyda kir û hişt ku hêzeke mezintir tê de xuya bibe.

Bi ya min neheqiya ku li wan pêşengên me dibe, nexwendina berhemên wan e. Divê em li wan veşerîn û li wan xwedî derkevin, beşek ji şerê me yê hebûnê û berxwedana me ew e ku em boriyên xwe, damezrênerên fikra xwe ya netewî û rêberên xwe yên wêjeyî jî bidin ber ronahiya agirê şoreşê û wan di nav mij û moran û tariya dîrokê de nehêlin. Ew kok û binyata me ne, ku em wisa ne li ser koka xwe bilind bibin, dê gelekî bi jor de neçin. Dê şax û terhikên me bê sî bimînin û zû werin xwarê.

Pirs:

15. Di mesela pesin û şabaşên ji bo mîrek û deselatdarên Kurdan ne ji bo Şah û Sultanên netewên serdest jî ji heman riwagê mimkune mirov binirxîne. Cizîrî jî xwe ji pesnê serdestên neteweyên biyanî û ne Kurd vedaye. Ev paye jî ji Xanî zêdetir ne ya Cizîrî be?

Bersîv:

15. Eger em pesindana mîrekî Kurd weke tetmînkirina hestên netewî bihesibînin, emê bibêjin ku Cizîrî ji Xanî bi pêşdetir bû. Erê Cizîrî pesnê mîrê Kurd daye. Ji bo vê yekê jî min hin rexne li Cizîrî kirin, min got ku ew şairekî(ehlî irfan e) nabe ku pesnê mîran bide. Sofî wisa nakin. Sofî xwe ji mîran diparêzin û dûrî wan diçin û mesafetekê di navbera xwe û wan de ji bo kontrolkirina wan dihêlin. Lê mirov dikare tefsîrekê bidê. Mirov dikare bibêje ku agirê netewayetiye di hundirê Cizîrî de jî gelekî gurr bûbû, loma jî ew gelekî bi

mîrê Kurd serbilind bû û zimanê wî bi wan pesnên mezin geriya. Bi rastî gava ez wan herdu helbestên Cizîrî yên pesindariyê dixwînim, dibêjim qey yekî medhiye ji sultanekî yan şahêkî re, ne ji mîrekî re nivîsiye. Ewqas mîr firandiye ezmanan ku tu dibêjî ne mumkin e, ev yek ne sultan be. Lê di baweriya min de ev hêz û xurtiya qelema Cizîrî dide xuyakirin, bêtir ji mezinahiya mîr. Yanî dibe ku yekî qelemsist jî eynî wî mîrî bipesinanda, lê dê mîr di çavê me de ne ewqasî mezin xuya bikira. Hema bi qelema Cizîrî ya hêzdar mîr gihaye rutbeya sultan. Li vir şairekî erebî gelekî navdar tê bîra min, navê wî Mutenebbî bû, ew jî klasîk e û di beriya Cizîrî de bû. Medhiyeyên wî yên ji bo mîran gelekî bi hêz û xurt in. Heta dibêjin ku her mîrekî dixwest Mutenebbî medhiyeya wî binivîsîne!

Xanî mîr neparast û medhiye derheqê wî de nenivîsî. Li ser mîrê Bazîdê mîr Muhemedê Pirbela jî mersiyyek(şîn) nivîsî ku tê de xemgîniya xwe dide xuyakirin bi bona mirina mîr. Hema Mem û Zîn mişt rexneya mîr e. Rexneyeke ku mirov tê derdixe Xanî ne dijminê mîr e, lê dilxwazê wî ye û rêyeke rast dide berê. Ew wezîfeya xwe mîna Intellektuelekî bi wijdan dilîze. Derdê millet ji bîr nake û xwe dike dengê gel. Ev cihêtiya Cizîrî û Xanî ye: girêdana bi derd û hevî û doza tevaya gel re.

Pirs:

16. Bikaranîna navê Kurdistan û hezkirina ji Kurdistanê, ax û ava welat û ne bikamilî, sitewyayî û bi dereceya ku li ba Xanî piştî çêdibe, ne siyasînebûyî be jî, bendewariya Cizîrî jî ne piştqewîniya esasî be ji bo Xanî ku di vî alî de zelaltir, bicesaretir û vekirîtir bibêje, binivîsîne û xwe formûle bike?

Bersîv:

16. Helbet wisa ye. Xanî dareke ne li hewa şîn hat û bê reh û ax û av bû. Me got ku Cizîrî, Feqiyê Teyran, Eliyê Herîrî; Yaqûb Beg, Şemseddînê Exlatî û yên berî wan ku em wan

nas nakin, bingeha wêjeyeke Kurdîziman danîn. Te qala bikaranîna navê Kurdistanê di helbestên Cizîrî de kir, ev tiştêkî balkêş e. Bi texmîn çar caran navê Kurdistanê di qesîdeyên Cizîrî de derbas dibe. Li ba Xanî ev nav nîn e! Yanî Xaniyê kezebşewitî ji bo welat û milletê xwe navê welatê xwe derbasî nav berhemên xwe nekiriye! Lê Cizîrî yê ku bêtir meyla wî bi ser işqeke ilahî ve bû û mijara welat û civakê li ba wî belkî di dereca sêyem de bû, gelek caran navê welatê xwe yê şêrîn û bi gelek payedarî û serbilindî bi kar anîye? Ez dibêjim ku Xanî milletê xwe kiribû doza xwe ya esasî, loma jî ne bi hewce bû ku navê welatê xwe bîne ziman. Lê Cizîrî di rêya bikaranîna navê Kurdistan re xwestiye milletperwerî û niştimanparêziya xwe bide xuyakirin.

Em dizanin ku ziman firax û amana ku hizr û xeyal û bîr û bawerî û hafîze û mêjûya milletekî di xwe de diguncîne û diparêze. Bêyî zimanê netewî milletek nikare hebûna xwe bîne cih. Bêyî zimanê netewî milletek nikare xwe ji windabûnê biparêze. Loma jî ez dibînim ku Cizîrî û hevalên xwe yên pêşeng bingeh ji fikreke netewî re danîn. Ziman esasî ye û tenê nivîsandina bi kurdî ji aliyê Cizîrî ve Kurdayetiya wî zelal dike. Yanî dema ez niha bi kurdî dinivîsim, tu bi kurdî dinivîsî û ew jî bi kurdî dinivîse, em kurdîtiya xwe tînin ziman û bi awayekî ji awayan zimanê xwe diparêzin. Ji nifşên pêşerojê re pak û delal pêşkêş dikin. Ev jî renga milletperwerî ye. Lê weke te got hêj li ba Cizîrî fikra netewî qenc nestewiyabû, nekemmilî bû. Sebebên vê jî min di cihekî din de şirove kiriye. Ez dibêjim ku Cizîrî di mîrnûşîniyeke aram, serbixwe û Kurdîziman de jiyan dikir loma ne hewce bû ku bi qasî Xanî biqîre û jankêşiyê bide xuyakirin. Bazara kurmancî li Cizîra Botan di rewacê de bû, lê di dema Xanî de û li Bazîdê ne wisa bû, nakokiyên di navbera mîrnûşîniya Bazîdê û waliyên Osmaniyan de, hema bibêje ku Bazîdê bîndestê Osmaniyan bû, loma jî fikra netewî zelaltir û tekûztir e, li ba Xanî.

Pirs:

17. *Evîndariya Melayê Cizîrî jî ji xalên binîqas e. Behsa dostayetiya Cizîrî û Mîr Şerefxanê*

*duhem dibe ku di nav wan de evîneke
niştîmanperwerane hebû, ji bo vê evîna
çendşîroveyî ku behsa wê dibe tu çi dibêjî, ev
evîn çendî konkîret û beşerî û çendî jî Xwedayî
û esmanî ye?*

Bersîv:

17. Ji jiyana Cîzîrî û Xanî mirov dibîne ku desthelatdarên zemanê xwe, em bêjin qirnê navê yên Kurd qîmetekî têra xwe mezin dane şair, alim û zanayên Kurd. Ji vê awurê heger mirov rewşa wê rojê û ya îro berhev bike, ev tiradîsyon di nav desthelatdarên Kurd de çendî hatiye parastin û çendî li gora dem û qonaxê ye?

Ez bi xwe ne wisa dibînim. Erê belkî desthiladarên Kurd yên li Cîzîra Botan piştgirî dabin wêjeyê û şairan , Cîzîrî mînakekek baş e, lê li Bazîdê ne wisa bû. Ma ew gilî û gazinên Xanî hemû çi bûn û ji ku hatin? Wî her gazinên mîr kiriye û gotiye ku wî guh nedaye min:

Ew rehmetê xasse bo ewam e

Lew xassê nezer ji dil neda me

û di dirêjiya Mem û Zînê de û heta di piraniya helbestên Xanî de gazina mîran tê kirin:

Mîrê meclis nekenit mutribê goya çi bikit?

Xanî di helbesteke xwe de vê pirs dike, yanî ku mîr nekene dengbêjê çi karibe bike, bi gotineke din: ku mîr xwe nede ber min û projeya min, ez Xanî şairê reben çi karim bikim? Li ba Cîzîrî ne wisa ye, gazinê ji xelkê dike Cîzîrî!!!! Ji xelkên dema xwe nerazî ye. Ji têkiliya wan ya bi wêjeyê re nerazî ye. Ew dibêje: werin helbestên min bixwînin û dev ji Şîrazî berdin. Ango werin kurdî bixwînin, ev çi farisî ye we berê xwe hemûyan dayê?? Bi gotineke din Cîzîrî ji mîrên dema xwe razî ye û mîr jî qusûrê naxinê û piştgiriye didin wêje û wêjekarên Kurd. Lê civak bêsewad e û nezanî pirr e, loma jî Cîzîrî dibêje:

Xaliba ehlê zemanê me Mela Ademîyin?

Venumayin ji kerê mey reş û gayê te yî beş!!

Eger em rabin rewşa îro û doh bidin ber hev. Em dibînin ku desthilatdariya Kurdî (Partî, Sazî, medya) weke ku divê bikin, nakin. Yanî ji dil tu piştgiriye nadin zanîne. Desthilatdarî dikare guherînen mezin bike. Ev yek mîna zagonekê ye, ku desthilatdar çawa be, xelk jî wisa ne. Projeyên mezin ne bi destê kesekî du kesan naçe serî. Ezê mînakekê bidim, ji bo me Kurdan, ji bo zimanê me û wêjeya me gelekî pêwîst e, em şaheserên cîhanî ji zimanên wan wergerînin kurdî, yanî berhemên Şekspîr, Tolstoy, Servantes, Markîz û nizamî hîn kî divê bi kurdî hebin û em wan ne di rêya zimanekî sêyem re bixwînin. Wisa mejiyê me yê Kurdî saxlem ava dibe. Bala xwe bidê çîrokên hezar û yekşevê kengî bi firensî wergerandin? Sala 1704 an!! Lê me hîn ew berhem bi kurdî wernegerandiye. Ez dikarim wergerînim lê divê kesek piştgiriye bide min, yekî din jî dikare nizamî kîjanê berhemê wergerîne ew jî wisa! Ev li hêla wêjeyê, îca em werin beşên zanîne, tîbbê, matematîk, fîzîk û felsefeyê, ji xwe em şerm dikin ku bibêjin me gawek avêtiye! Erê dikarî bibêjî ku imkan hindikin, rast e, lê dilxwazî hebe wê ne wisa be. Hema em gavên ewil bavêjin, bila ew gav kinik bin jî, lê me nêzîktirî rastiyê dikin, me nêzîktirî mukemmeliyê dikin. Niha li aliyekî welatê me mixabin desthilatdar bi civandina mal û milkê dunyayê biliyane, loma jî xelk mîna wan dikin.

Ev guherîn û pêşketinên di wêjeyê de jî ne ku bi saya wan dibe, na lê dilxwazên ku agirê evîna zimanê kurdî di dilê wan de geş e û vêketiye hene, serbazên wînda û nenas yên bi şev û roj xwe dane ber parastina ziman û kultur û wêjeya kurdî hene ku hayê wan ji tiştêkî nîn e û ne li hêviya tu xelat û padaşê ne.

Piştgiriya desthilatdarên Kurd ji wêjeyê re bi du gotinan û daxuyaniyekê nabe. Stratejiyê mezin li ser her mijar û di her qadê de divê. Pîlan divên û divê ku (nan di destê nêpêj de be). Heta niha min nedîtiye ne bihîstiye ku saziyekê, partiyekê stratejiyê wergerê daniye ber xwe. Wisa tek û tûk nab e. Çiqas imkan û derfetên min hebin jî nikarim mîna

saziyekê tev bigerim. Divê renesans dest pê bibe. Dereng e êdî. Divê şoreşa wêjeyê dest pê bibe û bazara xwendina bi kurdî were damezrandin, yan na di asoyan de tiştêkî bi ronî nabînim.

Pirs:

19. Fikreke wuha heye ku di zimanê Cîzîrî de zêdetir erebî û di yê Xanî de jî bandora farisî bi nisbet erebî serdestir e. Egerên vê çi ne, gelo ji ber ku Cîzîrî zêdetir di bin giraniya hestên melatîyê de nivîsiye û bervaja jî Xanî di bin bandêra felsefê, siyaset û niştîmanperweriyê de nivîsandiye. Rêje û jîsediya zimanên farisî û erebî di berhemên herduwan de?

Bersîv:

19. Li ba herduyan rêjeya peyvên biyanî (erebî, farisî) gelek e. Ez dikarim bibêjim ku ji sedî pêncî derbas dike, dibe ku li hinek deveran bigihê ji sedî heftê jî. Bi taybetî li ba Xanî ku mecbûrî bikaranîna peyvên biyanî bûye xasma dema ku mijar bûye mijareke tesewwufî yan felsefî yan jî dînî. Di kurdî de alternatîfên wan peyvên nehatibû dîtin. Ew mecbûr bû peyvên orîjînal bikar bîne, wek çawa niha em peyvên latînî û ji ferhenga ewropîyan bikar tînin. Hinek rexneyan li Cîzîrî û Xanî û xeyrî wan dîkin, ez ji bo wan dibêjim: ka we piştî 400 salî çi karibû li wan zêde bikira? ka we alternatîfên gotinên wan yê biyanî dîtine! We heta kîjan radeyê hewl daye ku ferhenga xwe zengîn bikin? Tenê rexneyên bêtam her kes dikare bike.

Lê ew iddiaya ku dibêje li ba Xanî farisî û li ba Cîzîrî jî erebî bêtir e, balkêş e, divê mirov lêkolînekê bike û peyvên biyanî li ba herduyan bihejmêre. Bêguman dê encamekê bidest bixîne. Hema ez dikarim bibêjim ku zimanê Cîzîrî bi piranî paktir xuya dike.

Pirs:

20. Malbata Cizîrî, dê û bavên wî jî bi niqaş in. Gotin heye ku navê bavê wî Şêx Mihemed e. Belê kîjan Mihemed. Ev Mihemed jî binecîhên Cizîrê ye, jî dereke din hatiye, ku wuha be ev der ku ye, baş û zelal naye zanîn. Li gora dîtinekê bavê Cizîrî jî Xoşaba Wanê ye. Em van rewşên di nav heftûheştîyê, wihayî û newihayîyê de karin hê jî zêde bikin. Wek nimûne ku Cizîrî berî serê xwe deyne û here ser dilovaniya xwe, jî Cizîrê çûye, çûbe, çûye ku û Hwd. Tu çi dibêjî ?

Bersîv:

20. Hinek lêkolîner dibêjin ku navê bavê wî Mela Mihemmed e û jî êşîreta Buhtiyân e ku bi sedê salan li Cizîrê man e. Mela Mihemed jî alimekî Cizîrê bû. Navê bavê Cizîrî jî cara yekem li ba Elaeddînê Secadî wisa hatibû. Mixanbin Seccadî jî hîç jêderan ji bo agahiyên ku ew bi dest dixê yan jî belav dike û diweşîne nade, îcar mirov nizane ka ew tişt rastî ne yan jî ji xeyalê wî ne. Di nerîna min de û li gor pîvanên zanistî ewleyî bi agahiyên Seccadî nabe. Mixabin tu kesî jînameya Cizîrî nenivîsîye. Wî bi xwe jî tu agahî li ser jiyana xwe û binemala xwe nedane. Jînenigarî li ba Kurdan nebûbû hunereke nivîsandinê. Di gel ku ew gelekî girîng e jî û vaye niha mîna te got em nikarin ji nav heftûheştan derkevin, lê dîsa jî Kurdan jînenigarî nikaribû bikirana hunereke serbixwe ku bi rêya wê jiyana navdarên me dihate parastin û rêya lêkolînan li ber me hêsan û bêkelem dibû. Ev girêdayî mejiyekî şaristanî ye ku em bi hacetî wî bûn.

Ez bi xwe mesela hatina wan ji Xoşabê dûr dibînim. Ji ber ku leqeba Mela Cizîrî ye, berê jî wek em dizanin kesên zana û şairan xwe bi bajarên xwe didane naskirin. Eger bapîrê wî jî ji Xoşabê hatibûya wê navê wî Xoşabî bûya. Navê bajêr her mîna leqebekê dimîne ku ew dide xuyakirin binemal û koka yekî ji ku ye. Mesela Ibnul Esîr Elcezerî, jî navê xwe xuya dike ku ji Cizîrê ye û heta ew sax bû navê wî wisa ma di gel ku nema li Cizîrê dima jî. Yanî dikarim bibêjim ku Melayê Cizîrî jî bav û kalên xwe de Cizîrî ye. Cizîrî li gor agahiyên tevaya lêkolîneran her li Cizîra Botan maye heta roja dawî di

jiyana xwe de, ji xwe gora wî jî hîn li wir e û ziyareta evîndaran û xelkê ye. Ew dê li welatê kurmancan li pey zanîne geriyabe, dê meletî jî kiribe, lê li gor ku di helbestên wî de kifş e, wî piraniya jiyana xwe li cizîrê buhurandiye.

Pirs:

21. Bi rastî dîtinên corecore û hevnegir di derbara Cizîrî de, ferq û cihêyîyên wuha mezin di nav van dîtinan de mirov dide fikirandin, hêrs dike û ne kêman jî, çend tiştan tîne bîra mirov: Rewşa lêkolîneriya me tirajîk e. Rewşenbîr û lêkolînerên me bêxem, tembel, tirale û zêde ne bimesûliyet in. Heger ne wuha bûya wê çawa bi salan qîma xwe bi tevlihevî û kaoseke wuha bianîna, yan na, tu dibê em neheq in?

Bersiv:

21. Pirseke bingehîn e û gelekî pêwîst e. Lêkolînerî li ba xelkê ilmekî bi serê xwe ye, li ba me Kurdan amatorî ye. Lêkolînerî bi qaide û zagon e, her kes nikare were jiyana Cizîrî zelal bike. Sal û demeke pir û sebr û saman jê re divê. Berî her tiştî jî piştgirî û jiyaneke rihet ji bo kesê lêkolîner divê.

Ez te qet neheq nabînim di vê pirsê de. Rast e em tirale ne û tenbel in. Me qîma xwe bi çend agahiyên çewt yên Eladdîn Seccadî anîye û em li ser wan agahiyan(razan) e û dicûn û hey dicûn. Xew bi me xweş hatiye. Seccadî dibêje:

Cizîrî kesekî wiha bû ku rû û dêmên wî spî û sor bûn, bejin zirav bû, çavên wî geş û birqonekî bûn, birhên wî reş û kevanî bûn, pozê wî kurt bû!!

Ne bes weha heta behsa cilên wî û rengê cilên wî jî dike!! Heyran ev lêkolînerîye!! Yan ev xewn û xeyal in. Ma çima em xwe li ser van nerastiyan bêdeng dikin û nabêjin ku lêkolîn ne wisa ne? Mamoste Hejar jî vê pirsê me dike û ecêb dimîne ku Eladîn Seccadî ev agahiyên wisa ecêb ji ku anîne?

Hejar dibêje: kes nebû ji Secadî re bibêje, qurban tu yê ku nizanî Cizîrî di sed sala şeşan yan ya nehan de jiyaye, tu çawa dizanî ku çox û ranikê wî çi reng bûn??

Heta niha ku em behsa kevnên xwe dikin, ku em lêkolînan li ser pêşengên xwe dinivîsin, em hema hema çîrokan dibêjin. Bi dehê caran û di gelek berheman de em rastî çîrokên mîna Cizîrî û pîra nanpêj, Feqê Teyran û ava Dicle, Cizîrî û nameyên ji Selmayê re, tên. Em heta niha çîrokan û rastiyên dîrokê ji hev dernaxin. Helbet dê li ser kesekî mîna Cizîrî gelek çîrok û serpehatî li ser zimanê xelkê geriyabin, lê ew nabin palpiştekan ji bo lêkolîneke zanistî. Mixabin em di lêkolîneriya xwe de jî çîrokbêj in.

Pirs:

22- Di derbara jiyana Melayê Cizîrî de Ferhad Şakelî sê kategoriyan destnîşan dike:

1. Beşê ewil ew kes in ku bi bahweriya wan Melayê Cizîrî li dora salên 1200 jiyaye. Ji bo vê jî îspat bikin hewil didin û dixwazin kesekî bi navê Îmadedîn pêde bikin û bêjin ku Melayê Cizîrî hemzeman û hewtemenê wî bû. Ne şert e ev rast be.

2. Beşek jî ku Elaedîn Secadî li serê wan tê, dibêjin ku Melayê Cizîrî di zemanê şairê mezin yê Faris Evdirehmanê Camî de jiyaye. Ji ber ku Camî di kitêbeke xwe de behsa sefereke xwe dike ku ji Iran ber bi Hîcazê di ser Kurdistanê, di ser Cizîrê re bûye. Di beyteke helbesta xwe de behsa kalemêrekî bi navê Elcezîrî dike. Yanî kalemêrekî xelkê Cizîrê. Li gora Elaedîn Secadî ev kalemêrê behsa wî tê kirin Melayê Cizîrî ye. Û ji ber vê û di vê çarçewê de jî divê Cizîrî li dora salên 1400 î jiyabe. Dibe ku ev kalemêrê hebe, ji bo ku hebe jî sebeb hene. Lê ev xwiyaye dibêje Şakelî ku ev kes ne ew Cizîrî ye ku em nas dikin û dîwana wî di destên me de ye. Dibe ku berî Cizîriyê navdar bi heman navê şairê din jî hebûbin ku ji bo ku hebin jî sebeb zehf in û ev jî maqûl e ku bi navê bajêr têne nas kirin. Tiradisyonê xwe bi navê bajarê

xwe, herêm û navçeya xwe, ya jî gundê xwe binaskirin û ji xwe re wek paşnav bikaranîn adetek bû û di vê derbarê de jî bi dehan nimûne hene di destên me de. Mesele Seîdê Nûrsî, Şêx Evdirehmanê Axtepî. Mele Evdilahê Tîmoqî..

3. Beşê sisyan Zivîngî û Mekenzî û kesên din in ku jiyana Cizîrî nivîsandine dibêjin: “ ez jî bi vê dîtinê re me “ dibêje Ferhad Şakelî. Li gora vê dîtinê ne mimkun e ku Cizîrî berî Hafîz û Berî Camî hatibe, Cizîrî gelekî piştî wan e. Em karin bêjin teqrîben 1570-1640

Bersîv:

22. Ez jî bi beşê sêyem re me. Ji xwe yên ku dibêjin Cizîrî li dora salên 1200 jiyaye gelekî dûrî rastiya dîrokê diçin. Hemû delîl dibêjin ku Cizîrî di navbera nivê dawî ji sedsala 16an û nivê yekem ji sedsala 17an de jiyaye. Mîr Emadînê ku ew lê digerin jî sedî sed piştî Şerefîxanê Bedlîsî û kitêba wî Şerefname(1005 koçî) hukumdariya Cizîrê kiriye. Beşê duyem jî ku dibêjin Camî û Cizîrî hemzemanê hev bûn xwe disipêrin delîlekî gelekî qels û lawaz ew jî beytek ji helbesteke Evdirehman Camî ye ku dibêje:

Pîremerdî bi dîdeem zi Cizîr

Nîmemerdî bi dîdeem zi Herîr!!

Ev beyta farisî dibêje: min kalemêrek ji Cizîrê dît û yekî navser jî ji Herîrê dît!!

Îca nizanîm ka çawa Secadî dizane ku ew kalemêr Melayê Cizîrî ye: Gelo li Kurdistanê wê demê tenê yek kalemêr hebû ku leqeba wî Cizîrî bû ? Û Camî di helbesta xwe de çima wisa xumamî dibêje û beyan nake ka ew çi kalemêr e!! ev iddia ya Seccadî li ba min pûç û bê bingehe e. Tarîxa ku te destnîşankiriye jî hinekî nêzîkî rastiye ye. Cizîrî li gor lêkolîna Tehsîn Ibrahîmê Doskî di sala 1567/1568ê zayînî ji dayik bûye. Ew di vê iddiayê de xwe disipêre beyteke Cizîrî ku dibêje:

***Ji Herfa Mah û Salê ma
Nehat der Şeklê Falê ma***

Ew li gor hesabê ebcedê tîpên (Herf, Mah, Sal, Şekl, Fal) bi hev re û li gor elifbêya erebî kom dike û di encamê de hijmara 975 pê re derdikeve ku ev jî sala jidayikbûna wî li gor tarîxa koçî ye.

Piars:

23- Di nav xelkê de li ser Cizîrî gelek çîrok û efsane çêbûne. Ev jî li gora nêzîkayî û dûraya ji erd û axa Cizîrî û coğrafya rabûn û rûniştina wî, cihê manewerya wî têne guhertin Hun dikarin behsa hinekan ji wan bikin?

Bersîv:

23. Erê. Ezê hinek çîrokên li ser Cizîrî bibêjim, lê hêvî dikim ku ew ne mîna bîngeheke zanistî werin pejirandin, ji bo naskirina Cizîrî. Ev tenê çîrok in û cihê wan di lêkolînan de divê nebin.

Min ji rehmetiya diya xwe (ku bavê wê yanî kalkê min ji aliyê Cizîrê bû) gelek çîrok li ser Cizîrî, evîna wî feqetiya wî û dîwana wî bihîstine. Ezê li vir çendekan ji wan bînim ziman û li ber destê we raxînim.

Li ser destpêka evîna Cizîrî û Selmayê diya min ev çîrok digot:

Rojeke îne bû, hîn Melayê Cizîrî li Medresa sor feqetî dikir. Hemû feqe derketibûn geşt û seyranê, li rexê Dicleyê. Cizîrî nexweş bû, loma bi hevalên xwe re neçûbû û li hucreyê mabû. Di nav nivînan de bû û lihêfek kişandibû serê xwe. Xûşka mîr Selmayê û cêriyên koşkê çûne camiyê. Selmayê dixwest here ji xwe re li şûna feqeyan binêre û bibîne ka ew çawa dijîn. Rabûn û rûniştina wan çawaye? Wê ev yek gelekî meraq dikir. Dema ku çûne hucreyê dîtin vaye yek di nav nivînan de ye. Selma ber bi wî de çû û lihêf ji ser rakir. Cizîrî çavên xwe vekirin ku vaye keçeke gelekî ciwan û spehî di ser serê wî re ye. Dema li rûyê wê nihêrî roniyek di nav herdu birhan de dît. Selma bi lez ji hucreyê derket û ji wê gavê de agirê işqê di dilê Cizîrî de vêket. Hema wê rojê dest bi

helbestan kir û helbesta xwe:

***Di dest da yengiyek nûbare min dî ew keman ebrû
Li bala cedwelek cebbare têda hemqiran ebrû.***

Çîrokeke din girêdayî vê çîrokê diya min tim ji min re digot: Piştî ku Cîzîrî bûbû aşîqekî sewdanser, diçû rexê çem û name ji Selmayê re dinivîsandin. Piştî ku name diqedand, ew dikirin mîna lûleyan û dixist hundirê zil û qamîşan û bi ava çem de berdidan. Avê ew name digihandin nêzîkî koşkê û cariyeyên Selmayê ew ji wê re dianîn. Cîzîrî ava çem kiribû posteçî û teterek (bi Erebi Berîd) loma jî di helbesteke xwe de ku nîv erebî ye weha dibêje:

Biddua bellix tehiyyatî li Selma ya berîd

Yanî: ey posteçî, bi duayan silavên min bigihîne Selmayê!!

Her weha diya min behsa helbestvaniya wî fikir û digot: Lawo ma yekî wek Cîzîrî tenê ev dîwan li pê xwe hiştiye? Na na wî pêncî dîwan nivîsibûn, lê piştî ku bîn bi evîna wî û Selmayê ket û xelkên Cîzîrê qala wê evîne kirin, Mîr lê hat xezebê û xwest her pêncî dîwanên wî bişewitîne. Melayek li wir hebû gelekî kêfa wî ji Cîzîrî re dihat û li ber wan dîwanan diket. Rabû ji mîr re got: Ez xulam ka ez dîwanekê bibim mal û binêrim bê ka vî Cîzîrî çi heqaret tê de kiriye! Mîr destûr dayê lê gotê berî banga sibê divê tu dîwanê vegeerî ku em wê jî bişewitînin. Mela radibe di wê şevê de dest pê dîwana Cîzîrî nesix dîke û bi xeta destê xwe dîwanekê ji ber digire û li mala xwe vedişêre. Berî banga sibê dîwana ku wî biribû dîsa vedigerîne û dibêje mîr: Mîrim bişewitîne tiştekî hêja tê de nîne. Û bi wî awayî ev dîwana ku niha di nav destê xelkê de ye, hate parastin.

Hin jî dibêjin ku Cîzîrî sed dîwan nivîsîne lê melaiketên Xwedê nod û neh dîwan ji erdê rakirin û yek tenê ji me re hiştin!!

Ji xwe çîroka wî û wê pîra nanpêj jî navdar e. Dibêjin Cîzîrî dihat beranberî koşka Dilbera xwe Selmayê rûdinişt û pala

xwe dida kevirêkî û dest bi qesîdexwendinê dikir. Piştî demekê radibû diçû. Agirê evînê di hinavê wî de ew dîwar disincirand, pîrekê jî bala xwe dabûyê û dihat nanê xwe li ser wî dîwarî dipeht û dipêja.

Ev çîrok bêguman bingehên wan hene. Ku di jiyana Cizîrî de nebin ew bingeh, di helbestên wî de hene. Mesela dîwarê sincirî bawer dikim ji vê beytê hatiye. Cizîrî di qesîdeyêke xwe de dibêje:

Ji ber ahên mi dinê agir û dû bit ne eceb

Min di dil de heye narek(arek) ku disojit seqerê!

Yanî eger dunya hemî bibe dû û dûman ne tiştêkî seyr e, ji ber ku di hinavê min de agirek heye, dogehê jî dişewitîne.

Piras:

24- Tê gotin ku di helbestên Melê de muzîkeke wuha heye ku xelk kare zû ji ber bike. Belê ji bo Xanî û helbestên wî mirov nikare heman tiştî bêje.

Bersîv:

24. Rast e. Mûzîkeke gelekî rewan û herikbar û ji guhan re minasib heye. Cizîrî wezn û kêşeyên erebî yên sivik û xweş bi kar anîne. Ji wan kêşeyan bêtir xuyaye ku kêfa Cizîrî ji Remel re(bi her cûre û rengên xwe) hatiye ku wezna wê ya bingehîn wisa ye:

failatun failatun failat

Her weha Cizîrî Hezec jî bi kar anîye. Hezec bi xwe wezneke gelekî mûzîkî ye. Hema dikarî bibêjî ku piraniya stranan pê tene ristin. Ew jî wisa ye:

Mefa-îlun mefa-îlun

Bi kurtî, Cizîrî mûzîkeke gelekî nerm û milayim bikar aniye. Loma jî qesîdeyên wî zû tene jiberkirin(ezberkirin) û di dil de dimînin. Ji bilî wê mûzîka derveyî, wî mûzîka di nava helbestê de jî bikaranîye, yanî harmoniya hundurîn ya peyvan û cumleyên helbestî. Mînak ev beyta gelekî ciwan:

Nesîmê sinbil û sêvan seher da hebs û zindanê

Vebû qufla me bê mifte, ziringînî ji quflê da

Eger bala xwe bidê, ew di para yekem de behsa hatina yarê di çaxê seherê de dike, ango piştî nîvê şevê yar hatiye serdana wî di zindanê de, de îca tîpên S di vê nîvmalikê de çend in? Pênc in û tu Z jî lê zêde bikî şeş tîpên ku bi serê xwe mûzîkeke wan ya taybet heye ku dibe nîşana qewimîna tiştêkî di tariyê de û bi dizî, di beşê duyem de bala xwe bidê bê çi qewimî? Mifte li quflê ket, û deriyê hesin vebû! Eger yekî ne Kurd be jî bibihîze wê zanibe ku tiştêkî bi deng û qerebalix diqewime(ziringînî ji quflê da). Dengê hesinan ji van gotinan nayê bihîstin? Ji ber vê jî helbestên wî ji guh re gelekî xweş hatine û ew zû bi zû xwe berdidin nava mirovan.

Lê te qala mûzîka helbestên Xanî kir. Ez bi xwe yek ji hezkiriyên Xanî me û min lêkolînên berfireh di helbesta wî de çêkirne û nivîsîne. Xanî ne kêrî Cîzîrî ye di bikaranîna mûzîkeke rewan de, lê tenê evîndariya wî ya di helbestan de ne mîna ya Cîzîrî balkêş e. Ya Cîzîrî evîneke pirr bi şewat ku ji tecrubeyeke rastîn û diltezîn hatiye ji xwendevanan ve xuya dibe.

Li ba Cîzîrî mûzîka derve û hundur hevdu dikemmilînin. Harmoniyek xurt ava dikin û mirov mecbûrî guhdarîkirinê dikin. Li ba me, pismamê bavê min Evdiyê Kurimî hebû, qesîdebêjekî mezin bû. Ku helbesteke Cîzîrî di şevên zivistanê de dixwend hema bêje agir bi dîwaran diket û emên guhdar li ber dengê wî û xurtiya helbestên Cîzîrî şê û serxweş û teles dibûn. Bêhemdî me qêrîn bi me diket û bi rastî jî em bi cizbê diketin. Ev jî razeke ji razên helbesta Cîzîrî. Ji kûraniya dil derketine û rasterast xwe li kûraniya dilan digirin.

Pirs:

25. Ji awura naverok û tesewufê em helbestên Cîzîrî û Xanî bidin ber hev. Ferq çawa ye? Em hinekî ji awura huner, ziman û metafor, dîmen û tabloyan wî û Xanî nîqaş bikin.

Bersîv:

25. Ez bi xwe, di gel ku mirîdê Xanî me, Cizîrî şairtir dibînim. Peyvên Cizîrî, hûnandina hevokên wî, xeyalê wî, û fikreyên wî gelekî cuda ne. Zimanê Cizîrî jî zelaltir e. Qesîdeyên wî rihet in, ne mîna yên Xanî bi kompleks in. Heta peyvên erebî yên ku Cizîrî di şî'ra xwe de bi kar anîne, ji zû de derbasî ferhenga Kurdî bûne û kedî bûne û êdî nema biyanî xuya dikin. Ji rexê Tesewwufê ve herdu jî nêzîkî hev in, herduyan jî kûzikên xwe ji kaniya Wehdetulwucûdê dagirtine û ava wê ya çêjdar vexwarine, heta ku pê serxweş bûne. Tesewwufa herduyan jî wijdanî ye. Bi evîneke Xwedayî rengîn dibe. Tesewwufa wan ji tesewwufa Hafîzê Şîrazî, Ibnulfarîzê Misrî ye. Hin qesîdeyên herduyan hene ku di nav sînore Tesewwufa xwerû de ne, yanî tenê tesewwufa irfanî ku mîna felsefeyeke serbixwe ye. Di vir de bandora Ibnu Erebbî û Hellac heye. Mîna qesîdeya Xanî ku tê de dibêje:

Ey ayîneyê dil bi cemala te mucella

Sed sefhe bi yek zerre ji nûra te mutella

Û ya Cizîrî ku *هه و النامه كئيبي* tê de dibêje:

Tûr im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez

Atesperesê nûr û tecellayim ez

Eger mirov qenc bala xwe bidê, dibîne ku Cizîrî di tesewwufa irfanî de bi gelek gavan di pêşiya Xanî de ye, ango bi cesaret tir e. Û li ba wî Wehdetulwucûd wek felsefeyekê zelaltir e. Hema li ba Xanî Wehdetulşuhûd gelekî zelal e. Wehdetulwucûd ji xwe dibêje di hebûnê de tenê hebûna Xwedê heye, em jî û her tişt pareyek ji vê hebûnê ne. Ne ji derveyî wê ne. Wehdetulşuhûd dibêje, ku hebûn hemî neynik û mirêka hebûna Xwedê ye. Ew ne pareyek jê ne lê meziniya wî di wan re xuya dibe.

Diyar e li ba herduyan di pirsê Iblîs de cudatî hene. Xanî dibêje ku vîn û iradeya Xwedê nehişt Iblîs here secde ji Adem re û her weha ecêb dimîne ku çima Xwedê wisa lanet lê barandine, bêyî ku sûc û gunehê wî hebe. Lê Cizîrî vê yekê bi nezaniya Iblîs ve girê dide û dibêje; eger Iblîs sîrrê ilmê Xwedayî di Adem de dîtibûya dê bêguman secde bûbûya!

Mesela dîmen û tabloyên hunerî ku Xanî û Cizîrî digihîne hev jî wisa dikarin şirove bikim: herdu kilasîkên me jî ji yek ekola helbestî derketine. Ekola belaxet û rewanbêjiya erebî ya ku di helbesta farisî de bi cih bûbû. Herdu jî sûretên wan dubarekirî ne ji sûret û wêneyên di helbesta farisî de. Yanî em bala xwe didinê ku eynî tabloyê li ser devê gelek şairan hatiye gerandin. Awirên çavan li ba Hafîzê Şîrazî jî, li ba Firdewsî jî tîr in, û li ba Xanî û Cizîrî jî tîr in! Di vir de em dikarin bêtir Cizîrî û Hafîzê Şîrazî bidin ber hev û gelek mînanan bînin û şopên bandora Hafîz li ser Cizîrî bipên.

Pirs:

26. Ferhad Şakelî tê zanîn ku bi kêmanî 14-15 salan li ser Cizîrî xebitiye û bi awayekî kategorîk û bê virde û wêde “ Hîç şika min nîne ku Cizîrî di serdema Mîr Şerefîxan de jiyaye ku desthelatdarê Cizîrê ye û Cizîrî helbestên pesindar ji bo wî nivîsandine, dibêje.....

Bersîv:

26. Di dîwana Cizîrî de navê Mîr Şeref derbas dibe:

Xef wan reşandin dil xedeng, teşbîhê tîrên Xan Şeref

Lê ji vê malikê em nikarin wê rastiya ku Şakelî wê ya tesbît dike heta dawiyê qebûl bikin. Nav û dengê mîr Şeref li tevaya Kurdistanê belav bûbû. Ji xwe Şerefîxanê Bedlîsî jî di Şerefnameya xwe de bi ferehî qala wî dike û bi pesindarî jî. Îca eger Cizîrî di helbestê de awirên yara xwe bişibîhne tîrên Xan Şeref nayê wê wateyê ku Cizîrî di dema wî de bû (em ji bîr nekin du mîr Şeref hebûn). Ev tabloyekî hunerî ye, wezîfeyê wê ya helbestî heye. Lê di dîwanê de musaceleya (guftûgoya helbestî) Mîr Emadîn û Melayê Cizîrî heye. Di wê de Cizîrî dibêje:

Xulamê mîr Emadîn im.

Çima em vê nakin delîl û nabêjin ku Cizîrî di dema mîr Imdeddîn de bû. Mumkin e jî Cizîrî di dema du sê mîran de jiya be û ew herdu helbestên pesindariyê ne ji mîr Emadîn re

nivîsî bin. Lê ev hewceyî lêkolînekê ye. Wisa rihet û sivik bersiva wê nikarim bidim.

Pirs:

27. Her nivîs û berhem bi aliyekî xwe jî şahidekî zeman û qonaxa xwe ye. Dema mirov dixwîne li ser heyam û serdema tê de ji dayik bûye mirov digihê hinek encaman. Ev jî bi kêrî dîroknasan, biyografînanan ji faktorên alîkar hesêb dibin. Ji vê eniyê dema mirov li Cizîrî û xebata wî bikole bûyerek, navek, destnîşankirinek bibe mûmek di reşayê de heye?

Bersîv:

27. Bêguman gelek mûm hene. Ji xwe lêkolînerên ku dibêjin Cizîrî di navbera salên 1570/1640 de jiyaye, xwe disipêrin helbestên wî. Mesela di helbesteke xwe de sê navên dîrokî tîne ziman:

*Sef sef me dîn Hindî û Zeng, Cengizî hat Teymûrê Leng
Xef wan reşandin dil xedeng, teşbîhê tîrên Xan Şeref*

Ew li vir behsa Cengîzخانê meşhûr dike ku di navbera salên 1165 û 1227 de jiyaye. Her weha behsa Teymûrê leng jî dike ku ji sala 1336 heta 1405 an jiyaye. Ji xwe di dawiya vê malikê de jî navê Mîr Şerefê Kurd mîrê Cizîra Botan û temamê welatê Botan dike. Mîr Şeref jî li gor belgeyên dîrokî û di nav de Şerefname, dibe ku yek ji herdu mîr şerefan be, yek ji wan mîr Şeref kurê Bedir kurê Brahîm e ku ji sala 1498an heta sala 1509an hukumdariya Cizîrê dikir. Yê din jî mîr Şeref kurê Xan Evdal e ku di dema nivîsandina Şerefnameyê de hîn hukumdariya Cizîrê dikir û Şerexan gelekî pesnê wî daye. Ew hevçaxê Cizîrî bû jî. Her weha min di bersiveke berê de jî qala lêkolîneke birêz Tehsîn Brahîm ê Doskî kiribû ku wî têde sala jidayikbûna Cizîrî eşkere kiriye. Gava em van belgeyan didin ber hev, hinekî mesele ronî dibe û bi gotina te mûm li dora me gelek dibin û reşayê jihev tar û mar dikin!

Pirs:

28. Cizîrî sofî ye. Dîtineke wuha heye ku sofîyên

*mezin li cîh û derekê zêde nedisekinîn, digeriyan?
Em zanin ku sofîyên navdar di nav Xoresan, Iraq,
Kurdistan, Şam û Konya de, di nav paytextên
rojhilata Navîn de çûne û hatine. Nûmeyên
Mewlana, Şemsê Tebrîzî û Hwd tene zanîn. Carna
seferên wan bi rojan û bi mehan dewam dikir. Hin
cîh hebûn ji wan re “Rikin” yan jî mîna îro jî li
Kurdistanê ji wan re “Xaneqa” tê gotin, hebûn. Ev
cîh cihên sekna mêvanan û şiklek otêlên îro bûn.
Mirov li gerên wuha rast tê, di jiyana Cîzîrî de?*

Bersîv:

28. Erê. Yek ji şeweyên (sulûka) sofîyan guhertina cih e. Ew nabe li cihekî bimînin. Di baweriya min de sofîyên mezin yê ku terîqet damezirandine, ji bo ku (irşadê=rêberiyê) bikin, diviyabû ji welatekî biçin yekî din. Mirîdan pîrr bikin û (heqîqetê=rastiyê) belav bikin. Cîzîrî, herçendî sofî bû jî, lê ne ew yekê ku evdal û dewrêş bû, sofîtiya wî sofîtiyeke teorîk bû, ew di pratîkê de sofî nexuyaye. Hin nakokî di jiyana wî de xuya dikin, li hev nakin kîtekîten jiyana wî. Mesela yekcaran mîna Xeyyam xuya dike û dibêje ku ev dunya ne hêja ye, loma jî divê mirov xwe ji lezzeta tê de bêpar neke û zû bi zû meyweyên kêfxweşiyê biçine:

*Talih ku têt û firset, muhlet li nig heram e
Min umrê Nûh-i nîne, wer saqîyo bi lez xweş!!*

Ev malik sedî sed ji bêrika Xeyyam derketiye, û bêtir nêzîkî felsefeya Ebîqorî ya yewnanî ye ku dibêje mirov divê xweşiyên li xwe nebe.

Ew weha jî dibêje:

*Ahî eyyemên wisalê, weh ku xweş borîn û çûn
Ew şeraba êşî û noşî, ma li pêşber min serab.*

Ew di vir de li rojên xwe yê berê ku ew bi yarê re buhurandibûn re digirî, dibêje ew gelekî xweş buhurîn, lê çi heyf ku hemû çû û wek rewrek û leylanê êdî xuya dibe.

Lê li cihekî din jî dibêje:

***Minnet ji Xwedayê ku bi evdê xwe Melayê
Îksîrê xemê işqê, ne dînar û drem da!!***

Li vir êdî yekî terkedunya ye, xwe disipêre evîna Xwedayî û ne xema wî ye, xweşiyên dunyayê.

Pirs:

***29. Ji gotinên tene gotin yeke din jî ev e ku Cizîrî şî`rên
Hafîz ji bo xwe kirine bingeh û helbestên xwe avakirine.
Helbestên Sadî jî wuha kirine. Cizîrî vê vekirî û heşkere
dike û venaşêre. Girêdayê vî aliyê Cizîrî jî behsa “Texmîsê”
dibe. Ev Texmîs çi ye?***

Bersîv:

29. Texmîs ji peyva erebî(Xemse) yanî hijmara Pênc hatiye. Texmîs yanî pênckirin. Ev jî şêweyek ji hunerên helbesta klasîk e, ku şairek helbesta yekî berî xwe yan hemdemê xwe diecibîne û li ser wê tamam dike. Ango sê rêzan dinivîse û du rêzên dawî jî yên helbestvanê din in weke xwe dimînin. Mesela di qesîdeya pêşîn ya di dîwana Cizîrî de her paragrafek ji qesîdeyê pênc rêz in, sê rêzên pêşîn yên Cizîrî ne û du rêzên paşîn yên Hafîzê Şîrazî ne. Min bi xwe helbesteke Cizîrî da pênckirin ew jî ev e:

***Bûye salek ez dinalim ji şevê ta sibehê
Min berê xwe daye Botana di nava Diclehê
Ez bi vê bangê meha xwe digihînim bi mehê:
Ey nesîmê seherê ma di mecala sibehê
Sed silavan bigihîne ji me wê padişehê!***

Di vir de hersê rêzên pêşîn min ristine, yên dawî jî ji qesîdeya Cizîrî ne.

Di vir de helbestvanê ku helbesta yekî(texmîs) dike dixwaze çi bîne ziman û çi mesajê bide? Helbet ew dixwaze bibêje: binêrin, ez jî mîna vî helbestvanê mezin dikarim birêsim. Ez ne kêmî wî me, bi eynî muxeyyile û melzemeyên wî yên ziman, bi eynî ferhengê û bi eynî şêweyê rêzkirina peyvan û mûzîka derve helbestê çê dikim!!! De ka binêrin bê hûn karin malikên min û yên wî ji hev veqetînin û nas bikin, ka kîjan yên min in û kîjan yên wî ne?

Hafîz û Sadî yên Şîrazî bûne bingeha sedan şairên piştî xwe. Hafîz ekolek bi serê xwe bû. Cizîrî jî yek ji şagirt û suxteyên zîrek yên vê êkolê bû ku di sefa yekemîn de cih girtibû. Gava em navekî yan leqebekê li Cizîrî bikin em dikarin bibêjin:

Hafîzê Kurd yan Şîrazî yê Kurdan!

Min bi xwe bandora Hafîz di helbesta Cizîrî de şopandiye, û bala xwe dayê ku Cizîrî heta di hin wêneyên xwe yên helbestî de malikên Hafîz wergerandine û kirasekî kurmancî li wan kiriye. Hema wî ew wêne ji nava helbestên hafîz anîne û li nav yên xwe danîne.

Pirs:

30- Belê carên ku wuha jî dibêje hene: Dev ji Hafîz û Sadî berdin, werin min bixwînin. Em li vê çawa binerin, hem tu di bin bandêra kesekî, çend kesan de mabî, di avûbayeke wuha de pênuşa xwe bikar anîbî û di ber re jî tu bêjî werin dev ji wan berdin, ez nêzîktir im, serketîtir im. Ya ku van rêzan bi Cizîrî dide gotin çî ye ? Bahweriya bi xwe ye, yan jî biçûk be jî tov û meyleke neteweyî ye ?

Bersîv.

30. Ev jî pirseke gelekî girîng e. Divê em şopa neteweparêziya di civaka Kurdan de biajon da ku raza vê meyla li ba Cizîrî nas bikin. Di baweriyên min de Cizîra Botan di deverekê de ye, Mîna Bazîdê, ku netewe lê gelek in. Pîrbûna neteweyan li herêmekê yan cografîyayekê dihêle ku her neteweyek bêtir bi hebûna xwe bihese. Yanî li Bazîdê Tirk, Faris, Azerî, Gurcî, Ermen û Rûs jî hebûn, (mebest li wê herême ne li bajêr bi xwe) û helbet nakokî jî hebûn, vê yekê tovê neteweparêziya Ehmedê Xanî geştir kir û hişt ew tov zûtir şîn bibin. Li Botan jî wisa bû. Asûrî, Suryan û Ereb, Tirk û Kurd hebûn. Helbet Faris jî bi wêjeya xwe û carcaran bi artêşên xwe yên giran jî hazir bûn. Îca Cizîrî mîna temsîlker û nûnerê rewşenbîrên wê dema xwe dê berî her kesî bi xwe û neteweya xwe hest bibe. Wî dema ku digot dev ji

Hafiz berdin, û werin helbestên min bixwînin, dixwest bibêje werin li zimanê kurdî xwedî derkevin. Werin bi neteweya xwe di rêya zimanê xwe re bihesin. Ew gelekî bi xwe bawer bû, heta di helbesteke xwe de dibêje:

Pîrê şe'aare di şî`rê, û Mela şalfîroş

Tu nîşan min mede Ferxî, ku li nik min bûye ferx

Yanî: mela pîrê helbestê yê, Şalfîroş e, de ji min re behsa Ferxî neke, ji ber ku ew li ber min mîna fêrîkekî biçûk e.

Eger em zanibin ku Ferxî(Ferruxî) yê helbestvan e û leqeba wî Melikulkelam e (yanî şahê gotinê) dê zanibin bi heta kîjan radeyê Cizîrî bi xwe û zimanê xwe û netewa xwe bawer bû.

Te pirsra wê yekê jî kiriye ku ka gelo çima Cizîrî dixwaze (şopê ji ser mamosteyên xwe dagerîne) û winda bike? Çima naxwaze kesek êdî biçe ser wê kaniya ku wî bi xwe têra xwe ava zelal jê vexwariye? Ev yek di bawerîya min de du sebebên wê hene. Yek jê: tiştêkî ku di rexneyê de nav lê dibe: kuştina bav di wêjeyê de, ango tu naxwazî şopê ji serkaniyên xwe re bihêlî. Tu wan tunne dikî û tenê xwe berz dikî. Ev girêdayî psîkolojiya hunermend û afrêneran e. Her dixwazin xwe bidin pêş. Sebebê duyem ji vê yekê re ew e ku Cizîrî wê diyardeyê rexne dike, ew diyardeya xwendina wêjeya farisî û heta nivîsandina bi farisî jî ku Cizîrî jî bi xwe yek ji kesên ku di nav wêjeya farisî de mabû. Îcar ew dibêje werin em guh bidin zimanê xwe û ji xwe jî çêtir nabîne di vî warî de. Ew bi xwe jî dizane bê çi nivîsiye û çiqas helbestên wî xurt û bihêz in. Hinekî rastiya helbesta xwe jî dibêje. Ji her kesî bêtir dizane bê ka çendî helbesta wî xurt e.

Pirs:

31. “Ez ewqas sal in li ser Cizîrî kar dikim ez heta niha neghiştîme qeneetekê ku Cizîrî helbestek ji bo kesekî, ferdekî yan jî ji bo jinekê gotibe. Li cîhekî bi tenê tiştêk heye ku hinekî îmkan dide ku mirov bêje ew dildarî, fizîkî ye, eşqeke ji bo însên e. Bi bahwerîya min giş evîna Cizîrî Xwedayîye û pêwendîya wê bi eşqa fizîkî û insanî re tune ye.” dibêje Şakelî, tiştêkî tu lê zêde û kêmbikî heye, yan jî

tu jî bi heman rengî difikirî?

Bersîv

30. Na ez di vê baweriyê de ne bi Ferhad Şakelî re me. Şakelî dixwaze ku Cîzîrî ne hissî be, di evîna xwe de, ne ku Cîzîrî bi rastî ne hissî ye. Xwestin û rastî di lêkolînan de li hev nakin. Erê guman nîne ku Cîzîrî şairekî mutesewwif bû û stûnek ji stûnên mezhebê işqa ilahî(evîna Xwedayî) bû, lê ev nabe bend li ber evîneke fîzîkî. Ji xwe heta di wêjeya tesewwufê de tê naskirin ku evînên fîzîkî bingehên evîna Xwedayî ne. Mesela Ibnu Erebî ku yek ji mezintirîn mutesewwifên Îslamê ye û mamosteyê ekola Wehdetulwucûd e, di destpêka xwe de dilketiyê keça Mamosteyê xwe yê li Hicazê ye. Bi xwe jî di pêşgotîna dîwana xwe de (Tercuman Eleşwaq) dibêje ku ew aşîqê keçekê bû û ewqase helbest di pesnê wê û evîndariya xwe û wê de ristine û hûnandine. Di helbesta Cîzîrî de em şopa hissiyetê dipên mîna van hersê malikên ku tê de evîneke xwerû fîzîkî xuya dike:

Veke lêvê û ji nîvê, biwerîn qend û nebat
Ji lebê le'lê şeker bêj û, ji şekker meke behs

**

Da binoşim mey ji lêvê, mawera reyhan û sêvê
Luluyên şekkir di nîvê, abê heywan çeşme ye

**

Sotin û derdê evînê, illetê dax û birînê
Xweş dibin ma ew bi dînê? Şerbeta lêvan mufa ye

Ew qala lêvan û şekirê lêvan û şerbet û şêraniya wan dike. Ev gumanê nahêle ku Cîzîrî li vir qala evîneke insanî dike. Ew dilketiyê keçekê ye. Keçeke ji goşt û hestî. Lê dibe ku ew keç tenê di xeyalê Cîzîrî de hebûye. Ev ne qada me ya ku em têde lêkolîna xwe li dar dixin. Tiştê ku inkar nabe jî Cîzîrî gelek helbestên ku bi zahirê xwe ve li ser evîneke fîzîkî xuyane ristine, lê ew bi derûn û batinê xwe ve li ser evîna Xwedayî ne. Dildar tê de Xwedê bi xwe ye. Yan na ma ew kîjan dilber e ku birhên wê mihrabê nimêjê ne û secde lazim e li ber

herdu birhên wê!

Di ilmê tesewwufê de gelek caran min xwendiyê ku şikestina di evîneke hissî de yekî bal bi evîna Xwedayî ve dikişîne, ev jî li ba Cizîrî tê qebûlîkirin, dibe ku wî tu encam ji evîna xwe û yara xwe nedîtibe û berê xwe dabe evîna rûhanî.

Pirs:

32. Di axaftinên li der û dora jiyana Cizîrî, yan jî em bêjin hinek tiştên ku di nav feqîyan û gel de digerin navê xanimêkê bi navê Selma derbas dibe. Hinek dibêjin Selma xwuşka mîr yan jî keça wî ye. Li gora hinan jî Selma şewesemboleke tesewîfiyane ye. Li gora hizrekê jî ji xwe navekî wuha qet tune, ev jî bi tenê yek ji wan çîrokên bêesil e ku hina ji xwe re li hev aniye, navekî xeyalî ye. Çi rast e û çî na, rastî ji ba te çawa dixwiye?

Bersîv:

32. Li ba min û li gor xwendina min ya ji helbestên farisî û erebî yên klasîk re, navên ku derbas dibin navin xeyalî ne. Yareke taybet nîn e ku şair navê wê bibêje. Şairên di ast û mertebeya Xanî, Cizîrî, Hafîz, Sadî û Ibnul Farîz û Ibn Erebi de xwe nizim nakin û navê yara xwe ya rastîn nabêjin. Ji ber ku ferqa evîna wan û ya yekî mîna Mecnûn ferqeke mezin e. Mecnûnê Amirî di helbestên xwe de bi dehan car navê Leylaya xwe dibêje. Ji xwe evîna wî ew e Leyla tenê ye. Lê evîna van kesên navborî evîneke rûhanî ye, Xwedayî ye. Erê ew mecbûr dibin navan bikar tînin. Mecbûr dibin ji ferhenga wêjeyê peyvên xwe bînin û bi kirasekî hissî bipêçin û li evîna xwe ya giyanî bikin.

Em werin ser navê Selma. Ew ne navekî rastîn e, û ew iddiayên ku dibêjin Selma xûşka mîr bû û nizanî çî, hemû ji xeyalê xelkê hatiye. Selma di helbestên berê de yên ereb û farisan de jî derbas dibe. Hafîzê Şîrazî dibêje:

*Suleyma munzû hellet bil iraqî
Ulaqî min hewaha ma ulaqî!*

Suleyma nazikkirina navê Selma ye!

Ev navê Selma jî navê ku ereban ji beriya Îslamê de û heta di dema Îslamê de û piştî wê jî bêtir bikar aniye. Ew navê numre yek e di helbesta erebî de. Navekî sivik e û xweş e, loma jî her şairî navê yara xwe ya xeyalî kiriye Selma. Wateya Selma jî ew e keçika bêqusûr û bê eyb.

Tiştê balkêş li ba Cîzîrî ew e ku wî carekê tenê navê Selmayê bikar aniye, ew jî di nîvmailkeke bi erebî de, îcar ev nîvmalik ya wî be yan jî ya helbestvanekî din be? Ev jî cihê niqaşekê ye. Li ser vê jî em nikarin rastiyan ava bikin. Em nikarin bibêjin ku bêguman yareke wî hebû navê wê Selma bû û Mela dilketibûyê. Ji xwe hin dibêjin ku navê yara wî Sitiya Biskkesk bû! ev bêtir ji xeyalê xelkê hatine. Ne rastiyan ku encama lêkolînekek bi rêk û pêk in.

Cîzîrî navekî din jî bikaranyie wek navê yara xwe lê kesî bala xwe nedayê. Ew behsa Leylayê jî dike û dibêje:

*Lew heriftim ez ji meylê
Şubhetê sehlê ji seylê
Mehbet û îşqa di Leylê
Ez kirim yekser pilox!*

هه و النامه

Li vir ez dikarim tefsîr û şiroveyekê ji van dîtinan re bidim. Yanî dikarim bibêjim ku çima li ba xelkê ev hizr û bawerî peyda bûye ku yara Cîzîrî dotmîrek e û navê wê Selma ye. Cîzîrî ku behsa yara xwe dike, wê ne mîna keçeke ji rêzê dibîne, ew tim wê li nav qesr û koşkan dibîne, dûrî wê ye, destê wî nagihê û wê mîna şahjinekê dibîne. Desthilatdar e yara wî, her kes nikare wê bibîne, di birc û qesrên bilind de ye. Bi nêrîneke kurt li van mînanan emê tê bigihin bê çima ev dîtin hatiye holê:

*Can û dilê min ew e, horîweşê min ew e
Padîşehê min ew e, ez li derê wê geda*

**

*Min dîlberek wek dur heye, mehbûbe şêrîn sur heye
Husn û cemalek pir heye, Belqîs sifet mesken Seba*

Belqîs şajina yemenî ye ku Suleymanê pêximber pêre zewicî bû. Li gor kitêbên pîroz wek Quran û Tewratê ew Xwedan desthilatdariyeke mezin bû!!

**

*Çi heddê sed hezar can bin, di fitraka hebîba min
Ku sed Cimşîd û Keyxusro, xulam in ser di vê rê da*

Ev çî yar e ku Keyxwesrew û Cemşîd xulamê wê bin!

**

*Min divê ser li asîtanê, her wekî tûlan nihim
Belkî carek keyl bipirsit, ev çî mehrûm tûle ye!*

Ango ew dixwaze serê xwe li ber asitanê wê deyne, dibe ku ew şaha mezin bipirse ev çî segê mehrûm e!

Û bi sedan mînakên ji vî rengî hene ku nîşaneke eşkere tê de heye yara Cizîrî yareke ji malmezinan e û bi xwe jî yan şahjineke yan jî dotmîreke!! Lê rastiya vê çî ye? Em nizanin. Dibe ku ji xeyalên şairî bin kî çî zane! Şair dilê xwe dibijînin her kesî û her tiştî.

Pirs.

33. Em hinekî din li ser vî navê bisekinin. Ev jî heye ku hinek şairên din jî heman nav, anga navê Selma bi kar anîne. Kî ne ev şair gelo, mimkune tu ji me re nimûneyekê duduwan bidî?

Bersîv:

33. Erê. Dikarim hin nimûne bidim lê ji cîhana helbesta erebî.

Beriya Îslamê şairek heye navê wî Imruul Qeys e, navdartirîn şairê Ereba ye heta niha. Helbestvanê serdema Îslamê Nabixayê Ce`dî, û yên dema piştî ku Îslam berfireh bû Cerîr, Beşar Bin Burd ê esilfarisî ku dibêje:

ew zemanê ku min û Selmayê digihîne hev

zemanekî qencyê dike!

Û bi dehan xeyrî wan jî.

Ji xwe bala xwe bide vê helbestê ku yekî ereb beriya çend sed salan li ser Selmayekê nivîsiye!:

Min ji Xwedê xwest ku min û Selmayê bigihîne hev, ma ne Xwedê her tiştî dike!!

Û min jê xwest wê li ser piştê bike û min bavêje ser, û çî bixwaze bixe ku bixwaze

Û bila yek bê û min tev bide bi hêdîka mîna ku meşk tê tevdan

Pişt re ewrekî bi baran were û barana wî me bişo.

Pirs:

34. Xwendina Cîzîrî jî bideng e, tê naskirin û têra xwe belabûye. Dibêjin dikete silûkê, dikete xewlê. Mesela “xewil” û “silûkê” îro jî heye. Li mizgeftên mezin mirov dikare lê rast bê. Pirsên me wuha ne: yek ev xewl û silûk çî ye, ya duhem hinek agehdarî li ser vî aliyê Cîzîrî tu bidî me, wê bikêr be, jî ber ku têkiliya xewlê û hîlbijartina murşidekî ji xwe re heye yan na?

هه و النامه ی کتیب

Bersîv:

34. Xewl yan jî bi erebî Xelwe/Xelwet: mana bi tenê û dûrî xelkê ye. Silûk jî buhurîna di rêyekê de ye. Lê ev herdu peyv li ser destên Mutesewwifan wateyin nû bi dest xistin. Ji qalibê xwe yê ferhengî û yê zimanî derketin û qalibekî din standin. Xelwe bû wek şêwe sporeke rûhanî ku divê kesê sofî tê de meşqan bistîne. Cegerxwîn dibêje:

Di kuncê xelwet im yareb!

Xanî dibêje:

***Zahidê xelwetnuşîn pabendê kirdarê xwe ye
Tacirê rihletguzîn dildarê dînarê xwe ye***

Cîzîrî dibêje:

***Sofiyê xelwenuşîn, bêne sicûd
Her du birhên te ne, mihrabê dua***

Dîsa dibêje:

*Seyyahê me dîn di xelwe îro
Ellah ku çî xelwe û çî seyyah*

Û dibêje:

*Pê li ser dîdeyên Melê dayîn
Xelweya sofîyan munewwer ke.*

Di van herçar mînanan de tim peyva Xelwe bi peyva Sofî ve hatiye girêdan, ango êdî sofî û xelwe bûne du peyvên hevê ku bêyî hev nabin. Sofî bê xelwe nabe û xelwe jî bê sofî nabe.

Peyva Sulûk yan jî Silûk wek min destnîşan kir buhurîna di rêyekê de ye, lê sofîyan ev peyv ji xwe re birin û navê rêya teswwufê kirin Silûk. Dibêjin filankes di silûkê de ye, yan jî silûkê dike, ango rêya sofîtiyê hilbijartiye û dest bi perestiyekê kiriye ku armanc jê paqijkirina ruhe û nêzîkbûna li Xwedê ye. Îca ji wî sofîyî re jî, yê ku di silûkê de ye. 'Salik' tê gotin.

Cizîrî di helbesteke xwe de wisa dibêje:

Te pir cewr û cefa dîne, silûk û se`y û cehdê da

Helbet silûk û xelwe dê gelek zehmetî tê de hebin, dê birçîbûn hebe, dê bêxewî û tenêtî hebe û dê gelek fikirandin û ramana di Xwedê û gerdûnê de hebe, heta ku kesê di silûkê de karibe hinekî nêzîkî rastiye bibe.

Lê em werin ser tecrubeya Cizîrî, gelo ew di tecrubeyeke tesewwufî re derbas bûye yan na? Em nizanin! Sedî sed belge li ba me nîn in, ji helbestên wî em dikarin bibêjin ku ekola wî tesewwuf bû û bi wehdetulwucûd bawer bû. Lê mumkin e, ketibe silûkê, silûka ku mirîd dikevinê. Yanî silûkek ji ya din ferq dike, silûkek heye ez bi xwe jî beşdarî wê bûme, hinek xwendina quranê ye, toba li ber destê şêxekî ye (şêxê min Xeznewî bû) û çavgirtinên piştî nimêja mexribê û zikrê Xwedê ye. Lê ne bi giraniya silûka mezin e ku ne her kes dikare bike.

Pirs:

*35. Em dê carcaran Xanî û Cizîrî bi hev re bipirsin.
Xanî bi siyasetê xwurt û kûr daketiye. Tiştêkî ku ji*

bo pêdaketina Cizîrî bi siyasetê, em bêjin, dewlet, rêveberî, desthelatdarî û Hwd.bibe pêjneke, tê hiskirin?

Bersîv:

Eger jêderê me dîwana wî be, em tu pêjneke diyar nabînin. Lê em tê digihin ku Cizîrî ne dûrî desthilatdariya kurdî bû. Ne dûrî mîr bû. Û wa diyar e ku qedrekî wî yê bilind jî hebû. Lê wî qet di helbestên xwe de derdekî millet ne aniye zimên. Dibe ku di jiyana xwe de mijûliya wî bi siyasetê re hebûye. Lê di wêjeya wî de tu şop nîne.

Pirs:

36. Cîzîrînas dibêjin ku Mela li du yan jî sê cîhan behsa navê Kurdistan bi kar aniye. Duaya Cizîrî navdar e ku dixwaze ne bi tenê Cizîr belê Tebrîz û gelek cîhên din jî têkevin bin destên Mîr. Vê Fikrê jî mîna gelek fikrên din mîna ku Xanî ji Cizîrî girtibe û ew li gora zeman û qonaxê derxistibe asta hewcedariya bi yekîti û tifaqê. Li vir jî bêhn û pêjneke neteweyî, em neteweyî nebêjin jî, etnîsîteyî tune gelo? Ev ne hestekî zelal û vekiriye ji bo niştîmaperweriyê? Dixwaze Mîrê Kurdistan bibe şahê çar iklîman. Gelo Xanî gotina “Rom û Ereb û Ecem bi temamî.....hemyan ji me re fikir xulamî”hêza xwe ne ji vir girtibe, ne berê vî tovî be ku Cizîrî avêtiye erda welatparêziyê?

Bersîv:

36. Cizîrî Kurd bû. Ne tenê bi etnîka xwe Kurd bû, lê ew bi fikra xwe û zimanê xwe jî Kurd bû. Tenê nivîsnadina bi kurdî nîşana kurdayetiyê ye. Yanî tercîha wî ji bo nivîsandinê zimanê wî yê kurdî bû. Wî bi renekî zelal jî gotiye: Werin helbestên min bixwînin û hacet we bi Şîrazî nîne. Bi maneyeke din: werin bi kurdî bixwînin û dev ji farisî berdin.

Helbet rola wî di vexistin û geşkirina fikra netewî û kurdayetiyê de li ba Xanî mezin e. Wî rê dûz kir, derî li piştê vekir û bawerî bi zimanê kurdî çêkir. Kurdayetî ne tenê

slogan û helwesteke xuya ye. Ew berî her tiştî avakirina mejiyekî tevayî û giştî ye ji bo civakê tevî. Cizîrî jî binika mejiyekî ku bi kurdî difikire danî. Ew gelekî bi eşq jî navê Kurdistanê tîne ziman. Wî çar caran navê Kurdistanê aniye:

Di cara yekem de dibêje:

***Tenha ne Kurdistan didin, Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin, ji Espehan têtin xerac***

Di cara duyem de dibêje:

***Ney tenê Tebrêz û Kurdistan li ber hukmê te bî
Sed wekî Şahê Xurasanê di ferwarê te bî***

Di cara sêyem de dibêje:

***Bi tebilexaneê şahî were text
Ku tu îro şehê Kurdistan î***

Di cara çarem de jî dibêje:

***Gulê Baxê Îremê Buhtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im***

Pirs:

37. Di nav helbestên Cizîrî de du helbest hene ku ji wan re “mukaleme” tê gotin, yanî bi hev re qisekirin, hevpeyvîn. Carekê bi Mîr Îmadedîn re û carekê jî bi Feqiyê Teyran re qise kiriye. Bi Ingilîzî dibêjin korespondens. Ev ne destpêka pexşanê be?

Bersîv:

37. Na. Tu təkiliya wan herdu mukalemeyan bi pexşanê re nîne. Ew şeweyekî ji helbestê ye û li ser bingeha wezn û qafiye û sistema şirî ava bûye. Piştî wê bi sed salî pexşanê nû dest pê kir, pexşan li ser destê Mele Mehmûdê Bayezîdî hate meydanê.

Pirs:

38. Em hinekî li ser cîhê Cizîrî bisekinin. Cizîra kevn û kesk. Cizîra Botan kevnabajarekî Kurdistanê ye, paytextekî siyasî ye. Li dora 400-500 salan navenda rewşenbîrî û alimiya Kurdistan e. Medresên navdar li vir in. Şagirtên jîr û bikêrhatî berê xwe

didan vir û alimên navdar pîrr tiştan qerzdarê Cizîra Botan in. Ev xweserî û taybetmendiya Cizîrê di aliyê dîrokê de çawa çêbû gelo?

Bersîv:

38. Cizîra Botan di tarîxa erebî de jî navdar e. Li wir dîrokzanê herî navdar Ibnul Esîr ElCezerî yê ku di çaxê Selaheddînê Eyyûbî de bû hatiye dinê. Li wir medreseyên dînî hebûn. Mîrnuşîniyeke serbixwe hebû. Loma jî bazara zanînê di rewacê de bû. Piştî şerê Çaldêranê êdî Kurdistana Bakur hinek aramî dît û mecal ji danîna bingehên wêjeyê re vebû. Belgeyên dîrokê jî diyar dikin ku mîrên Cizîrê kesin edebdost bûn û guh didan wêjevan û şairan. Ji xwe em hemû dizanin ku neslê mîrên azîzan zarok û neviyên Bedirxan paşayê mezin çi ji bo ziman û wêje û tarîxa Kurdan pêşkêş kirine. Helbet ev yek ji tradisoynên malbata mîrên Cizîrê bû ku her û her piştgirên edeb û wêjeyê bûn û di baregahên wan de şair û edîb bi qedr û nirxdar bûn. Zaravayê Botan jî bi gumana min roleke xwe ya erênî lîst. Ew zaravayekî serketî bû û hezkirî xuya dikir. Zaravayekî medenî bû jî. Tesîra xwe li derdorê kir û êdî ew cih bû qibleya xwendevan û feqeyan.

Pirs:

39. Em bi çend gotinan jî şairên hevdemên Cizîrî ne, binav bikin. Evdirehman Mizûrî du navan dide; yek Feqiyê Teyran, duhem jî Şemsedînê Exlatî, kesekî din heye, têkiliyên Cizîrî bi hemdemên xwe re?

Bersîv:

39. Tiştê ku birêz Mizûrî dibêje rast in. Nikarim tu agahiyên nû lê zêde bikim. Dikarim bibêjim ku di navbera Feqî û Mela de têkilî hebû û hevdu dîtibûn. Lê Qutbê Exlatî û Cizîrî! Nizanim. Tu agahî nîn in ku wan hevdu dîtiye. Lê ez bawer im ku wan dê helbestên hev dîtibin û xwendibin. Şebekeya meletî û ilm û feqetiyê li Kurdistanê dişibihî ya internetê ya hemdem. Haya wan ji hev hebû. Hîn jî wisa ye. Melayekî li Qersê yekî li Nisêbînê jî nas dike. Bavê min gelek Melayên

Serxetî(ji Kurdistana bakur) nas dikirin û dostên wî bûn, heta melayên Serhedî jî nas dikirin!

Pirs:

40. Rewşa helbestê di serdema Cizîrî de. Mizûrî bi van gotinan dîtî xwe dibêje: “Di vê serdemê de helbesta kurdî li ser destê Cizîrî germ û gurr e. Vê sedsalê li ser destê M. Cizîrî hêzeke nû, vejîneke nû daye helbesta kurdî” dibêje.

Bersîv:

40. Rast e. Helbesta kurdî ya ku Cizîrî nûnerê wê ye, helbesteke mukemmel e, bêqisur e. Û gihaya dawiya xwe. Lê ev pirsekê li ba mirov diafirîne: Gelo kanîn û kî ne yên berî wî! Ma hema wilo Cizîrî ji nişkê ve hilpekiya yan kesin berî wî hebûn û rê li ber wî û nifşên hevçaxê wî vekirin? J i ku ne ew gelo? Çima dîwanên wan winda bûn! Dema mirov bala xwe dide helbesta Cizîrî qenc tê digihîje ku ew li ser bingehekî xurt û piştî tecrubeyeke kûr û dûr û dirêj û sîqalkirineke mezin ji zimanê nivîsnadinê re peyda bûye. Ango Cizîrî û hevçaxên xwe ne kesên ewil bûn ku dest avêtine helbestê. Helbet beriya wan hene. Lê em bêagahî ne, ji vî alî de.

Pirs:

41. Li gora Ferhad Şakelî li ba Kurdan hinek qalib çêbûne ku çî dema gotin tê ser xwendin û tehsîla navdarekî Kurd, gotineke ku pirr dubare dibe û ewqas jî ne ilmî ye, berçav dibe. Ew jî ew e ku “dersên ewil li ba bavê xwe xwendine”. Ev çima wuha ye, ji ber çî ev hesangirî?

Bersîv:

41. Min jî dersên ewil li ba rehetiyê bavê xwe xwendine. Serf û rêzimana erebî, Quran û Hedîs û Mentîq û Fiqih hemû min li ber destê bavê xwe yê mele xwendiyê. Mesela ku dibêjin Xanî yan Melayê Cizîrî dersên ewil li ba bavê xwe xwendine, eger bê belge û delîl be jî, tiştêkî mentîqî ye. Ne dûrî rastiyê ye, ji ber ku meletî hema hema bêje li Kurdistanê wiraset e, yanî kur ji bav wedigire. Bavê mele kurên wî jî

mele ne. Bi taybetî kesên meşhûr ku medrese ava dikirin û suxteyên wan bi sedan bûn. Îcar berî her kesî zarokên xwe bi xwendin dikirin, mînaka me ya berbiçav jî malbata Birîvkanî li başûr û malbata Axtepî li bakur in. Kalkê min ê mele şeş heb kurên wî mele bûn, tenê yek ji meletiyê(filitî)!

Pirs:

42. Felsefeya Wehdetulwucûd di helbestên Cîzîrî de. Çi ye ev felsefe, çend nimûne ji otorîteyên wê?

Bersîv:

42. wehdetulwucûd peyveke erebî ye, wergera wê: Yekbûna hebûnê ye. Yanî hebûn yek e û ev piraniya ku em dibînin yanî piraniya mexlûqat û afrîdeyan piraniyeke bi hijmarê ye, lê di rastiyê de tenê Xwedê heye! Ji ber vê yekê kesên bi vê felsefeyê bawer in, dibêjin ku Xwedê di her kainat û afrîdeyên xwe de diyar e. Madem ku wilo ye mirov dikare perestiya Xwedê bi çî awayî be bike. Mesele misilman berê xwe didin qibleyê ku Kabeya pîroz li wir e, lê madem Xwedê li her derê ye û di her afrîdeyî de ye, ew dikarin berê xwe bidin kilîseyê û dêrê û heta laleşê jî. Dikarin berê xwe bidin rûyê mirovekî jî û perestiyê bikin. Gotineke wan heye, dibêjin dema ku Xwedê di zatê xwe de ramiya û bi ser xwe de ponijî, ev hebûna em dibînin çêbû. Felsefeyeke dûr û dirêj û kûr e û gelek parêzerên şerîeta Îslamî ev felsefe mîna kufr û derketina ji dîn hesibandine. Ibn Erebi imamê vê felsefeyê bû û di rojavayîyan de li ba Spînoza diyare ku ew di bin bandora wê felsefeyê de bû. Li ba Cîzîrî jî di hin helbestên wî de xuya ye ku ew bi vê wehdetulwucûd bawer e, mesela di vê helbestê de:

Tûr im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez

Ateşperest û nûrê tecella yim ez

Barî ji "we ellem" ku xeberdarî kirin

Îro tu bizan Ademê esma yim ez

Herfên reqemê lewhê wucûda me bixwîn

Da qenc-i bibînê ku çî îmla yim ez!

Zahir tu perîşaniyê halê mi nebîn

Mecmû`ê di zatê xwe û tuxra yim ez

Alem çiye? i`rabû hurûf û kelîmat in

Ew nuqte di nefsa xwe û me`na yim ez

Sed Nîl û Ferat tîn û derin, qelbê me

Pê nahisihin qulzem û derya yim ez

Tu j`nuxxeyê tewhîd mexûn ayetê nefyê

Bê aletê îsbatê ku îlla yim ez

Di vir de Cizîrî sedî sed sofîyekî bi wehdetulwucûd bawer e, yanî ew him Adem e ku bavê mirovatiyê ye, him jî Mûsa ye ku di gel Xwedê axiviye, him jî bi xwe ew çiyayê Tûr e ku Mûsa li wir çav bi Xwedê û nûra wî ketiye. Ew dibêje ku dunya herf û peyv û gotin bin, ez bi xwe wateya wan im. Û bi rengî gelek mînakên din jî hene mirov dikare bi bêhnferêhî li wan vegere û bişopîne.

Pirs:

43. Em dê carcaran li pîrsa “evînê jî vegerin”. Evdirehman Durre ku yek ji kesên xwedî gotine li ser kilasîkên Kurdî, girêdayê “evînê” piştî bi xwe dipirse evîn çi ye?” Bersiva pîrsa xwe jî wuha dide: “Evîn ew e ku meriv ji tiştêkî hez bike, hemû tiştên xwe bide wî tiştî. Doza meriv, bahweriya meriv, dîn û îmanê xwe û heta ruh û bedena xwe jê re feda bike”. Ev jî hinekî nîqaşê, lêhûrbûn û lêkolînê naxwaze?

Bersîv:

43. Evîn bi xwe li ba mutesewufan merheleyek mezin e ji silûka tesewwufê. Beriya wê dibêjin Keşf heye, Muşahede yanî dîtin heye, Zewq(çêjkirin û tehmandin) heye û paşê evîn tê. Evîna sofîyan jî evîneke wijdanî ye ku armanca wê ne gihiştineke hissî û fîzîkî ya bi yarê re ye. Em di Mem û Zînê de jî dibînin bê çawa evîna Memo ji Zînê re rûyê xwe û rêya xwe diguhere, dema Memo di zindanê de dibe sofî. Ew êdî nema dixwaze dest bide rûyê Zînê, naxwaze zulfên wê bîn bike. Armanca wî êdî bi gelekî mezintir e, ji dîtin û gihiştina yarekê. Ew êdî ber bi Xwedê ve hildikişe. Evîna mecazî jî

heye, ew evîna ku em hemû wê nas dikin û tê re derbas bûne jî. Hezkirina keçekê ye. Yan xortekî. Û kişandina êş û azariyên wê û hestbûna bi xweşiyên wê jî. Leqeba Mensûrê Hellac ev e: Şehîdê işqa ilahî yanî: Kuştîyê evîna Xwedayî. Ev yek giraniya evîna tesewwufî dide xuyakirin. Rabia Edewî ku yek ji mezintirîn mutesewwufên jin e, di tarîxa Îslamê de dibêje, ji Xwedê re:

„Ez li gor du cûre evînan ji te hez dikim, evîna weke ya xelkê û evînekê ku tu hêjayî wê yî. Evîna weke ya xelkê ew e ku tenê tu di bala min de yî û evîna ku tu hêjayî wê yî, ew e ku tu perdeyan ji ber xwe rakî da ku te bibînim.“

Hellac dibêje: Evîn sifetek ji sifetên Xwedê ye. Her weha mutesewwuf hemî dibêjin ku têkiliya di navbera Xwedê û evdê wî de evîn e! Cîzîrî di helbesteke xwe de spasiya Xwedê dike ku wî tenê evîn kiriye para Cîzîrî, ne malê dunyayê:

Minnet ji Xwedayê ku bi ebdê xwe Melayê

Iksîrê xemê işqê, ne dînar û direm da! هه و الناسى كيتى

Ibn Erebi dibêje:

Evîn dîn û îmana min e!

Pirs:

44- Çend tesbît ji Evdirehman Dure: “Ol li ba Cîzîrî exlaq e. Dîwana Cîzîrî gerdeneke manewî û neteweyî ya edebî ye ji bo Kurdan”.

Bersîv:

44. Mesela olê li ba mutesewwufan hinekî cihê gumanê ye. Ew zêde zelal nakin ku olan qebûl nakin. Lê ji gotinên wan tê bêhnkirin ku zêde bawerîya wan bi olekê nayê. Olekê li ser ya din nabînin. Loma jî dualiya Şerîet û heqîqetê li ba wana heye. Mutesewwuf dibêjin Şerîet heye, ew jî dîn û baweriyên bi Xwedê û kitêb û pêximberên Xwedê ye. Û Heqîqet heye, ew jî rêya tesewwufê ye ku her kes nikare bide ser. Di navbera herduyan de jî Terîqet heye. Sofî dibêjin: şerîet weke gemiyê ye, terîqet jî behr e û heqîqet jî gewherên binê behrê ne.

Li ba wan yek dikare bê gemî jî xwe berde binê behrê û gewheran derîne. Cizîrî jî dibêje:

*Sergeşte me ji dêrê, naçim kenîşteê qet
Mihrahe wê bi min ra, wer da biçîne Laleş*

her weha ew dibêje:

*Hin ji nik dêrê ve tên qesda kiniştê hin dîkin
Ney ji van im ney ji wan im, min derê xemmar-i bes*

Li vir Cizîrî guh nade Ol û dîn. Li ba wî meyxane ji dêr û kiniştê pêwîsttir e (di rêyeke bi dizî re ji mizgeftê jî), helbet meyxane sembola tesewwufê û rêya wê ye. Yanî heqîqet e û dêr û kinişte jî temsîla şerîetê dîkin.

Pirs:

45. Hûnandina edebî xwurt e, berz e, li pêş e. Ev jî dîtina serdest e ji bo berhemên Cizîrî. Em vê hinekî vekin, ji hev veçirin, hinekî li ser kûr bibin, bi hinek nimûneyan biserûbertir, îknakiranetir bikin. Hûnandina xwurt, berzayî û lipêşbûn, yanî çi?

Bersîv:

45. Eger em peyvên erebî û farisî bidin aliyekî, yanî hebûna wan nekin kêmasiyeke mezin. Dê bibîn ku helbesta Kurdî wek cûreyek ji cûreyên wêjeyê li ser destê Cizîrî gihaye kemalê. Ew êdî li ser bîngehekî xurt rawestiyaye. Bûye wêjeyê bixwe bawer, bihêz û çêjdar û têrwate. Ji ber vê yekê jî Cizîrî mîna helbestvanekî, ji zimanê xwe yê Kurdî gelekî razî ye û bi hunera xwe gelekî bawer e. Êdî xwebînekî mezin e û asta xwe ne kêmî ya mezinên cîranan dibîne. Qet xwe kêmî Hafîzê Şîrazî nabîne, bi wateyeke din zimanê Kurdî kêmî zimanê farisî nabîne. Heta cesaret dike ku bibêje: Gotinên min, helbestên min mîna sihrê ne, mûcîze ne. Çawa Quran mûcîzeyê zimanê erebî ye, wisa jî helbestên min mûcîzeyê zimanê Kurdî ne.

De ka em li wî bi xwe guhdarî bikin bê ew çi dibêje:

*Şi'ra te Mela sihrê şekerrêz e bi mû`cîz
Zanim ji lebê le`lê, te ev lefz û eda girt*

Yanî ey mela helbesta te sihrmendiyeye ku şikir jê diriye, ew mûcizeyeke. Ev sihr jî ji wan lêvên sor hatiye wergirtin.

Di helbesteke din de jî dibêje:

***Husna edaya te Mela her kê dî
Sehhe lehû enneke eynul fisah***

Yanî: Her kesê ku ciwaniya helbestên te guhdarî kiribe, bawerî aniye ku tu serdarê rewanbêjan î.

Her weha di deverek din de dibêje:

***Di î`caza beyanê da suxen ger bête însafê
Dizanî muxteser herkes, Melê sihre îbaret kir.***

Yanî eger bi insaf were gotin, bi kurtî her kes dizane ku Mela di warê rewanbêjî û helbestê de û bi wan gotinên xwe sihibazeke!

Em mîna keke din jî bînin:

***Çi fesahet bi melahet, weh di dêrî tu Mela,
Ev edaya te di şî`rê weh şîrîn û bi nemek***

Yanî wey Mela çendî ciwan û xweşik û lihevhatî ne helbestên te!

Şiirbêjiya te jî çiqasî şêrîn û bi tam e!

Ew vê jî dibêje:

Di iqlîmê suxen mîr im, di şîrê da cîhangîr im

Bêguman xurtiya Melê ne tenê ji peyv û gotinên wî tê. Her weha ji fikr û bîr û bawerî û ramanên wî jî tê, ji mûzîka helbestên wî jî tê. Li ba min Melayê Cîzîrî bi çend qonaxan Hafîzê Şîrazî jî derbas kiriye. Mûzîka Hafîz nagihê ya Melê. Bi rastî li ba Melê sihreke nepenî heye, û sihra mûzîkê ya diyar û eşkere jî heye. Ev jî girêdayî zewqa mirov e, ku yek karibe zewqê ji şîira Melê bistîne, bêguman li ber bihîstina helbestên wî serxweş dibe.

Ez di kitêbeke helbestvanê Alman yê navdar **Goethe** de ku navê wê (*West-östlicher Divan*) e, li navê Nîşanî rast hatim.

Goethe bi gelek pesindarî behsa wî şairî dike û di helbesta xwe ya bi navê Xwendinname de dibêje:

*Ecêbtirtîn pirtûk pirtûka evînê bû ku min bi baldarî xwend
Hinek rûpel li ser xweşî û kêfa evîndaran in
Û gelek rûpel li ser jan û kula evînê ne
Beşê dûriyê para mezin biriye
Hevdîtina evîndaran beşê herî biçûk e
Ey Nîşanî, dawî te karibû rêya rast nîşan bida*

Min wê demê pirtûka xwe ya yekem di lêkolînê de amade dikir(Şiir we Şueraa), lê min newêrbû bigota ku Goethe behsa Cizîrî yê me dike. Niha gelek dibêjin ku mebesta Goethe ji Nîşanî Cizîrî yê Kurd bi xwe ye. Ji xwe em dizanin yek ji texellusên(leqebên şairî) yên Melayê Cizîrî, Nîşanî ye jî. Lê heta niha em nikarin bibêjin ku sedî sed Nîşanîyê ku şairê Alman behsa wî dike, Cizîrî yê me ye.

Min ev mînak anî li ser xurtiya Cizîrî, eger ew iddia rast be, dide xuyakirin ku nav û dengê Cizîrî sînoren Kurdistanê jî derbas kiribû.

Pirs

46. Jiyan û serpêhatiya Dîwana Melayê Cizîrî jî bi serê xwe hêjayê lêkolînekê ye. Ev dîwan çawa gihîşte serdema me. Ji bo vê em qerzdarê kê û ne kê ne? Li vir pişk û rola Kurd û ne Kurdan çi ye û di vê navê de kurt be jî em di çend gotinan de li ser wergerên Dîwanê dîtînen we bigrin.

Bersîv:

46. Erê rast e. Divê em kêfxweş û serbilind bin ku dîwaneke bi vê tam û çêjê gihaye berdestê me. Divê wêjehezên din jî wekî me Kurdan kêfxweş bin ku berhemek bi vî rengî ji windabûnê filitî û bû para mirovayetiye hemûyî. Li vir divê em spasdarê sîstema feqetiyê bin li Kurdistanê. Divê em spasdarê meleyan bin ku ew bûn pasvanên wêje û kultura me û ji windabûnê û qirkirin û şewatê parastin. Bi rastî ne ew bûna niha emê ji hêla wêjeyê ve gelekî xizan bûna.

Ji Kurdan wek tê zanîn, Mela Yehyayê Mizûrî(1772-1836)

helbesteke Cizîrî bi farisî wergerandibû û şirove kiribû, her weha dibêjin ku Mele Xelîlê Sêrtî jî xwestibû dîwanê şirove bike lê ew mîna barekî zêde giran dîtibû. Mîrê Amîdiyê Mihemed Teyyar Paşa jî nusxeyeke destxet li ba wî hebû ku sala 1815 hatibû nivîsîn. Li ba kalkê min Şêx Salih jî nusxeyeke kevn hebû, li Qahire çap bûbû. Ji kesên di destpêka sedsala bîstan de xwedîtî li dîwanê kirine, Mele Eliyê Findikî ye (1892-1967) ku wî hin şirove li ser dîwanê danîne. Hejarê nemir, Mele Ehmedê Zivingî, û Mele Ebdusselamê Cizîrî jî ev berhema Hêja şirove kirine. Tê gotin ku destxetê seydayê Cegerxwîn jî heye tê de dîwan şirove kiriye, Celaleddîn Yoyler jî beşdarê van xebatên hêja ye, Ebdurrehman Durre jî. Her weha ji biyaniyan û rojavayîyan navê Martin Hartmann (1851-1918) di serî de ye. Wî dîwana Cizîrî li Berlînê sala 1904 an çap kir. Bi navê: *Der Kurdische Diwan des Sheich Ahmed von Geziret Ibn 'Omar genannt Mala'i Giziri*.

(dîwana Kurdî ya şex Ehmedê ji Cizîra Ibn Umer-Cizîra Botan- ku bi navê Melayê Cizîrî meşhûr e).

Ji kesên ku li ser Cizîrî û dîwana wî xebitîne, Sadiq Behadîn Amîdî, Ferhad Şakelî, Melê Kurd, Xalid Mihemmed, her weha Jan Dost jî di kitêba xwe ya ewwil de (Şiir we Şueraa= bijarteyên ji helbesta Kurdî ya kevn û nû) ku sala 1991 an li Şamê çap bûye, beşekî taybet li ser Melayê Cizîrî û helbestvanyia wî veqetandibû. Di wê pirtûkê de çend helbestên wî jî wergerandibûn zimanê erebî. Her weha Mihemed Tewfîq El Husênî jî helbestên Cizîrî bi helbestî wergerandibûn zimanê erebî. Dibe ku hinek nav hebin min ji bîr kiribin, tu dikarî alîkariya min bikî.

Pirs:

47. *Pesnê helbestên Cizîrî, hûnandin û tevna wan û bi taybetî muzîka di wan de tê zanîn. Belê hin kesên ku helbestên Cizîrî rexne kirine jî hene. Mînak Zivingî ji ber ku sist in hinek helbestên Melayê Cizîrî rexne kirine. Çi ye ev sistiya ku Zivingî behs dike, di kîjan helbestan de ye û ev*

aliyê ku wek sistî binav dike çi ye?**Bersîv:**

47. Erê. Zivingî jî û Hejar jî nivîsîbûn ku sistî di hin Helbestan de heye. Lê ya rast wan hin helbestên ku di baweriya wan de sist in, ji nav helbestên Cizîrî nehijmartibûn. Emê niha mînakekê bînin. Helbesta ku Cizîrî di serê wê de dibêje:

Xelqo li min kin şîretê

Ew dilbera zerrînkemer

Min dî ji halê xefletê

Hat der ji burcê wek qemer

Cihê gumanê ye li ba Zivingî û ew dibêje ku dibe hinan ev helbest li dîwanê zêde kiribe. Helbesteke din jî wisa heye ku Zivingî dibêje ew ne ya Cizîrî ye, ji ber ku zimanê wê û ristîn û hûnandin naşibihe ya Cizîrî!!!. Li ba Hejar jî wek me got, hin guman hene. Lê di baweriya min de ew helbestên Cizîrî bi xwe ne. Dibe ku hinekî qels bin yan jî ne di mertebeya helbestên wi yên din de bin lê li ba her helbestvanî wisa ye, hin berhem xurt in hin jî qels in.

Pirs:

48. çîroka çapa Zivingî û Mela Ebdusselam jî heye, hin dibêjin ku Zivingî dest daniye ser şiroveya Mela Ebdusselam û ew piştî mirina wî bi navê xwe derxistiye, rastiya vê çi ye gelo?

Bersîv:

48. Erê. Tiştêkî wisa mixabin heye. Mele Ehmedê Zivingî bi şiroveya xwe ya erebî li ser dîwana Cizîrî ku navê wê kiribû El `qed El Cewherî Fî şerh dîwan Elcezerî û sala 1959 an li Qamişloyê çap kir, navekî heta hetayê di wêjeyê de ji bo xwe hişt. Lê gelek guman hene ku wî dest danîbû ser şiroveya mamosteyê xwe mela Ebdusselamê Cizîrî û piştî mirina wî, şiroveyeke mîna ya wî nivîsî û bi navê xwe derxist. Di pêşgotina şiroveya xwe de tenê dibêje min hin alîkarî ji Mele Ebdusselam wergirtiye û bi tu awayî nabêje ku wî jî şiroveyek nivîsî bû. Di nerîna min de mele Ehmedê Zivingî

karekî nebaş kir, keda mamosteyê xwe xwest winda bike. Yanî ne xem bû ku bigota şiroveya mamosteyê min jî heye. Bi hezaran tefsîrên corbecor yên quranê hene, bi sedan kitêb di şirovekirina berhemên mezin de hene, her yek ji aliyê xwe de şirove dike û cîhana wêjeyê fereh e, cihê her kesî lê heye. Ez bi xwe Mele Ehmedê Zivingî tawanbar dikim û ew sûcdar e, di veşartina kitêba mele Ebdusselam de. Lê dîsa jî ew berhem derket û ronahiya çapê dît. Sala 2004an ji weşanxaneyê Spîrêzê li Duhokê derket.

Pirs:

49. Me behsa Dîwanê kir sala temambûna wê çend e, fikrek we heye li ser vê salê?

Bersîv:

49. Ezê ji bo bersiva vê pirsê we, xwe bisipêrim dîwarê xurt yê lêkolîna hêja Tehsîn Brahîm Doskî ku di pêşgotina şiroveya Dîwana Cîzîrî de ye, ew şiroveya ku seyda Mela Ebdusselamê Cîzîrî beriya Zivingî nivîsî bû û nikaribû çap bike û me di bersiva buhurî de hinekî qala wê kiribû. Doskî dibêje ku Melayê Cîzîrî tarîxa bidawîkirina nivîsnadina dîwanê xistiye helbesta xwe ya herî dawî di dîwanê de. Di rubaiyekê de Cîzîrî dibêje:

Demekê da biseyirin sedsalan

Lew Elif tîn me di herfên falan

Ku li şiklê reqemê sersalan

Tu murada me ji er`er balan.

Hêja Doskî berdewam dike û dibêje ku eger em li gor hesabê Ebcedê herin(hesabê Ebcedê ew hesabê ku tarîx pê ji helbestan û tîpên wan derdixstin. Şêwehesabdariyeke kevne. J. Dost) ji vê rubaiyê diyar dibe ku Cîzîrî dîwana xwe di 29 ê meha tîrmehê sala 1631 ê zayînî de bi dawî aniye. Wê demê temenê wî şêst û şeş sal bû. Ez bi xwe nikarim tiştekî lê zêde bikim.

Pirs:

50. Mesela zewaca Mele jî di nav xalên meraqê de

ye. Ew jî û Xanî jî tê gotin ku nezewicîne. Ev balkêş e. Du mezinên me herdû jî nezewicîne, çi ye sir û kerameta di vê de?

Bersîv:

50. Nezewicandina herdu şairên me yên mezin bi rastî jî cihê matmayînê ye. Him wek rastî him jî wek iddia! Yanî eger rast ew nezewicîbin, çima? Û eger ne rast be jî, ka çima ev nav bi dû wan ketiye! Ev yek bi hacetî lêkolîneke berfirehe e û heta em tesbît bikin em bi hacetî dokumentan in. Lêkolîn vê dibêje, bi lav û xwezî û xeyalê tiştek di lêkolînan de naçe serî.

Pirs:

52. Di bernameyên televizyon û medya Kurdî de behsa helbesteke şînê dibe ku Feqiyê Teyran ji bo Melayê Cizîrî nivîsandiyê. Hayê te ji vê helbestê heye?

Bersîv:

52. Erê. Hayê min jê heye û min ew helbest xwendiyê ku di serê we de dibêje:

Îro werin lêzim werin هه‌وای نامه‌ی کتێ
Cran û xelkê hêsetê.

Hinek dibêjin ku ew helbest şîna hevalê wî Cizîrî ye. Eger ev rast be tê wê maneyê ku Cizîrî sala 1640 î miriye.

Pirs:

53. Kesên dîwana Cizîrî şîrove kirine ne kê in. Di nav wan de Hejar û Seydayê Mele Ehmedê Zivingî jî hene. Yeke sêhem jî ya birêz Celalettin Yoyler e. Di nav van şîrovegeran de hun kê dipesinîn. ?

Bersîv:

53. Divê em şiroveya mela Ebdusselamê Cizîrî jî ji bîr nekin. Şiroveya Hejar bi kurmanciya başûr e û karekî mukemmel e, wek hemû karên Hejar. Gelekî bi hostetî şirove kiriye. Sûd ji şiroveyên beriya xwe girtiye. Bêtir ji Zivingî. Ya birêz Celalettin Yoyler jî bi kurmanciya jorîn û bi alfabeya latînî ye. Ya zivingî şiroveya bi zimanê erebî ye wek ya Mela Ebdusselam. Her yek ji van ya din tamam dike. Lê wek min got, ya Hejar baştir e, ji ber ku ew ji wan kesên din ku dîwan

şirove kirine, bêtir farisî dizane û wek em dizanin dîwan tijî peyvên farisî ye. Bi dîtina min şiroveya Cîzîrî li cem van birêzan naqede û bi dawî nabe. Cîzîrî behreke mezin e û bi sedan kes noqî binî bibin jî, hêj durr û gewher yên nenas û bi hacetî naskirinê ne, dê di binî de bimînin.

هه‌واینامه‌ی کتیب

هه‌وآنامه‌ی کتیب

v

هه‌وآنامه‌ی کتیب

Hevpeyvîna bi Seîd Dêreşî re

**Ney tinê Tebrêz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî Şahê Xurraşanê di ferwarê te bin**

Pirs:

1. Li gora hinek idîa, hinek dîtî û nirxandinan, ji % 70- 80 ê şair û nivîskarên Kurd di bin bandêra Melayê Cizîrî de mane. Ev çendî rast e, nisbeta wê çend e? Ku wuha be çine faktor û kerametên li pey vê angaşê? Ev hêz, hêza ewqas sedsal e, kêr û têhna xwe diparêze, cîhana nivîskar û helbestvanên me rapêçaye, kiriye bendewar û dilovanê xwe ji ku tê, ji ku av vedixwe?

Bersîv:

1. Belê rast e, Melayê Cizîrî bi renekê berfireh banmdora xo li ser toreyê Kurdî kirîye. Bi bawerîya min piraniya şairê Kurd di nav pirêza wî û zevya wî da şîn bûyne û werar kirîne, ew şairê Kurd yê ku Cizîrî di mejyê xoda ne vekîyandibît, ne şiyaye bibîte şairekê navdar, ez dikarim vî tiştî bo berebabêtên wî jî bêjim, şairê niho jî ger Melayê Cizîrî baş nexwîn, neşên bibine şairê serkeftî.

Lê divêt em wê jî jibîr nekeyn, ku hersê helbestvanê mezî, yê ku bingehê torevanya Kurdî danay, Elî Herîrî, Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî, ev hersêye bûyne seqayê îlhama gelek şairê Kurda. Lê em dikarîn Melayê Cizîrî danîne loka

êkê û Feqîyê Teyran loka duyê ku helbestvanêt Kurda bo xo kirîne bingeh û li ser dewsa wan çûyne.

Pirs:

2. Her kes kême ya zêde, bi ferq û cihêyê be jî ber û berhemê şert û mercên welat, kultur, dîrok û serdem û qonaxa xwe ye. Heger mirov jî vê awurê, jî pencereyê wuha sosyodîrokî, xwe bi nav salên dema Cîzîrî li jîyanê ye berde, hinekî noqî nav sedsala wî bibe, gelo wê encam çî bin?

Bersîv:

2. Eger me bivêt xo berdeyne di nav salê ku Melayê Cîzîrî têda jîyay û verêja wan salan diyarkeyn, pêdvîye pîçekê bi dirêjî li ser rawestîn û lê vekolîn:

Toreyê nivîskî yê Kurdî ji sala 1550 za. û hêve dest pêkiriye, dibît berî vê mêjûyê jî titê nivîsî hebît, lê heta niho negehiştîye destê me. Ji ber vê çendê jî em dê Feqîyê Teyran û Melayê Cîzîrî û Elî Herîrî danîn kesê êkê ku berê binyatê toreyê Kurdî danay. Çerxê zêrîn yê toreyê Kurdî destpêkir, bi hêz û şîyaneka hind mezin hate di meydanêda heta bi êk pal gehiştîye loka toreyê dunyayê yê wî çaxî, mîna yê Erebî û Farisî û Turkî. Melayê Cîzîrî di hinêrbendîya helbestêda hevrikkî digel helbestvanê berî xo yê faris, mîna Hafîz û Se'dî Şîrazî kir. Feqîyê Teyran jî cara êkê Beyta Kurdî ya devkî êxiste di qalibê beyta (dastan, melheme) dinyayê da, evan herdu filîvanan (mubdi') rewşeka nû da ezmanê Kurdî û felsefa wî. Êdî vî rwîbarî roj bo rojê li boşiyê da û pêl vedan, heta êkê mîna Ehmedê Xanî çêkirî û bûye hostayekê bê bevil di danana berê binyatê hizra neteweyîda. Vê werçepê bi dehan helbestvanê mezin çêkirin û şopa wê bi ser tevaya Kurdistanê da girt, ezmanê van helbestanan bo standartê Kurdî, hemî zarê Kurdî bi ezmanê wan nivîsî, lewra jî heta dwîmahîya çerxê nûzdê jî, çî zarê di yê Kurdî serhelnedabû.

Weku ez dinêrme dîroka Kurda, bigre jî despêka hatina bisurmanetîyê û heta digehîte sala 1514za., gelek cih, bajêr, deverê mezin û dewlet ketîne destê malbatê Kurda û wan

hikum lê kirîye, lê pitirîya wan dewlet û desthelatan, gelêt dî jî, wekî Turk, Faris û Ereba pişikdarî têda kirîye û ezmanê wan gelan di wan desthelatada hatîye xebitandin, mînaka ji hemya pêşçavtir dewleta Eyûbîya bi serokatîya Selaheddînê Eyûbî bû (1137-1193za.)ê. Û gelek hukimdarî û serwerî Kurda wergirtîne, lê pitirî bi vî rengî bûyne.

Berî sala 1514za. Pitirîya axa Kurdistanê li jêr destê Sefewîya bû, lê çî deman Sefewîya nehêlaye serwerîyeka (hikum) xobixoyî ya Kurda dirust bibît.

Piştî Sultan Selîm (1512-1520za.) alîyê Ewropa êmin kirî, bangîna şerrê li ser Iranê heldêra piştî ferman day ku şî'a li Enadolê bikujin, îna herdu alîyan pêkol kir mîrêr Kurda bo layê xo rakêşin, lê bi xêra wan bizavêt Idrîs Hisameddînê Bidlîsî (1520za, mirîye) kirîn û ew loka xo ya dînî ya li nav Kurda hey bikarînay, pirranîya mîrêr Kurda kêşane leşkergeha Osmanî, herdu leşkerêr Osmanî û Îranî di (23/8/1514za.) li Deşta Çaldêranê li jorîya rojhelatê ji Behra Wanê gehiştin hev, şerr bidwîmahî hat û çam û derdeserî biser Sefewîyada hatin û şah Isma'îl (1501-1524za.) revî. Leşkerêr Osmanî biserkeftin û em dişeyn bêjîn rolê Kurda di serkeftina Osmanîyanda yê dîyarbû.

Tevaya welatê Kurdan bi vîyan û rizaya wan kete ber hukmê Osmanîya, eve jî ji aqildarîya mewlana Şêx Idrîs û sîyaseta wî ya hejî bû, dîsa ji himmeta Mihemmed Paşay û wêrekîya wî, piştî vê hemîyê Şêx rabû hevristêr rêveberîyê danan ku ew welatê heta wî demî jî jiber qîl û qal û fitne û şerrêr giran û lipey hev yê aloz û têkçuyî bû, ev hevrist û seruberkirna ji bo pêşkeftina welatî li bin sîbera mîrgehêr Kurda û rêveberêr navxoyî li bin desthelata Osmanî, li nik celaleta Sultan Selîmî hatine pejirandin. Êdî ji verrêja vê hevsozîyê (mu'ahede) di navbera Kurda bi rêveberîya Idrîsê Bidlîsî ji layekî û dewleta Osmanî birêveberîya Sultan Selîmî ji layekê dî, hindêk desthelatê bi hêz li Kurdistanê çêbûn, nîv serxobûnek ji dewleta Osmanî wergirt, hemî karubarêr wan ketin destê wan bixoyî, bûne xudan leşker û ala û sike û abûreka xurt di hindêk desthelatada werar kir. Tiştê ji hemîya girinktir ev desthelate

xorrî Kurdî bûn û çî mîletê dî neşîyan ezmanê xo dinav wanda belavken, êdî ew pêdivî xebitandina ezmanê Kurdî bûn, serok û mîrêt Kurda hindekê bi wê çendê hesîyan, ku xandin û nivîsîna bi Kurdî karekê girînge, ewan jî zana û şairêt Kurda paldan bi Kurdî binivîsin, evca ji verêja vê çendê hemiyê çend siwarekê egîd û xoşmêr yê wêkî Elî Herîrî, Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî hatine di meydanêda, êkê wêkî Şerefîxanê Bidlîsî dîroka Kurdistanê nivîsî, Elî Teremaxî dest bi nivîsîna Rûşanê kir û ezmanê Kurdî di pitirîya medrese û mizgeftê Kurdistanêda hate xebitandin.

Pirs.

3. Dema Cizîrî serê xwe datîne. Diçe rehetê li gora texmînan Ehmedê Xanî 13-14 salî ye. Îmkan heye ku Xanî Cizîrî dîtibe, yan di zaroktiya xwe de, hê dema Cizîrî sax bû, dîwana wî xwendibe, yan jî bi riya malbata xwe bav û xizmên xwe li ser vê dîwanê hinek zanebûna wî çêbûbe?

Bersiv:

3. Ya xoyaye ku Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî nedîtîye û bi çend salan piştî mirina Melayê Cizîrî ew ji dayk bûye. Melayê Cizîrî li dorêt sala 1567ê û wêve ji dayk bûye, dîsan li dorêt sala 1640ê çûye ber dilovanîya xudê. Ehmedê Xanî sala 1651ê ji dayk bûye û li dorêt sala 1709ê çûye ber dilovanîya xudê. Eger çî hêştî salê jidaykbûn û mirina Melayê Cizîrî sedêsed ne xuyane, lê nêzîkî van mêjûyane yê me gotîn. Belê pa sala jidaykbûna Ehmedê Xanî ya xuyaye her wêkî wî bixor bi sala mişextî (hicrî) destnîşankirî, dibêjît:

Lewrra ku dema ji xeybê fek bû

Tarîx-i hizar û şest û yek bû

Piştî Elî Herîrî û Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî bingehe torevanîya Kurdî danay, êdî berkarê wan di pîrîniya mizgeft û medreseyê Kurdistanêda hat xandin, ne bes di mizgeft û medreseyanda, belkî berkarê wan bû pişkeka girîng ji jiyana gelê Kurd ya ruhî û çandî. Bi bawerîya min Ehmedê Xanî jî di medreseyê Kurdistanêda liber feqatîyê berkarê Melayê

Cizîrî û şa'irêt dî xandîne û xo li ser wan avakirîye.

Pirs:

4. Erê Melayê Cizîrî û Feqyê Teyran di çaxekî da jiyayne. Eger di çaxekî da jiyabin, kîjan bi jiyê xo ji yê dî mezintir e? Teisîra kîjanî li ser yê dî heye? Tu dikarî helsengandinekê bo herduyan bikey?

Bersîv:

4. Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran di çaxekîda jiyayne, herduyan jî êkudu naskiriye û belkî hevalînî û dostînî jî digelêkda hebûye. Di dîroka jîna Feqîyê Teyran û berkarêt wîda xuyaye ku, Feqî li nik mîrêt Cizîra Botan jî xoştivî bûye û çend caran çûye Cizîrê, Herweku di helbesteka xoda saloxa yara xo diket û bi werdeka ava Cizîrê dişibînît, dibêjît:

Ordeka ava Cizîrê

Qemera bedra minîrê

Min tu car naçî ji bîrê

Her medama ew refîq

Dîsan di hindek wân çîrokêt li ser Feqîyê Teyran hatîne gotin têda bi dirêjî behsê çûna Feqîyê Teyran ya Cizîrê diket û têkelî û dostîniya wî digel mîrêt Cizîrê.

Evca Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî di Cizîrêda gehîştîne hev û dostînî û xoştivîyatiyeka mukum dinavbera wanda çêbûye, tiştê ku bo me vê çendê belî diket, ew berêkanêye ya ku dinavbera herdukanda çêbûy. Ew berêkanê helbesteka dwîr û dirêje, herdukan Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran bi helbestê havêtiye berêk, ku bi rastî jî di wê berêkanêda hêz û şîyanêt herdu zana û feylesofan diyar dibin û loka wan ya bilind tete nîyasîn. Her di berêkanêda Feqî û Mela saloxa hevdu diken û pesnêt hevdu diden, Melayê Cizîrî dibêjîte Feqîyê Teyran:

Nuttqa te xo gewhere

Sed bar gewher dirrêjin

Paşî Feqîyê Teyran dibêjîte Melayê Cizîrî: ((**Tu Rojî ez Hitavim**))

Paşî Melayê Cizîrî lê vedigêrît û dibêjît: ((**Tu Hitavî ez Sihim**))

Edî bêgomane ku Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran di êk çaxda jîyayne, lê kî berî yê dî ji dayk bûye û kî ji yê dî mestir bûye? Evê jî, divêt mirov pîçekê liser rawestît. Li dwîv wan vekolînêt min li ser Feqîyê Teyran û jîna wî kirîn, bo min wesa dîyar bû ku, Feqîyê Teyran nêzîkî 17 salan ji Melayê Cizîrî mestire. Feqî di sala 1549za, li gundê ((warezor))ê ku dikevîte ber qeza ((Miksê)), ji dayk bûye. Melayê Cizîrî li dorê sala 1567ê û wêve ji dayk bûye. Ji ber vê çendê jî ez dibînim Melayê Cizîrî hem di berêkana şî'rêda, Feqîyê Teyra danaye seydayê xo, hem jî di çavlêkirina şî'rêda. Melayê Cizîrî Şêxê Sen'anî yê Feqîyê Teyran baş xandiye, di despêka şî'reka xoda, ku êke ji kwîrtirînê şî'rêt wî, naverroka beyta Şêxê Sen'anî ya Feqîyê Teyran di çar malkan da kutne kiriye, dibêjît:

Mey nenûştî Şêx-i Sen'anî 'xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê 'xelet
Mislê Mûsa wî tecellaya te dî
Ê tu dî kanê xeta hanê 'xelet

Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî her yekî ji wana helbestek heye, bi rastî herdu didagirtîne ji felsefeyeka kwîr, her yekî li dwî hizir û bîrdozêt felsefê yêt wî serdemî, têkel ji bawerî û Eqîda Îslamê û felsefa Yûnanî, binyatê çêbûn û afirrandina vî kewn û hebûnê bi awayekê ciwan têda darêtiye, li dwî hizira Yûnaniyan ya felsefî ((hebûn)) şirovekiriye, ku wan wesa hizir fikir, ev kewnê henê, anku bi giştî hebûn, ji çar tuxman çêbûye.. ew jî ((Ba, ax, av û agir))in.

Li ser vî binyatî van herdu kelemêra felsefa xo di wan du helbestanda raçandiye, ew herdu helbest yek ji wana helbesta ((Ey av û av))e, ya Feqîyê Teyran, ya dî jî helbesta ((Allah sehergaha ezel))e, ya Melayê Cizîrî.

Helbesta ((Ey av û av)) ya Feqîyê Teyran bi nav û dengtirîn helbesta Kurdiye, bahra pitir ji Kurdan ev helbeste yan çend

bend jê, jiberin, yan jî çîroka nivîsîna wê dizanin û vedigêrin.

Helbesta ((Ellah sehergaha ezel)) ya Melayê Cizîrî, eger ne ji helbesta ((Ey av û av)) bihêztir û lok bilindtir jî bît, ji wê kêmtir nîne, lê ew nav û dengê helbesta ((Ey av û av)) wergirtin û di nav miletîda hatiye nîyasîn û belavbûy, helbesta ((ellah sehergaha ezel)) wernegirtîne.

Ev herdu helbeste hem di form û şiklan da, hem jî di mijara xoda gelek nêzîkî hevîn.. zêdebarî wêrê ku hindê bend bi dirustî peyv û hevok û qafîye jî wekhevîn.

Bo mînak dê van herdu bendan hevberkeyn:

Feqîyê Teyran di ((Ey av û av))da dibêjît:

*Çar teb'etîn vêkra zidîn
Hem ateşîn hem baridîn*

*D'behra ((Heyûla)) d'waridîn
Macûs bi vê weçîyetê*

Melayê Cizîrî di ((Ellah sehergaha ezel))da dibêjît:

*Çar ûnsirin çar teb'etîn
Vêkra bi mîzan vêk ketin
B'hevra mixalîf sîretin
Der suretê şexsîyeda*

Feqîyê Teyran her di helbesta xoda dibêjît:

*Hem suflewî bazî dikîn
Hem meylî evrazî dikîn
Hem ((keynûn)) hem gazî dikîn
Carek bibînîn ru'iyetê*

Melayê Cizîrî jî di helbesta xoda dibêjît:

*Hin suflewî bazî diken
Hin meylî evrazî diken
Weş reqsek şehbazî diken
Sergeştene d'halê Xweda*

Eger çî li vêrê em bi dirustî nizanîn ka kî pêş yê dî ev helbeste nivîsiye û bandora kê li ser yê dî hebûye? Lê bi bawerya min çawa tevaya Kurdan heyranêt helbesta ((Ey av û

av)) bûyne, 'eyn herwesa Melayê Cizîrî jî yê bûye heyranê wê helbestê û li ser mijar û forma wê ew helbesta xo darêtiye.

Ev kartêkirna henê neku tinê nîrxê Cizîrî bilind diket, belku seng û bihayekê mezintir didetê, eger helbestvanê Faris û Erebiyê berî wî kar tê kirbît, boçî helbestvanê Kurd yê berî wî kar tê neken?

Eger hevberkirnekê di navbera ezmanê Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran bikeyn, dê bînîn Feqîyê Teyran bi ezmanekê kudî yê wesa sivik û rehwan nivîsiye, yê şehreza nebît dê hizir krt ku Kurdekê evro ew şî'r nivîsîne. Lê wextê em şî'ra Melayê Cizîrî dixwînîn, sîngê mirovî dikevîte çyayekê asê û xowestandineka mezin bêdiviye heta mirov li wî çyayê asê serdikevît, têgehiştina ezmanê Cizîrî şehrezayeka kwîr pêdivêt. Evca boçî Melayê Cizîrî çyayekê asêye û kêmkê kes dişên lê serkevin û Feqîyê Teyran jî rêkeka vekiriye û her kes dişêt têra biborît. Melayê Cizîrî peyv peyv û rêz rêz xo li ser Sofyatiyê avakiriye, Sofyatî jî behreka bê bine û ew peyv û êdyomêt berî Cizîrî di berkarêt erebiyê û farisan da hatîne bikarînan wî jî ew bikar înayne, di her peyvekê da û her êdyomekê da raman û hizrêt kwîr têda hene û piraniya wan jî bi erebî hatîne, êdî her kesê di felsefeya Sofyatiyêda yê şehreza nebît, neşêt wan girêkêt têkalozyayî veket. Lê Feqîyê Teyran eger çî wî jî xo havêtiye di meydana sofyatiyêda, ku beyta Şêxê Sen'anî li serî heta dwîmahiyê li ser binyatê sofyatiyê raçandîye, lê ewî pêkol kirîye ku, xo ji êdyomêt giran û aloz dwîr bêxît û gelek ji wan êdyoman bi Kurdî di şî'rêt xoda xebitandîne.

Pirs:

5. Heger em di nav Cizîrî û Xanî de muqayese û berhevkirinekê bixwazin, çî mimkun e bê gotin? Mesele muqayeseyek ji awura têkiliya bi cîhanê û der û dora xwe re, têkiliya bi mîr û deşaltdarên Kurd re, ji awura naveroka berhemên wan, zimanê wan û Hwd.

Bersiv:

5. Herwek min berî niho jî behis kirî, Melayê Cizîrî verêja wê hevsozyêye ya ku dinavbera dewleta Osmanî bi serokatîya Sultan Selîmî ji layekî û Idrîs Hisameddînê Bidlîsî ji layekê dî çêbûy, anku hevsozîya dinavbera Kurda û Osmanîya da. Piştî mîrgehê Kurdan serxobûna xo wergirtî û abora wan werar kirî û medreseyê bi rahavêj di welatîda hatîne avakirin û tinê ezmanê Kurdî di wan mîrgehanda hatiye bi karînan û tenahî ketiye welatî, êdî hizirvanê wekî Melayê Cizîrî û Feqyê Teyran û Elî Herîrî û Şerefxanê Bidlîsî û Elî Teremaxî ji verêja vê hevsozîyê serhelda. Di vê qona'xê da rolê Sofîzmê di dinyaya Îslamêda gelek yê bi hêz bû, nexasme li Kurdistanê. Melayê Cizîrî jî wek zanayekê sofî hate di meydanê da, hemî senga xo da ser dewsa Sofîzmê. Eger em binêrîne şî'rê wî, dê bînîn piraniya wan li ser vê dewsê hatîne vehandin, êdî hizrubîrê felsefa Sofîzmê Melayê Cizîrî di nav xoda pêça û nehêla jê derkevît. Her wek ji berkarê Cizîrî diyar û xuyaye, wî xo ji dûrhêlê û têkeliya bi dinyayêra dwîr êxistiye, eger çî wî têkheliyeka mukum digel mîran hebûye û wan jî bi lokbilindî nêraye Cizîrî, lê Cizîrî her wek sofîyekî maye û berê xo nedaye çî rêkê dî.

Ehmedê Xanî jî verêja Cizîrî û Feqyê Teyran û Elî Herîrî ye, bi bawerya min eger eve nebana, Ehmedê Xanî jî nedibû, lê her kesek kurê heyamê xoye û çêkiriye hawîrdorê xoye. Ehmedê Xanî jî wekî Melayê Cizîrî nêzîkî mîran bûye û têkheliyeka nêzîk digelda hebûye, wî jî wekî Melayê Cizîrî şî'r bi mîranve gotîne, mijarê dînî nivîsîne, di sofîyatîyêda şehreza bûye, gelek caran jî xo di wê behrêda niqo kiriye, lê pa sofîyatî neşyaye Ehmedê Xanî di nav xoda werpêçît her wekî Melayê Cizîrî werpêçay. Her wek me gotî, Melayê Cizîrî bijlî du – sê şî'ran ku bi mîrê cizîrê ve nivîsîne, eger berkarê wî yê dî hemî di çarçovê sofîyatîyê da dernekeftîne, lê Ehmedê Xanî bo cara êkê qamos bo biçwîkê Kurda nivîsîye, li ser eqîda îslamî, - ku ew jî êk ji zanîstê îslamê- nivîstokek nivîsîye, nivîstokeka dî li ser erkanê îslamê nivîsîye, behîdarîyeka dirêj bi mîr Mihemed Begê hakimê Bazîde vehandiye û berkarê wî yê gelek mezin û bihadar Mem û Zîn e, ku çîroka du evîndarê Kurd bo dinyayê vegêraye û herwek

wî bixoy gotî, daku xelk nebêjin, Kurda felsefa evînê fêm nekirîye, her di Mem û Zînê da wî mijareka bive û xeter, mijareka dwîr ji hizra xelkê deverê, mijareka dwîr ji hizrubîrêt olî, ku ew jî mijara miletînyê ye, helêxistiye. Neku bes Melayê Cizîrî yê Kurd xo nehavêtiye vê mijarê, belkî hizirvanêt dinyaya Îslamî hemya çî hizrê hosa ne helêxistîne, ku bi rastî ev hizrê mezin û berfireh, di çaxekê tarîda mejîyê mirovî tevlihev diken, ka wî hizrê danana dewleta Kurdî ji kîve înayne?!!

Pirs:

6. Em dê carcaran li pirsê "evînê jî vegerin. Evdirehman Dure ku yek ji kesên xwedî gotine li ser kilasîkên Kurdî, girêdayê "evînê" piştî bi xwe dipirse "evîn çî ye", bersiva pirsê xwe jî wuha dide: " Evîn ew e ku meriv ji tiştê hez bike, hemû tiştên xwe bide wî tiştî. Doza meriv, bahweriya meriv, dîn û îmanê xwe û heta ruh û bedena xwe jêre feda bike". Ev jî hinekî nîqaşê, lêhûrbûn û lêkolînê naxwaze?

Pênasîna ku Ebdurrehman Durreyî bo evînê kirî ya xorist û di cihê xodaye, lê demê em behsê evîna Melayê Cizîrî dikeyn, divêt xo pavêjîne kinarê Sofîzmê. Melayê Cizîrî jî wekî sofîyê berî xo yê binav û deng, Şêx Mi'hyeddîn Ibin Erebi, Şêx Mei'rûfê Kerxî, Bayezîdê Bestamî, Huseynê Hellac, Ebu Bekrê Şiblî û Ebdilqadirê Geylanî û yê dî, ewî jî bi dêrbîna sofîyê temaşeyê dinyayê kiriye, nexasme dideravê "Evînê"da. Evîna mirovê sofî girêdayî xudêye, heta demê evîn dibête evîneka dinyayî jî, sofî wesa dibînin, ku xudê tecella di evîndara wîda kiriye, berî niho min carekê çarmalkîyeka Cizîrî li ser Şêxê Sen'anî di cihekîda behis kirbû, naveroka wê li ser evîna Şêxê Sen'anîye bo kîça Ermenî, Melayê Cizîrî wesa hizir diket, ku

Şêxê Sen'anî xeletî nekiriye, demê çûye Ermenistanê, xeletî nekiriye demê Ereq li ser destê kiça Ermen vexwarî, ew wesa hizir diket ku Şêxê Se'anî tecellaya Xudê, an jî hema xudê bi xo li wêrê dîtiye.

Bersîv:

6. Sofî dibêjin, sê rengê "Evînê" hene: ya êkê, Evîneka xorristiye, dinavbera mirovan da çêdibît, ruha her êkî dibîte ruha yê dî, wextê ew 'hejêkirin û gulênê diken, ru'hêt herdukan têkelêk dibin, wekî çawa reng têkhelêk dibin. Ya duyê; Evîna ru'hanî- nefsi ye, armanca wê Evînê wekhevîya digel xoştivîyê xoye, qedrê wî bigrît û loka wî ya bilind bizanît. Ya sîyê; Evîna Xudêyî ye, ew jî ewe ku Xudê 'hej benyê xo biket û benî jî hej wî biket, bi rangekê wesa hej êkudu biken ku dwîmahiyê benî xo bibînît ku ew jî "Heqqe" anku xudê ye, dîsan xudê jî bibîte qudîka beniyê xo, ku benî xo di xudêra bibînît, bikarît bêjît ejî "Heqqim" anku xudême. Herweku Melayê Cizîrî jî çend cara "Ena Elheq" anku ez xudême gotîye.

هه‌و‌ال‌نامه‌ی کتیب

Pirs:

7. Di mesela pesin û şabaşên ji bo mîrek û deşelatdarên Kurdan ne ji bo Şah û Sultanên netewên serdest jî ji heman riwângê mikune mirov binirxîne. Cizîrî jî xwe ji pesnê serdestên neteweyên biyanî û ne Kurd vedaye. Ev paye jî ji Xanî zêdetir ne ya Cizîrî be?

Bersîv:

7. Eger em binêrîne dîroka torevaniya kudî bi rengê tevayî, dê bînîn, pîrraniya şa'ir û nivîsevanê Kurd şî'r bi hakim û serwerê biyanîve ne gotîne, çî dema jî destê xo bo biyanîyan dirêj ne kirîne, ş'ira xo jî ne kiriye pertalek ji bo firotinê. Herdem şa'irê Kurd berevan û piştgîrê milletê xo bûye, binêre Melayê Cizîrî, tinê ş'ir bi mîrê Cizîrê ve gotîne û wî çaxî jî hiş û hişyariya milletîniyê di wêrê da bû ka mirov çend girêdayê serwerê milletê xoye hind jî mirov dilsoje bo milletê xo, Melayê Cizîrî di ş'irekêda, dibêjîte mîrê Cizîra Botan,

nabît bes Tebrêz û Kurdistan li ber hukmê te bin, belkî divêt sedêt wekî şahê Xurraşanê di bin emr û fermanêt teda bin.

*Ney tinê Tebrêz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî Şahê Xurraşanê di ferwarê te bin*

Dîsa di şî'reka dî da daxwazê diket ku Cizîra Botan bibîte paytextê her heft eqlîmêt dinyayê û hukmê mîrê Cizîrê wekî hukmê Eskenderî û Fexfûrî hemî dinyayê vegirît, dibêjît:

*Ma Cizîrê şubhê darê textê heft Eqlîm-i bit
Hem bi 'hukm û seltenet Eskender û Fexfûr-i bî*

Dîroka şerê Kela Dimdimê û Xan Ebdalê qehreman di nav Kurdanda ya navdare. Ev şere dinavbera Şahê Ecemê û Xanê lep zêrîn qewimiye, di wî çaxîda Feqiyê Teyran hebûye û dîyare jî ku li nêzîk yê agehdar bûye, lewra jî wî beyteka dirêj pê vehandiye, di beytêda Eceman bi kafir dadinît û Kurdêt ku hatîne kuştin bi şehîd.

Dîsa ne pêtivîye em di vê xalêda behsê Ehmedê Xanî bikeyn, jiberku wî bingeheê hizra mîletînyê bo Kurda danaye, herdem jî berevanî ji mîletê xo kirîye.

Evca me nevêt li ser wan hemî şa'iran rawestîn yêt ku bo mîletê xo nivîsî û hizrêt mîletînyê di serîda werar kirî, lê bi tevayî jî di vî warî da toreyê Kurdî ji hemî toreyêt mîletêt dewrubera paqij û bijwîntire.

Pirs:

8. Kesê ku Cizîrî, dîwana wî, şîroveyên li ser jîyan û berhema wî dixwîne, ne mikun e bi pirseke wuha re veneciniqe: em giş payeya nivîsandina bi Kurdî didin Xanî, ewçendî em vê dubare û bi dengê bilind dikin mîna ku destpêkerê tiradisyona nivîsandina bi zimanê Kurdî di berhemên wuha biserûber, li ser hev û mezin ne Cizîrî, belê Xanî be. Ev ne neheqiyek li Cizîrî ye

Bersîv:

8. Kes neşêt berê dîrokê biguhorît, dîrok çawa qewmiye dê

wesa hête nivîsîn jî, nabît Ehmedê Xanî sed salan biçîte pêş Melayê Cizîrî û Feqyê Teyran, kes neşêt bêjît Ehmedê Xanî ji wan herdukan şa'irtire, nabît bêjîn Ehmedê Xanî bingehê toreyê Kurdî danaye, divêtin em her kesekî, her zanayekî di cihê wîda, di demê wîda, di dewruberê wîda, di pêşveçûn û têgehiştina çaxê wîda vekolîn. Her êk ji vana di çax û demê xoda kenkenekê mezin bûye, muhra xo li dîrokê kiriye, hindî milletê wan mabît ew namirin. Herwekî me berî niho gotî, Feqyê Teyran û Melayê Cizîrî nebana, Ehmêdê Xanî jî nedibû, ew werçepeka mezin bûn di dîroka torevaniya Kurdî da, Ehmedê Xanî jî werçepeka dî bû. Lewra Ehmedê Xanî jî jibîr nekiriye, ku ew seydayêt wî bûn, demê dibêjît:

*Bînave ri'ha Melê Cizîrî
Pê 'hey bikira Elî Herîrî
Keyfek we bida Feqîhê Teyran
Heta bi ebed bimaye 'heyran*

Dîsan jî min divêt bêjim, ku zanayêt koma êkê di toreyê Kurdîda, anku danerêt binyatê toreyê Kurdî, Teyran û Herîrî û Cizîrî, nahêne hevberkirin û helsengandin di gel şa'irêt piştî wan. Ewan rwîyê milletê Kurd yê zanistî û toreyî sipî kiriye.

Pirs:

9. Xwendin û dersdariya Melayê Cizîrî ?

Bersîv:

9. Digel hatina îslamê xandin û zanîne destpêkir, her cihê ku bisurmanetî digehiştê, mizgeft jî têda dihatin avakirin, di wan mizgeftanda Qur'an dihate xandin, piştî hingî hêdî hêdî zanstê îslamî wekî tefsîrê, hedîsê, şerî'etî û yê dî serhêda, li serdemê Ebasiya bijlî zanistê dînî, yê dinyayî jî wekî felsefê û felekê û dîrokê û ...htd., peydabûn, êdî hijmara şagirdan bû gelek û mizgeft neşyan vê hejmara mezin wergirin, jiberku mizgeft pêtir bo ta'etî û xudê perêsiyê hatibûn avakirin, lewra hizir li danana medresê taybet hate kirin, ewbû bo cara êkê yê ku medrese danay herwek Ibin Xelkan "681miş., 1282za., mirîye" dibêjît ku: ("Nizam El-melik" medrese û tekya û mizgeft di welatî da avakirin, ew êkemîn kese medrese

damezrandîn û xelkî jî çavlêkir)) wî gelek medresêt nîzamî li Bexda û Belex û Nîsabûr û Wehrat û Esbehan û Besra û Mero û Amil û Mîsil, danan.

Her Nîzam El-melik medreseyek li bajêrê Cizîrê avakir, ku tête hijmartin kevintirîn medresa serbixoyî li Kurdistanê. Û dibît ku Nîzam El-melik ev medrese sala 463miş.-1073za., dema digel Elb Erselan hatîye welatêt Dustekîyê an piştî dest danaye ser desthelata Dustekî, avakirbît.

Evca piştî danana vê medresê li hemî bajêrê dî yê Kurdistanê medrese hatin avakirin, wekî:

Medresa Strabasê "Dîyarbekir", medresa sor "Cizîra Botan", medresa Bazîdê, medresa Şemdînan, medresa Bidlîsê, wekî Îxlasîye, Katibîye, Şukrîye, Şerefîye û Şemsîyeyê. Medresa hîzanê, medresa Miksê, medresa Bêdarê, medresa Findika Botan, medresa Axtepeyê, medresa Norşêtê, medresa Farqînê, medresa Hawêlê, medresa Sêrtê, medresa Heskîfê, medresa Paloyê, medresa Oxînê û medresa Qubayê li bajêrê Amêdiyê û gelek medresêt dî. Mela Mhmûdê Bazîdî dibêjît: ((Melayêt qewî zû finûn di Cizîr û Imadî û Soran û Si'rt û etrafan da zaf bûn, telebeyêd Kurdistanê heta Bexda û Besra û Mûslê diçûn û di gerîyan û tehsîla ilûman dikirîn.)) êkê wekî Melayê Cizîrî di vê barista zanînda hate taşandin, em bi dirustî nizanîn ka xandina Melayê Cizîrî di van medreseyan da ya çawa bûye, li çend medresan xandîye û ew jî wekî hemî feqîyêd Kurda bo wergirtina zanist û zanîne çûye çend welatan an ne? Lê herwek xuyaye seruberê hemî feqîyêd Kurdistanê wekî êk bûye û cihê zanîne jî an mizgeft an medrese an jî tekyabûn, kawedanê wan jî hemî nêzîkî êk bûn. Ew zanistêd di wan medresanda dihatin xandin jî bahra pêtir wekî êk bûn, wekî van zanistan: ((Sserf, ne'huw, edeb, îna, menttiq, issul, beyan, tarîxa tebîî, te'bîr, te'wîzat, tessewif, cifîr, cu'xrafîya, niqarî, teşrîh, hîsab, hendese, cebir, miqable, tefsîr, hedîs, hiqûq, hîkmet, nujdarî, remil, kîmya, cerr el-esqal, tîyanasîyê, fîzya-ku behsê ecsamêd tebîî kirîye-fîzyolojî- ku behsê karubarêd endamêd leşê gîyaneweran

kirîye- zanyarîyêt nujdarîyê, tilismat, me'anî, mue'mma, munazzere, 'eruzz, qafîye, qîra'et, kelam, muhazerat, mesahe, çandin, fiqih, feraîzz, stêrnasî, neqaşî, istirlab û musîqe)).

Herwek di helbestê Melayê Cizîrîda xuya dibêt, ku wî ev hemî zaniste xandîne û têda şehrezabûye. Û wesa tête vegêran ku Melayê Cizîrî li medresa sor ya Cizîra Botan seydebûye.

Pirs:

10. Kesên dîwana Cizîrî çîrove kirine ne kê in. di nav wan de Hejar û Seydayê Mele Ehmedê Zivingî jî heye. Yeke sêhem jî ya birêz Celalettin Yoyler e. Di nav van şîrovegeran de hun kê dipesinîn?

Bersiv:

10. Bi rastî Kurd di hemî waranda xo nawestînin, nexasme di warê vekolînêda, em wesa hizir dikeyn ku dîwana Melayê Cizîrî tinê ji layê Zivingî û Hejarî ve, hatiye ravekirin, û hewe di pisyara xoda jî navê Hejarî berî yê Zivingî îname!! Pêdivîye li vêrê pîçekê dirêjtir li ser vê xalê rawestîn û navê wan zanayan bînim yê dîwana Melayê Cizîrî ravekirîn:

1. Mela Ebdilqadir Qedrî kurê Hesenê Cizîrî (1842-1882), miftî bû li Cizîrê, bi erebî ravekirîye.
 2. Mela Ebdilselam Mirad Ebdilselamê Cizîrî (1878-1952), bi erebî ravekirîye.
 3. Mela Ebdilrehîm kurê Ebdilrehmanê Westanî (1958ê za., mirîye), bi sê ezmanan, turkî, erebî û farisî, ravekirîye.
 4. Mela Ehmed kurê Mihemedê Zivingî (1893-1971za.), bi erebî ravekirîye.
 5. Hejar Mukrîyanî (1921-1991za.), bi soranî ravekirîye.
 6. Seydayê Cegerxwîn (1903-1984za.), bi Kurdî ravekirîye.
 7. Du hêjayê dî jî vê dwîmahîyê dîwana Melayê Cizîrî bi Kurdî ravekirîye, Celalettîn Yoyler û Mihemed Emîn Doskî.
- Helbet dîwana Melayê Cizîrî behreka hindî bêjî kwîre,

melevanêt zîrek nebin neşên bigehne çî kinara, berî her tiştî ewê dîwana wî rave diket divêt bi kêmasî hersê ezmanan, erebî, Kurdî û farisî baş bizanît, di felsefeya sofîzmêda şehrezayeka baş hebît, yê melevan bît di hemî zarêt Kurdîda nexasme zarê hekara kevin ku Cizîra Botan û Behdînan û Hekarê vedgirît. Evca ev helyêt (şertêt) me gotîn di her kesekîda kom nabin yêt ku dîwana Cizîrî rave kirîn. Bi bawerîya min ew kesêt ku ev helîye têda nebûyne, wî hana xo birîye ber yê berî xo, lewra jî dê çend nêrînan li ser vê çendê dem.

Despêkê dê li ser Mela Ebdilqadir û Mela Ebdilselam rawestîn? Kanê van herdukan kê mifa ji yê dî wergirtîye, kê berî yê dî dîwan ravekirîye? Haya wan ji hevdu hebû an ne? Bersiva van pisyara di mij û moranêdaye, em nizanîn kê berî yê dî ravekirîye! Heke êk bi jîyê xo ji yê dî mestir ba jî da bêjîn yê mestir berî nivîsîye, lê jîyê wan jî temet êke û dîroka jidaykbûna wan gelek nêzîkî êke, evca em neşeyn nêrîneka vebirr li ser vê çendê bideyn, dê hêlîn bo paşerojê belkî ev bersive bihêne dan.

Dê dev ji van herduka berdeyn û hêyne ser Mela Ebdilselam û Mela Ehmedê Zivingî, gêngeşa mezin jî herdem li ser van herdukan bûye, wesa belav bûye, ku Mela Ehmedê Zivingî raveya Mela Ebdilselamî jê wergirtîye û piştî çûye ber dilovanîya xudê, Zivingî rabûye li ser navê xo çap kirîye. Belê piştî raveya Mela Ebdilselamî sala 2004ê li dezgeha Spîrêz li Dihokê hatîye weşandin, êdî xuyabû ku her êkî wekî xo ravekirîye û cudahî dinavbera herdukanda heye, lê tiştê me divêt bêjîn ewe, eger raveya Mela Ebdilselam neba, da Zivingî şet raveyeka hosa berkeftî bo dîwana Cizîrî ket? em dê berê xo deyne Zivingî bixoye ka di wî warîda çî gotîye.

Zivingî di raveya xoda di berperê 941ê da gazindan ji rewşenhizra û têkehiştîyêt Kurda diket ku ne şayne heta niho dîwaneka hosa biparêzin. Û dibêjît: ((min ev karê bi zehmet û mezin kir û çî harîkarî ji kesê wernegirt, xo nisxeyeka wê jî min ji kesekî qer nekir ku hindek peyvêt

destvedayî pê rastvekem, min harîkarîya xo nebire nik kesekî jî ku hindek pêzanîna li ser xudanê dîwanê xudê jê razîbît bidete min, belê divêt rastî jî bihête gotin, ewê min birastî harîkarî di despêka karê xoda jê wergirtî xudê jêrazî zanayê berkeftî Mela Ebdilselam Nacî yê Cizîrî bû, ew êk bû ji navdarê Cizîrê û îmam û dersdarbû di medresa sor ya Cizîra Îbin Umer da, ewa ku mîr Şeref Xanê hevçerxê Melay di çerxê dehê yê mişextîda avakirî û Melayê Cizîrî li wêrê hatîye veşartin, paşî ((Mela Ebdilselam)) ji ber hindek egerêt sîyasî û dînî mişextbû Suryayê û bû îmam li mizgefta mezin li Qamişloyê, ji ber ku xudê jêrazî xelkê Cizîrê bû û demekê dirêj têda jîyaye. Û ya dîyare ku Cizîr warê Melayê Cizîrî bû û têda jîyaye û zarê ş'irêt wî jî zarê xelkê Cizîrê ye, ji ber vê çendê jî ((Mela Ebdilselam)) di vî zarîda yê şehrezabû û hemî hwîrkatîyêt wî zarî dizanîn, didespêkêda min gelek sod û mifa jê wergirt, belê pa mixabin berî ez şerha ((dîwanê)) xilas bikem, mirin gehîştê û çû ber dilovanîya Xudê.))

Ez vê ténagehim, Zivingî ji layekî ve dibêjît kesê harîkarîya min nekirîye, ji layekê dî dibêjît, " ewê min birastî harîkarî di despêka karê xoda jê wergirtî xudê jêrazî zanayê berkeftî Mela Ebdilselam Nacî yê Cizîrî bû" û dîsan dibêjît; " belê pa mixabin berî ez şerha ((dîwanê)) xilas bikem, mirin gehîştê û çû ber dilovanîya xudê". Wesa xuyaye Zivingî yê vîyay xo veşêrît herwekî wî hay ji çi şerhêt dî yêt dîwana Melayê Cizîrî nîne, wî hay ji şerha Mela Ebdilselamî jî nîne, eger ew bi xo bibêjît, ku Mela Ebdilselam harîkarê wî bû û berî şerha xo xilas ket Mela Ebdilselam mirîye, ma ya beraqîle ku Mela Ebdilselamî harîkarîya wî kirbît û negotibîtê min dîwana Melayê Cizîrî şerih kirîye, yan bêjîn şerha xo ne dabîtev Zivingî?!!. Bi bawerîya min Zivingî libek ji destnivîsa şerha Mela Ebdilselamî hebûye û hemî jî baş xandîye û baş jî têgehiştîye, dîsa şerha xo li ser wê ava kirîye. Eger şerha Mela Ebdilselamî neba, Zivingî ne dişîya bi wî rengê zanistî dîwanê rave ket.

Lê divêt wê jibîr nekeyn ku dîsan Zivingî tişteke mezin bo mîletê xo kirîye û barekê giran danaye ser mîletê xo, eger çi wî mifa ji şerha Mela Ebdilselamî wergirtîye, lê wî pêkol kirîye

ku mita û pertalê xo hemîyê têda bimezêxît û ezmanê xo û zanîna xo têda bi karbînît, tinê gileya me liser wî ewe, pêdivî bû wî karukokê Mela Ebdilselamî piştguhve nehavêtiba.

Kesê dî yê ku me divêt rexne bikeyn, seydayê Hejar Mukryanîye. Hejar Mukrîyanî jî wekî Zivingî xo ji harîkarîya kesêt berî xo berî kirîye, herweku wî jî mifa ji çi kesan wernegirtîye, an hema çi şerhêt dîwana Cizîrî nexandîne, bi rastî em dişeyn bêjîne mirovêt hosa "bê nan û xwê" li ser sifra xelkî dixon û paşî pilindara têwerdiken, ew Zivingî gunehbar diket, ku wî şerha Mela Ebdilselamî li ser navê xo çapkirîye, bêy ku pêzanînek li ser vê çendê hebît û awireka bitinê jî nadete wêrê ku wî şerha xo li ber ya Zivingî çêkirîye, an her çi nebît, mifa ji wê wergirtîye. Da binêrîne Hejarî ka di vê rastêda çi gotîye.

Hejar Mukiryanî di pêşgotina wê şerha wî bo dîwana Melayê Cizîrî di herdu berperêt (19) û (23)ê da dibêjît:

((kitêbeka dî jî bi erebî heye bi qelemê Ehmedê kurê Mihemedê Botanî Zivingî miftîyê bajêrê Qamişloyê li Soryê. Şerheke li ser dîwana ş'irêt Cizîrî û navê wê (El'eqd Elcewherî fî şerih dîwan Elşeyx Elcizerî) danaye, anku: Girdana gewherîn di şiroveya dîwana Şêxê Cizîrîda...))

((salêt 1956ê wêve, sê salan mala min li gundekî bû li nêzîkî Cizîra Îbin Umer, li Kurdistana Sûryê, ku navê wî (Qubûr Elbîzz) bû û ku dikevîte nêzîkî bajêrê Qamişloyê. Min digel mela û şa'ir û torevanêt wê deverê têkelî hebû. Min ji wan di bihîst, ku êk heye navê wî Mela Ebdilselame mijûlî dîwana Melayê Cizîrî ye bi erebî şerih diket, her ewan digot melayekê gelek başe û kirmancîya bi awayê Botanî jî baş dizanît, jiberku ew bixor xelkê Botane. Belê gelekê jar û belengaze. Yê selte û bi tinêye û di hucra mizgeftekêve dijît. Mela Ehmedê Zivingî ku bûye miftîyê Qamişloyê û mizgeftek jî didestîdaye û gelekê zengîne û pêçêbûye, xêra digel Mela Selamî diket û xarin û têtst û şîv û firavîna bo dihinêrît.

Mela Selam sala 1958ê mir. Piştî demekî şerha dîwana Melayê Cizîrî hate çapkirin. Li ser bergî nivîsîbû: Mela Ehmedê Zivingî miftîyê Qamişloyê. Şiklekê miftî jî yê xişkok dihate dîtin. Êdî çi tişteki di rasta Mela Selamî da ne gotibû. Guneh ji stoyê wan kesan yê min jê bihîstî, ji pêş şorba xove, kitêba Mela Selamî bi navê xo çap kirîye.))

Bi rastî her kesekê şerha Zivingî û ya Hejarî hevber biket, dê bi sanahî zanît ku Hejarî şerha xo li ser ya Zivingî ava kirîye û eger şerha Zivingî neba, Hejar jî nedişîya vî karî biket.

Hejîye bêjim, ku jiberku şerha Zivingî ya êkê bû hatîye weşandin, evca hemî kesê piştî wî dîwana Cizîrî rave kirîn, Zivingî bo xo kirîye bingeh.

Pirs:

11. Tê gotin ku di helbestên Melê de muzîkeke wuha heye ku xelk kare zû ji ber bike. Belê ji bo Xanî û helbestên wî mirov nikare heman tiştî bêje.

Melayê Cizîrî di avakirna ş'irêda, di dariştina wêda melevanekê bê beyle, di selîqêda yê sirte, rehwan, peyvê wî di hulîne, dirratî têda nîne, awazekê wesa rehwan û sirt daye ş'irê, demê mirov dixwînît, mirov wesa hizir diket, eve ji rastî êk yê awazekê lêdidet, ew awaz di mejî û dilê mirovîda diçîte xwarê, mirovî dibete dinyayeka dî, her peyveka wî û her hevokeka wî ya dagirtîye ji awazekê dilveker. Melayê Cizîrî heneka bi peyvan diket, li dwîv selîqe û mûzîka malkê ew peyvê di weribînît û di tiraşît, gelek cara dê bînî peyv birrîye û bi nîvî kirîye, yan herfekê duyan ji peyvê dihavêjît, heke mirov hosa peyvê bixwînît dê bêjî ev peyve ya şkandî û xirabkirîye, lê wextê mirov di qalibê Melayê Cizîrî bo danay dixwînît, dê wesa pêhesyêy ku peyveka gelek xişkoke.

Bersîv:

11. Helîya (Şert) bingehîn ya ş'irê mûzîke, çend şa'ir di mûzîkê da yê rehwan bît, hind jî di ş'irêda dê yê serkeftî bît, gelek rexnevan dibêjin, ş'ir mûzîke. Bi rastî bi çend peyveka em neşeyn çi tişteki di rasta mûzîka ş'irê li nik Cizîrî bêjîn,

mijara mûzîkê li nik Cizîrî pêdivî vekolînêt dwîr û dirêje, divêt kitêb li ser bihêne nivîsîn. Lê divêt bêjim, ku çi şa'irêt Kurd di mûzîkêda negehiştîne loka (derece) Cizîrî. Evca jiberku mûzîka ş'ira Cizîrî geleka sirt û rehwanê û xwîndevan xwoşîyeka mezin jê dibînît, lewra jî ş'ira wî zwîtir têtê jiberkirin. Bi rengekê tevayî ş'ir xoştir ji rûşanê têtê jiberkirin, nexasme eger mûzîka wê bi dilê xwîndevana bît.

Ehmedê Xanî û şa'irêt berî wî û piştî wî jî di mûzîka ş'irêda şehrezayeka baş hebû, êk ji wan zanistêt di medreseyan da di hat xandin, zanistê Erûzê bû, Erûz jî zanistê kêşan û pîvana ş'irêye, evca ne bes şa'ir di vê zanistêda di şehreza bûn, belkî hemî şagird û melayan şehrezayek têda hebû. Ehmedê Xanî qamûsa xo "Nûbihar" li ser Erûza erebî avakirîye, wî yazde behir ji şazde behrêt Erûza erebî di Nûbiharêda xebitandîne. Xanî ev tiştê kirîye daku hem şagirdê Kurd fêlî dengêt Erûzê bibît, hem jî daku guhê wî yê mûzîkê vebibît û hem daku jiberkirna Nûbiharê ya bisanahî bît, çimkî herdem nivîsîna vehandî bo jiberkirnê ji rûşanê bi sanahîtire.

Lê li vêrê pisyar ewe, madem ev şehrezayîya Erûzê û kêşan û pîvana ş'irê li nik pirranîya xwîndevanêt wî çaxî hebûye, boçî di wî warîda hemî şa'ir wekî Melayê Cizîrî di serkeftî nebûn?. Bi bawerîya min dilovanî (Atîfe) peyvêt rind û xişkok çêdiket, eger şa'ir digel darriştina peyvê rondika jî bo evîndara xo nerêjît, neşêt peyv û hevokêt bi kêr bejin û bala wê bihên, vehînît. Herweko di çîvanokada têtê vegêran, evîna Melayê Cizîrî hina dijwar bû, wextê ş'ir di nivîsî pala xwe dida kevrekê mezin, demê wî dest bi ş'irê fikir evîn di dilê wîda di kelî û di fwîrîya, ew kevir gerim dibû û di şarîya, wesa kevir kel dibû, Zeryêt Cizîrê li piştêve nan pêvedida û di peht. Merema çîvanokê ewe, ku peyvêt Melayê Cizîrî yêt tijî evîn hemî dilêt hişk û req û sar wekî kevrî gerim û nerim diket û stranêt evîne bo vedigêrît!!:

Pirs:

12. Ji jiyana Cizîrî û Xanî mirov dibîne ku deşelatdarên zemanê xwe, em bêjin qirnê navê yên

Kurd qîmetekî têra xwe mezin dane şair, alim û zanayên Kurd. Ji vê awurê heger mirov rewşa wê rojê û ya îro berhev bike, ev tiradisyon di nav deşaltdarên Kurd de çendî hatiye parastin û çendî li gora dem û qonaxê ye. ?

Bersîv:

12. Her tişteki di azadiyêda werarê diket. Ezman, Tore, Hizir, Zanîn, Abor...û htd. Demê mirovî azadî nemînît wî wextî hemî tiştê mirovî tete kuştin.

Di despêka hatina îslamê û heta şerê çaldêranê jî 1514ê Kurda çî desthelatê serbixî, xorî Kurdî nebûn, di wî heyamê dwîr û dirêjda, di welatê wanda azadî nebû, xelkê bîyanî serwerîya wan dikir, jiber wê çendê jî em şûnwarekê Kurdî yê bitinê jî di wî heyamê hemîyê da nabînin. Lê piştî şerê çaldêranê, tifaqa dinavbera Kurda û Osmanîya, mîrgehê Kurda yê serbixî hatin avakirin, Kurd ji rêdar û fermanê bîyanîya qurtal bûn. Ji egerê vê çendê çerxê hilovana (Nehze) Kurdî, çerxê zêrîn despêkir. Bi bawerîya min heta niho jî çî desthelatê Kurda neşyayne nîva wê jî biken ya ku berî çarsed salan hatîye kirin.

Di salê bîstanda Kurdî (anku kirmancî) li hemî parçê Kurdistanê hate berbendkirin. Nexasme li Kurdistana bin destî turkyayê. Dîsan her di wan salanda hikumeta îraqê û turkiyayê li ser wê çendê pêkhatin ku, deverê kirmancîaxêv Kurdî lê nehête xandin û bikarînan, ewbû biryar derkeft ku tinê deverê sorana soranî bihête xandin û li devera behdînan jî Kurdî hate berbendkirin.

Sala 1961ê şoreşa Kurdî li Kurdistana îraqê destpêkir, xelkî hizir kir êdî dê ji qeyd û bendê dijminan qurtal bin û şên bi ezmanê xo xwînin û pê nivîsin, belê mixabin didespêka şoreşêda semt ber bi wêrêve çû ku soranî bibîte ezmanê şoreşê û herwekî dijminê Kurda vîyay, Kurdî jî bihête berbendkirin, êdî ji sala 1961ê heta sala 1991ê şoreşê Kurdî li Kurdistana îraqê nehêlan ne xundengehek bi Kurdî li Behdînan vebît, ne jî rojnameyek an jî kovarek derkevît, xelkê Behdînan tinê bo hindê hate berhevkirin ku bibîte sotkê

şoreşê!!

Piştî salê heştîyan li bakorê Kurdistanê jî şoreşê serhelda, wesa hate xîyal kirin ku dê Kurdî jî serheldet, lê mixabin wan jî di karubarê şoreşêda ezmanê turkî xebitand.

Dîsan piştî serheldana 1991ê li Kurdistana îraqê, hikumetek hate danan û perlemanek hate helbijartin, êdî dest bi pîlanê dijwar hate kirin ku kirmancî li hemî cihan bihête berbendkirin, despêkê kirmancî li hola perlemanê Kurdistanê hate berbendkirin, piştî sala 1991ê nêzîkî çar salan kirmancî li xandîgehê Behdînanê hate xandin, paşî bi biryareka nepenî kirmancî dîsan berbend kir û şwîna wê soranî bi darê zorê li xandîgehê Behdînan da xandinê. Û paşî hikumeta Kurdistanê pêngava sîyê havêt ku pirogramê kirmancî di tîlevîzyonê herêma Kurdistanê da nemînin, da ku biçwîkê kirmanc guhdarîya ezmanê xo di malêda neket, bi hêceta wêre ku xandina bi kirmancî û pêşveçûna wê ((emna qewmî ya Kurdî dê êxîte di xeterêda)) herwekî çawanê emna qewmî ya turkî êxistîye di xeterêda.

Pêdivîye bêjîn ku xelkê Behdînan gelek pêkol kirin ku tîlevîyyoneka setelayt li Dihokê an Zaxo bihête danan, lê her bi zwî hikumeta Kurdistanê pêkolêt wan li tixwîbêt wan rawestandin.

Evca desthelatdarê çaxê me bi vî rengîne û ezmanê Kurdî bi darê zorê berbend diken.

Desthelatdarê çaxê Cîzîrî û Xanî jî pwîte dida ezman û toreyê Kurdî, lewra jî yê wekî Melayê Cîzîrî û Feqyê Teyran û Ehmedê Xanî çêbûn.

Pirs:

13. Wek tê gotin û hate gotin hejmara zimanên biyanî ku Cîzîrî zane û serdestê wan bû, ne kê m in. wî jî wek Xanî, lê pîrr berî Xanî bi Kurdî nivîsand. Xanî ne mikun e dema biryara xwe ji bo nivîsandina bi Kurdî kiriye jiyan û pratîkê ji Melayê Cîzîrî hêz negirtibe, ew bibîraneanîbe, ji bo xwe nekiribe

nimûne, belê Cizîrî kî ji bo xwe kiriye nimûne, wî şopa kê domandiye, gihandiye cîl û nişşên piştî xwe ?

Bersîv:

13. Tiştekekê aşkiraye herwekî berî niho min avirr dayê, Ehmedê Xanî xo bi şagird û mîratgirê Melayê Cizîrî û Feqyê Teyran û Elî Herîrî danaye, herweku di dîbaca Mem û Zînê da, serê xo bi wan bilind diket û xo bi mîratgirê wan didete nîyasîn û ew bo xo kirîne mînak û li ser dewsa wan çûye û xo li ser wan ava kirîye. Lê pisyar li vêrê ewe ka Melayê Cizîrî xo li ser çi û kê ava kirîye û kêye mînakê wî?

Bi dirêjîya van salêt min li ser kilasîkan kar kirî, min gelek bizav û pêkol kir, tiştekekî ji rewşa toreyî ya berî Cizîrî û Teyranî bizanim, jiberku eger mirov berê xo bidete perîsk (derece) bilindîya van şa'iran, mirov hizir diket ku evana ji çuneyê destpênkirîye, belkî berî wan toreyekê Kurdî yê nivîskî yê bi hêz hebûye, belê pa heta niho tiştekekê bi belge û dokomênt li ber destê me nîne, lê dîsan jî wesa xoyaye ku berî wan jî ş'ira Kurdî hebûye, li vêrê em dişeyn tinê du mînakan bînîn, mînaka êkê:

Di şerfnameya Şerefxanê Bidlîsî da navê şa'irekî di mijara "Femandariya Zerqî" da, hatîye, ku bi Kurdî ş'ir nivîsîye û Şerefxan dibêjît dîwaneka ş'iran jî bi Kurdî heye. Navê wî jî "Ye'iqûb Beg Mihemed Beg"e, ku piştî sala 1534ê wêve bûye serwerê Zerqîyan. Şerefxan dibêjît: ((" Ye'iqûb Beg" piştî birayê wî Şah Qulî Beg hatîye kuştin, fermanek ji layê sultan Silêmanî ve hate dan ku ew bibîte serwerê hemî welatê Zerqan. Ye'iqûb Beg mirovekê têgehiştî û zana bû, sofîyek bû herdem guhdariya kesê xudênas dikir, gelek gêwilê ş'irê hebû, ş'irê sofîyatîyê divehandin, pitirîya ş'irê wî bi ezmanê Kurdîne, wî dîwaneka ş'iran bi Kurdî heye....))

Mînaka duyê: Dr. Mes'ûd Kitanî ş'irek bi navê Melayê Bateyî di govara Peyv hijmara 6 sala 1998ê da belavkirîye, ş'ir bi çar ezmanan, Kurdî, osmanî, farisî û erebî hatîye vehandin. Ew bixor saloxa dîwana sultan Huseynê mîrê Amêdîyê diket. Sultan Huseyn sala 1575ê çûye ber dilovanîya xudê. Eger em binêrîne salêt jidaykbûna Teyran û

Cizîrî, herweku berî niho me avirr dayê, dê bo me xuya bît, ku ev ş'ire gelek salan berî Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran hatîye nivîsîn. Her li vêrê min divêt avirrê bideme wê çendê, ku hêja Mes'ûd Kitanî, ş'ir bo Melayê Bateyî danaye, lê ew bixoya ş'irekîye bi navê ((Hemîdî)) herweku bi aşkirayî navê wî di despêka destnivîsê û dwîmahîyê da hatî.

Êdî ji van herdu girovan tête zanîn ku ş'ira Kurdî berî Melayê Cizîrî hebûye, lê mixabin tiştek ne gehîştîye me. Mirov dişê bêt ku Melayê Cizîrî berî her tiştî:

1. Mifa ji şa'irê Kurdî berî xo wergirtîye
2. Mifa ji toreyê (edeb) Kurdî yê zardev wergirtîye, her wekî min di vekolînekêda bi dirêjî behis kirî.
3. Mifa ji edebê farisî wergirtîye, nexasme şa'irê navdarê faris Camî û Se'idî û Hafîz.

Pirs:

14. Jiyan û serpêhatiya Dîwana Melayê Cizîrî jî bi serê xwe hêjayê lêkolînekê ye. Ev dîwan çawa gihîşte serdema me. Ji bo vê em qerzdarê kê û ne kê ne? Li vir pişk û rola Kurd û neKurdan çî ye û di vê navê de kurt be jî em di çend gotinan de li ser wergerên Dîwanê dîtinên we bigrin.

Bersîv:

14. Dîwana Melayê Cizîrî bo Kurda ne tiştekê kêmbû, dîwana Cizîrî û çend ş'ir û beytê dî di çaxê wî da Kurd ji xeweka hizar salî rakirin û bi wê çendê hesyan ku ezmanê Kurdî jî wekî ezmanê erebî û farisî bo nivîsînê û flîvanîyê bikêr têt. Êdî ev dîwane bo tiştekê pîroz bo gelek twîxê civakê, feqîyan di mizgeftan da bi dengê bilind ş'irê wî distandin, melayan durr û mirarîyê hunerê bilindê ş'irê ji dîwanê derêxistin, derwêşan dibêr lêdana defêra bi wan ş'iran digel xudayê xo diaxivtin, cotîyar û palan beheştê xudê di peyvê dîwanêda didît. Evca dîwan wekî kitêbeka pîroz kete di nav civakê Kurdî da, êdî her li wî biçît dîwanê bo xo venivîsînît. Kêmbû mizgeft û medrese hebûn ku libeka dîwana

Cizîrî têda nebît, piranîya feqî û melayêt Kurdistanê her êkî libek bo xo dinivîsî, ji ber vê çendê jî heta niho jî dê bînî bi dehan destnivîsêt dîwana Melayê Cizîrî di nav xelkê Kurdistanêda mayne, min bixoyê jî pitir ji deh destnivîsan hene. Eger heta niho dîwana Cizîrî nehatiba çapkirin jî, çî tirs li ser nemana wê nebû. Min bixoyê çend caran ji melayan bihîstîye digotin: piştî Quranê dîwana Melayê Cizîrîye!! Ji ber van sedeman kitêbeka bi vî rengî pîroz çî cara berze nabît. Şîrê Cizîrî di nav Kurdan da xasîyeteka dî jî hebû, çenedibû peyvek an hevokek bihête destvedan, çawa bo Quranê ev tişte çenedibû, herwesa bo dîwanê jî, ji ber vê egerê jî dê bînî li ser wê çendê ku bi dehan lib ji dîwanê destnivîs kirîne, lê guhrîn têda çênebûye, belê pa şîrê dî guhrînêt aşkira di şîrê wanda çêbûye.

Xelkê bîyanî jî hindê karê biçwîk bo dîwana Melayê Cizîrî kirîne, lê eve jî her tinê parastina libekê ye ji destnivîsa dîwanê, karê ji hemya berçavtir ku ji layê kesekê bîyanî ve bo dîwanê hatiye kirin, ewe yê ((Von Martin Hartmann)) kirî. wî sala 1904ê destnivîseka Melayê Cizîrî ji Kurdistanê ku bi destê melayekê Kurd hatiye nivîsîn, digel xo înyê Elemanya û pêşgotinek bo destnivîsê bi Elemanî nivîsîye û ew destnivîs zêde kirîye. Eger çî karê kesê wekî Hartmann nahêne piştguhvehavêtin û jibîrkirin, lê dîsan jî ne karekê êkaneye.

Pirs:

15. Xaleke din ku zelaliyê dixwaze û li bendeyî serastkirinê ye mesela helbestekê ye ku Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî bi hev re xwendine. Navê vê helbestê û sala xwendina bi hev re û sebaba xwendina bi hev re? Ev adetek bû, di zemanê Cizîrî de adetên wuha hebûn di nav şaîr û aliman de ku bi hev re helbestan bixwînin.

Bersîv.

15. Belê, şîrê heye dinavbera Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî da hatiye vehandin, herwekî berî niho jî min di bersiva pisyareka dî da behis kirî. bendek ji layê Feqî tete gotin benda piştî wê ji layê Melay tete gotin...û hosa heta

dwîmahîyê. Benda êkê Feqî dest pêkirîye û ya duyê Melay û dîsan heta dwîmahîyê ku bi benda Melay xilas dibît. Navê vê ş'irê di destnivîsanda (Mukaleme) hatîye, hindêk cara jî (Munazere). Ku ev herdu peyve jî bi erebîne, ya êkê bi Kurdî anku: bihevra axivtin, an jî dan û standin. Ya duyê anku: qawîşkêşanê, an jî : havêtne berêk.

Ev awayê ş'irê di folklorê Kurdî da gelekê mişeye, nexasme di "Heyranokêda" ku kiç û kurr herdu dihavêne berêk û êk bendekê dibêjît û yê dî an ya dî lê vedigêrît, Kurd dibêjne vî awayê dariştinê ((Berêkanê)), evca ev peyve ji folklorê Kurdî hatîye wergirtin û bo vî awayê ş'irê di navbera şa'iran da jî dibêjinê Berêkanê.

Ev awayê henê li nik ereb û farisan jî hebûye, lê wana berêkanê pitir di warê reîdanê li ser hizrekê ka re'ya kê dirusttîre, an di warê Berrebêjîyêda (Bela'xet) ka kî ji yê dî di axivtinêda berretîre, an Berrebêjî di ezmanzanîyê, zanistê, dîrokê û zanistê dî da dîkir, ka kî ji yê dî zîrektîre.

Ev ş'ira henê jî berêkanêyeke dinavbera herdu şa'irê hevçerx Feqîyê Teyran û Melayê Cîzîrî da. Feqîyê Teyran di bendekêda sala nivîsîna wê aşkira kirîye, dibêjît:

Birîndarê Işqême dûrim ji siha bihan

D'zanin meddahê kême di "hizar û yek û sihan"

Sena xwanê Melê me li hemû erd û cihan

Ewî sala 1031 mişextî, anku hicrî bo nivîsîna wê danaye, ku dikevîte beramber sala 1621-1622zayînî.

Pirs:

16. Gelo ji dîwana xwe pê ve tu berhemên wî yên din çêbûne?. wek nimûne Xanî fireh û çendalî xwedîmijûlahî ye, navçeya enterese û pêdaketinên wî fireh e, dest avêtiye gelek tiştan. Ji vî milî mirov li wextdagirtin û dembuhurandina Cîzîrî binere, rewş çawa ye, ev bi çi nisbetê xwe di helbestên wî de dide dest?

Bersîv:

16. Eve çend sale ez li ser destnivîsê Kurdî dixebitim û herdem jî ez hizra wêrê dikem belkî rojekê ji rojan berkarekê vî şa'irî û êkê yê dî yê ku nehatîye dîtin bikevîte destê min, bi rastî jî gelek cara merema min bi cih hatîye û tiştê nwî hatîye vedîtin. Lê di rasta Melayê Cizîrî da heta niho bijlî ş'irê û wê ş'ira wî ya di dîwanê da tişteke dî berçavê min neketîye, tinê vehînokeka dirêj min di destnivîsekê da dît, ku li ser navê (Mela)y hatibû meşiqkirin. Ev vehînoke li ser ferzê nivêja ye, li ser pênc navbirra ya hatîye avakirin, sala 2005ê min ew vehînok di kitêba xo "Kelhên ava"da belavkir. Pîçek jî min behsê wê kirîye, ku herçend bi navê (Mela)y hatîye belavkirin, lê bi bawerîya min ya Melayê Cizîrî nîne, jiberku Melayê Cizîrî mijarê bi vî rengî ne nivîsîne û dîsan awayê dariştina wê ya siste, ne ya dagirtî û kutne kirîye wekî ş'irê Cizîrî yê dî. Evca heta niho bijlî dîwanê tişteke dî liser navê Melayê Cizîrî nehatîye vedîtin, dwîr nîne jî ku wî tinê ev dîwane nivîsîbît, lê divê bizanîn ku wî bi vê dîwanê mezintirîn kar bo Kurda kirîye.

هه‌وایێه‌ی کتیب

VI

هه‌وآنامه‌ی کتیب

هه‌والنامه‌ی کتیب

Li ser jidayikbûna Melayê Cizîrî çend dîtin.

Celalettin Yöyler

GELO RASTÎYA DÎROKA MELAYÊ CIZÎRÎ ÇÎYE?

Pir kes ji nivîskar û dîrokvanan di derbarê dîroka ji dayîkbûna Mela de; xwe êşandine û negihîştine rastî ya dîrokê. Lê tu rexne û lewmek me jibo wan camêran nîne.

Lewra Mela bi eşkere wek Seydayê Xanî ji destpêka jidayîkbûna xwe nepeyîvîye.

Mela bi giranî helbesta xwe bi peyvên felsefî, derûnî û razdarî hûnandî ye. Pir helbestvanên wek Mela di helbest û gotinên xwe de, bi razên ebcedî, ji temen û heyamên xwe axivîne û di helbesta xwe de, veşartine. Rasthatina vê rêbaza ebcedî jî, zor têzanîn û bişkivandin. Jibo dîroka destpêka jîna Mela, di meydana lêkolînê de, çend dîtin hene:

Yek dîtina Rêzdar Zeynelabidîn Zinar a bi hejmarên ebcedî ye. Ya din jî, dîtina me ya dîsa bi hejmarên ebcedî ye. Em dibêjin: dîtina Zeynelabidîn; lewra di pêşgotina tîpguhêzî ya dîwanê de, dide zanîn ku herwekî ew rêbaza ebcedî ya wî ye. Armanca min ji vê mijarê ew e ku xwendevanên rojnameyê û zanayên nivîskar, rêbaza me ya bi hesabê ebcedê û diyarkirina me ya destpêka salên jîna Mela û dîtina rêzdar Zeynelabidîn Zinar, di ber çavan re derbaskin û biryara xwe bi nirxandinek azad eşkere kin û ji vê îmeyla me re bişînin. Îmeyl: (xwesbin_yekta@hotmail.com)

DÎTÎNA ZEYNELABIDÎN ZINAR: Birêz Zeynelabidîn Zinar, di pêşgotina tîpguhezîya Dîwana Mela ya ji tîpên Erebi bibal tîpên Kurdiya Latênî ve dibêje: Di malika helbesta Melê de, ya bi nivîsandina (*Ji herfan mah û salê ma, nehat der şiklê falê ma - Kuca danendî halê ma, sipikbaranê sahil ha*) Dîroka ji dayîkbûna Mela di vê helbesta jorde bi hejmarên ebcedî hatîye dîtinê. Rêzdar Zeynelabidîn dibêje: bi hejmara bêjeya (Herfan û xalî) dîrok derdikeve meydanê. Ew hejmar jî dike 980ê. Ger ev bi hesabê koçî be? Bi beranberîya mîladî dike: 1570'ê. Dîsa dibêje: Bê guman ji ber ku ev malik di beşa destpêka dîwanê de ye, bêtir mirov didefîne bibal rastîya wê ve.

Dîsa Zeynelabidîn Zinar dibêje: Mela di sala 1621ê de bi Feqî re helbest gotîye. Birastî gava mirov li rastîya bûyerê dinhêre, mirov dibîne ku di hejmaran de çewtîyên hejmarî derdikevin meydanê. Yek ji mînakên çewtî yê hejmara 1621 e. Lewra Feqî di helbesta xwe de dibêje: Gava min helbest bi

Melê re digot, (Sal hezarû Sî û yek 1031) bû. Ev hejmara ku Feqî dibêje, sala (1031) bû, hejmarek koçî ye û bi beranber mîladî ne (1621) e, (1624) e. Mirov gava li rastîya helbestgotina Feqî ya bi Mela re dinhêre, mirov dibîne ku dinavbera herdû hejmarên dîrokîde; 3 sal cudatî heye.

Yanî dema bihevragotina helbestê (1624) e. Her wisa di nirxandina hejmaran û nîşandayîna dema ji dayîkbûna Mela de jî nakokî heye. Lewra birêz Zeynelabidîn hejmara tîpên bêjeya (herfan û xalî) bi hejmarên ebcedî derxistiye: (980) ye. û gotiye bi mîladî dike (1621) û temenê Mela yê ji dayîkbûnê jî bivî hesabî dike (1570). Mixabin bêjeyên ku heval Zeynelabidîn Zinar bi hesabê ebcedî nirxandiye û gotiye temenê Mela bi van hejmaran (1570)ê ye, ne rast e. Lewra 980'ê bi beranberî ya mîladî dike: $953+622=(1575)$. Her çiqas Zeynelabidîn bi dudilî gotiye: Ger bi koçîbe? lê bê dudilî kesên di wê demêde, her bi hesabê koçî nivîsîne. Nirxandin: 980 ê koçî bi beranberîya Mîladî dike $953+622$ ê berya koçî = 1575. Hem jî xebitandina bêjeya(Xalî) di şûna Sal de jî, biguman e. Lewra nusxeyên ku di destê me de hene, bigiştî (Ji herfan Mah û Salê ma)ne û ne ku xalê ma hatine nivîsandinê. Lê birêz Zeynelabidîn dibêje: Min di nusxek de (Xalî) dîtîye. Me jî di şûna (xalê)de xalî xebitandiye. Di rêbaza tewandekan de, di şûna tewandeka (ê) de (î) nayê xebitandinê. Lewra tewandeka (î) di giramera erebî de, daçeka kesekî ye û bi peyvekî kurdî re nayê xebitandinê. Em dibêjin, rastî ya helbesta Mela (Ji herfan mah û salê ma, nehat der şiklê falê ma) ye û ne xalî ma ye. Hege (xal) xwendibin jî, bi sehwa qelema katibê nusxeyê hatîye nivîsandinê. An jî di nivîsên destxet de, (x) di şûna (f) yê de xwendine û gotine (xal). Lewra (x) ya erebî û(f) ya erebî di destxetan de, carnan jî hev nayên cuda kirin û bi hev re tên guhertin. Em werin ser dîtina rêzdar Nayîf Mikaîl Tahir ê ku:destpêka salên Melê; di hejmarên jêr de dîtîye: erfa = 289, Mah=41, û (w) sal=97, Ma=41, Şikl=350, Fal=111, Ma=41, bi tevahî dike: 975. Lê rastîya hejmarê 974 re. Di hejmara (Mah) de (H) bi çewtî (6)hejmartine, ew jî bi gorê mîladî dibe 1569 û ne 1567 e. Li jor rêbaz û nirxandinên van herdû rêzdar hevalan wek hev in.

Lewra herdûkan dîtinên xwe berdane ser rêze helbestek û di hejmaran de şaşî kirine. Bi gor rastî ya nirxandina hejmaran, gotina Zeynelabidîn ya ku gotîye (1570) dijê hejmaran e. Lewra rastî ya hejmaran (1575) didine dîyarkirinê.

Dîsa nirxandina rêzdar Nayîf Mikaîl Tahir jî, ne bi gor rastiya hejmaran e û rastiya hejmaran (1569) didene dîyarkirinê ne ku (1567). Bi dîtina me ya lêkolînerî ya nêzîkê 7 sal e, ya liser şîrovekirina vê berhema Mela, ev helbesta wî ya ku dibêje: **(Ji herfan mah û salê ma, nehat der şiklê falê ma)** tu giza wî bi dîyarkirina temenê Mela re tune. Ji ber ku di nav de, bêjeya (mah û sal) heye. Rêzdar nivîskaran jî gotine, ji salên xwe diaxive û dane ber hejmarên ebcedî. Pir ecêbe ku rêze helbesta **(ji herfan mah û salê ma)** di navbera du lêkolîneran de, hatîye parvekirinê. Yekî gotîye: **(herfan û xalî)** yê din jî gotîye: **herfa, Mah, û(w)sal ma, şikl, fal, ma.** Eva jî mirov di derbarê rastiye de dixe nav gumanan. Bi dîtina me û bi xebata me ya 7 saleya liser şîroveya dîwana Melayê Cîzîrî, me xwe gîhande rastiya dîroka jidayîkbûna Mela û jînenîgarîya wî. Dema ku di Sala 1997 de, me dest bi şîroveya Dîwana Mela kir û me tim di nav domandina xebata xwe de, rastiya dîroka Mela di serê xwe ra derbas dikir û dixwest ku rojekî ji rojan em rastê gotinek Melayê di derbarê ji dayîkbûna wîde werin. Bi rastî bi nirxandina mina helbestê re, helbseta (Feqîyê Teyran) ji bo xwegîhandina min a bi bal dîroka ji dayîkbûna Mela, bû alîkar û piştevanek pir mezin. Herwekî bi dengê elî bangê min dikir û ji min re digot: Dîtina te ya bi hesabê ebcedê rast e û binirxîne. Lewra gotina Feqî ya bi helbestgotina bi Mela re, bo min jêderk û delîlek vebir e.

Lewra her çiqas Mela bi zimanek eşkere ji destpêka jîna xwe neaxivîye û birewşekî nehînî û bi razên ebcedî ji xwe axivîye jî, lê Feqîyê Teyran bi zimanekî eşkere û vekirî ji hevdemî û dîroka jîyana xwe û Mela axivîye. Em werin mijara nirxandina helbesta erebî ya di dawîya pêncekên Melê de û bi hesabê ebcedî binirxînin û li rewşa hevgirtina wê û gotina

Feqî binhêrin ku çawa hev tamam dikin û rastiya dîroka jidayîkbûna Mela dertînin meydanê. Helbesta Mela ya ku tê de bi zimanek nehînî û ebcedî, ji rewşa xwe ya destpêka helbestgotinê tîne ziman û dibêje (**Tilke enbaun yeqûlû ennasû minna beede hînin**) ev e. Wateya rêzêhelbestê bi Kurdî: Ev behrem bigiştî hinek gotin, peyamin û me amadekirîye.

Wê gel û mirûvên piştê deman ji me û berhema me bi axivin) Berya nirxandina tîpên helbestê, em dixwazin bala kesên ku nirxandina me ya bi hejmarên ebcedî dibinçavan re derbas kin, bira bizanin ku di rêbaza nirxandina tîpan de, tîpên bi Şedeyên di bêjeyande yek tîp, ne du tîp têne hejmartinê. HEJMARTINA TÎPAN: (T)400, (L)30, (K)20, (E)1, (N)50, (B)2, (E)1, (Y)10, (Q)100, (W)6, (L)30, (E)1, (L)30, (N)50, (E)1, (S)60, (M)40, (N)50, (E)1, (B)2, (E')70, (D)4, (H')8, (Y)10, (N)50 = 1027ê koçî.) Hejmara tîpan bigiştî rêze helbest e. Lê ya ji herfan mah û salê ma di navbera du lêkolîneran de, hatiye parvekirinê. Yekî gotîye: (herfan û xalî) yêdin jî gotîye: herfa, Mah, û (w)sal ma, şikl, fal, ma. Hejmara tîpan liserhev: bi hejmara koçî:1027. Mela divê rêze helbestê de bi zimanek derûnî û bi hesabê Ebcedî dide dîyarkirinê, ku wî di Sala 1027ê koçî de, dest bi nivîsandina helbestê kirîye. Dema ku Mela dest bi helbestgotinê kirîye, temenê wî (30) sal bûye. Lewra di derbarê (30)sal temenê wî yê di berya destpêka helbestê de, Mamosta Eladîn Secadî anîye ziman û gotîye: Mela di 30 Saliya umrê xwe de, helbest gotîye.

Herwisa Mela bi xwe jî, di beşên helbestên xwe de; temenê xwe yê di berya helbestê de, tîne ziman û dibêje: (**Sih Sale ji derdû ji belayê te hilakin=Hetta bi felek her diritin ahû ehê min**) Dîsa di rêze helbestek dinê de dibêje:(**Ernekî rihmê tu Mîro, dê çibit halê me îro= Qet nebê carek Esîro, girtîyê (Sî) saleye**). Mela bi eşkere û zelalî dide zanîn, ku temenê wî di berya helbestgotinê de (30)salî ye. Yanî lêkolîn û dîtina me ya bi hesabê ebcedê, dîroka destpêka wêjenasîya wî ye. Gava em (30)sal temenê wî yê berya wêjeyê ji wê dîrokê dertînin, rastîya dîroka wî ya ji

dayîkbûnê bê guman derdikeve meydanê. Çawa me li jor gotina (Feqîyê Teyran)a di derbarê helbestgotina wî ya di Sala (1031)de bi Mela re dabû nîşan. Ew gotina (Feqî) ya dîrokî, bo me jêderk û delîlek bêguman û vebir e. Hem jî ji bo dîtina me ya bi hesabê ebcêdî jî, destek û piştevanîy e. Her wisa helbesta ku Mela di benceka xwe de bi erebî dibêje, ev behrem bi giştî hinek gotin, xeber û peyamên curbecur in û wê mirov piştê dem û zemanan ji me û peyamên berhema me bi axivin. Mela, di destpêka rêzehelbesta xwe ya bi zimanê erebî de, di serê helbestê de, bêjeya (Tilke) anîye ziman. Lewra bêjeya (Tikle) di giramera erebî de, daçeka pirhejmarê ye û îşaretê bal tevahî ya berhremê ye.

Ango (tikle) ev behrem bi giştî, me divê sala koçî ya hejmar (1027)de nivîsî ye. Hem jî ev hejmar û gotina Feqî ya ku dibêje: me di (1031)ê de bi hev re helbest gotî ye, hev tamam dkin. Em werin ser mijara nirxandina hejmarên ebcêdî û dîyarkirina dîroka ji dayîkbûna Mela:

NIRXANDINA HEJMARAN: Mela di (1027)'ê koçî de, dest bi nivîsandina helbestê kirîye. Ev hejmara koçî beranber bi mîladî dike: (998)ê ji Koça (Hicreta) Mihemmed silava Xuda li ser be û heta despêka nivîsandina Mela ya helbestê. Dî navbera hicreta MÎHEMMED û ÎSA Pêximber de 622 sal heye. $998+622=1620-30=1590$. Bi vê nirxandinê dîroka ji dayîkbûna Mela:dibe 1590 û koça wî ya ji dinê bi gotina dîrokzan Eladîn Secadî dibe:1665. Me di çapa yekem a ku Enstitüya Kurdî çap kiribû de, temenê destpêka bûyîna Mela bi şaşîyek teknîkî (1589) dabû dîyarkirinê. Lê me ew şaşî dît û sererastkir. Mijara here giring a ku heta niha ji hêla tu dîrokvan û lêkolînavan ve nehatîye zanînê, dîroka ji dayîkbûna Mela ye.

Divî mijarê da em dibêjin: Me bi lêkolînek berfireh rastîya ji dayîkbûna Mela, ji bo rayagiştî û xwendevanên pirtûka xwe re derxiste holê. Lê diroka koçkirina wî ya ji Cîhanê, me xwe siparte dît in û gotina Eladîn Secadî û hinek dîrokzanên dinê. Em dîsa ji bo xwendevanên şîroveya xwe re, bi bêdudilî

didne dîyarkirinê ku lêkolîn û dîtina me ya bi hejmarên ebcedî rast e. Lewra me çawa gotina (Feqîyê Teyran) bo xwe delîlek vebir dît, em ji xwendevanên şîroveya xwe re jî dibêjin: hûn bi zanînên xwe yên pîroz û bi însafî, dîtina me binirxînin û rastîyê bibînin. Lewra em dibêjin: Bi hejmarên ebcedî detstpêka helbestnivîsa Mela, 1027 e. Di beriya wî de temenê Mela, (30) ye. Gava em 1027ê ku me bi hesabî ebcedî ji bo destpêka helbestvanî ya Mela nirxand û wergerand mîladî, bû 998. Me: 30 sal temenê melayê berya helbestê ji hejmara (998)derxist û bû $968+622=1590$ rastî ya ji dayikbûna Mela. Armanc ji vê nirxandinê ew e, ku (30) sal temenê Mela bixwe derdikeve meydanê û dîtina me ya ebcedî rast dibîne. Feqî jî dibêje: dema me bi hevra helbest digot Sal (1031)bû. Dinavbera dîtina me de û gotina Feqîyê Teyrande, çarsal heye. Gava ku Feqî bi Mela re helbest gotîye, Mela pirtûka xwe ya helbestê birîye nêzîkê dawîyê. Gava ku çarsal di navbera wan de cudatî hebe î nepir e. Lewra Mela heta pirtûka xwe birye nêzîka dawîyê, jixwe çarsal dikêşe. Yanî Feqî piştê çarsal xebata Mela ya li ser helbest nivîsê, pêra helbest gotîye.

Nîşe: Ev nivîs ji Enstîtuya Kurdîya Amedê û ji Rojnameya Azadîya welat re jî hatîye şandin.

Celalettin Yöyler 4/28/2008